

ÇIRA

kovara kulture
kovara komeleya nivîskarên kurd li swêdê

sal
hejmar
bihar

2
5
1996



Naverok

Sal 2 • Hejmar 5 • Bihar 1996

ÇEND KURTEBAHS LI SER SIMAÎL AXAYÎ (SIMKO) 5

Reuf Tewekkuî

JI BÎR NEKE 14

Kekê Xêlit

"KÛRT TEALÎ CEMİYETI" YA DIYARBEKİRÊ 18

Zinar Soran

WARGEH 28

Arjen Arî

BABETA SALA MIRINA ŞERÎF PAŞAYÎ 30

Rohat Alakom

GULSÎPAN 35

Bedirxan Epözdemir

BISERHATİYÊN ÇEND MIROVÊN SEYIDXANÊ KERR 37

Celadet Aî Bedirxan

DENGÊ DIHOLÊ 51

Dilbijan

GOZÊRE 55

Serdar Roşan

HESRÊ MI 62

J. Espar

USÊN VE BAKILÎ RA.. 63

Munzur Çem

HELEB: "UMMUDDUNYA" 68

Şahînê Bekirê Soreklî

ALEQEMŞÊ 72

Zinar Mistefa

ÇEND PIRSÊN RÊZIMANA KURDÎ – I -, 75

Mûrad Ciwan

Kongreya duyem a Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê çêbû 92

CÎHANA PIRTÛKAN 94

Rohat Alakom

Sal 2
Hejmar 5
Bihar 1996

XWEDÎ

Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê

REDAKSIYON

Rohat Alakom
Osman Aytar
Firat Cewerî
Mahmûd Lewendî
Zinar Soran

ŞERTÊN ABONETIYÊ

Salek: 200 SEK
Nîv sal: 100 SEK
Hejmarek: 50 SEK
Ji bo welatên din
mesrefa posteyê lê zêde dibe.

ÎLAN

Rûpelek 1 000 SEK
Nîv rûpel 500 SEK
Çarîk rûpel 200 SEK

RISMÊ BERGÊ PÊŞÎN

Simko û birayê xwe Xurşîd
(ji arşîva Elî Simko)

POSTGIRO

46 32 31-1

ISSN

1400-528x
Berpîrsiyariya her nivîsê,
ya nivîskarê/nivîskara wê ye.

ÇAP

Apec-Tryck

A D R E S S • A D R E S • N A V N Î Ş A N

c/o Tayfun, Hyppingeplan 21, 2 tr., 163 62 Spånga • SWEDEN

TELEFON +46(0)8-760 69 38

ÇEND KURTEBAHS LI SER SIMAÎL AXAYÎ[•] (SIMKO)

REUF TEWEKKULÎ

Simaîl Axa(Simko) kurê Mihemmed Axa serokê eşîreta Şikakan bû. Ev eşîret li dor û bera Urmiyê dijî. Simaîl Axa û Cafer Axayê birayê wî, gellek caran li dijî zorkariya dam û dezgeya binemala paşayetiya Qacaran rabûne û xebat kirine. Simaîl Axa, piştî kuştina Cafer Axayî, xebata xwe domand û şîya dest bi ser Urmiyê, Selmasê, Xoyê, Seblaxê, Şinoyê û gellek cihên dîtir de bigire. Her wiha di sala 1299'ê Hetavî(1920'ê z.) komareke serbixwe damezirand bi navê Cumhûriyeta Azadîstan ku tenê çend mehan kêşa(1) û rojnemeyek jî bi navê Kurd li Urmiyê derket ku rojnameya resmî ya wê komarê bû.

Kuşîna Cafer Axayî

Sala 1283/1905'an gava Muzeferuddîn Şah, bi sefer çû Ewrûpayê, Mehemed Alî Mîrza yê kurê xwe kiribû cîgirê xwe. Huseyîn Qulî-Xan (Nîzamu'l Seltene) jî kiribû waliyê Azerbaycanê. Yê navê wî derbas bû, bang li Cafer Axayî kir ku were Tebrîzê, dilê wî xweş kir ku dewlet lê dibuhure û wê daxwazên wî jî bicîh bîne(2). Îbrahîmê Sefayî dibêje: Nîzamu'l Seltene di rûpelê qur'anekê de ku ji bo Cafer Axayî verêkiribû sond xwaribû ku derewan li xelkê nake fermana serokayetiya eşîreta wî jî ji bo wî wê ji dewletê bistîne(3). Cafer Axa li gel heft kes ji qewm û xizmê xwe û çend siwarên çalak çû Tebrîzê. Yek ji xizmên wî Mîrzayê xalê wî bû,(4) ku jê re digot Xale Mîrzo. Nîzamu'l Seltene bi germî pêrgî bi wan çû, mêvandariya wan kir. Cafer Axa û hevalên wî di hemû cihên Tebrîzê re buhurîn, xelk dihatin temaşeya wan û ji ber rêk û pêkiya wan, cil û çekên wan heyran diman(5).

Mehemed Alî Mîrza ji Tehranê telgrafek rêkir ji Nîzamu'l Seltene re û ferman deyê ku di vê derfetê de Cafer Axayî bikuje. Nîzamu'l Seltene ji bo encamdana vî karî, Mehemed Huseyn Xanê Zerxam ku yek ji serekên siwariyên Qerebaxê bû ,dawetî koşka xwe kir, tiving û demançe da çend kesan ji peyayên wî û ew li jêr xaniyê koşkê veşartin û li gora vî planî dawê li Cafer Axayî kir ku ji bo çavpêketin û guft û goyan were cem wî. Cafer Axa, bi ser-

bestî û eşkereyî hat koşka Nîzamu'l Seltene, hevalên xwe li hewşê hişt, bi tena xwe hilkişiya. Xizmetkarên Nîzamu'l Seltene odeyeka piçûk nîşanî wî dan û gotin fermoyê teşrîf bike li wê derê rûnê!! Gava ku Cafer Axa rûnişt, Zerxamî ji kozikekê lê teqand. Cafer Axa rabû ser xwe, lê birîna wî giran bû di cih de ket û ruhê xwe da. Hevalên Cafer Axayî, bi bihîstina teqîna tivingê fahm kirin ku çi qewimî, bi hucûm bi ser ketin. Lê Zerxam û peyayên wî li wê derê nemabûn. Wan jî ku çav bi termê Cafer Axayî ketin jibo ku xwe xelas bikin pencereyek vekirin û derçûn, di rê de çend kesên wan hatin pêvenan du kesên wan jî hatin kuştin(6). Bi fermana Nîzamu'l Seltene termê Cafer Axayî û yê du hevalên wî li koşka Alî Qapû hatin hilavîstin.

Ahmedê Kesrewî nivîskarê Tarîxê Meşrûtiyetê Îran dibêje: Min wê demê dixwend, li gel du sê teleban em çûn temaşeya wan terman, her sê jî serberjêr hatibûn hilavîstin(7).

Nîzamu'l Seltene yî taximek siwar bi dû hevalên Cafer Axayî xist. Li Ayrweneqê tûşî wan bûn, hevalên Cafer Axayî xwe dan dest, hespên wan ji wan stendin, ew bi xwe derketin çûn.(8) Dibêjin di dema kuştina Cafer Axayî de Nîzamu'l Seltene yî di çalekê de xwe veşartibû.

Peymanşikandina dewletê, Mehemed Axayê bavê Cafer Axayî han da (dahf da) pena bibe ber dewleta Osmanî(Di wê demê de navbera Îranê û Osmanîyan nexweş bû. Mehemed Axa çû Îstanbûlê, li wê derê rêz lê hat girtin û rutbeya paşatiyê danê. Lê ji ber rûdanekê, Tirkên dilê xwe jê girtin ew tiştên ku dabûnê jê sitandin(9). Dibêjin Nîzamu'l Seltene yî dawa du hezar eşrefî(diravêkî zêr e) li Cafer Axayî kiribû ji bo ku rutbeya serdarê nusret û fermana serokayetiya eşîreta Şikakiyan bidîyê, lê belê wê bertîla Cafer Axayî nebû ku bide. Ji bo wê bi namerdî ew kuştin(10).

Îbrahîm Sefayî dibêje; di wê sefera Cafer Axayî de ya ji bo Tebrîzê, Simaîl Axa yê birayê wî jî ku şazde salî bû, li gel wî çûbû. Piştî kuştina Cafer Axayî, Simaîl Axayî sond xwar tola birayê xwe hilde.

Kuştina Mar Şîmûnî

Ew Asûriyên ku Tirkîyê ew der kiribûn, li Kurdistanê kom bûn, wekî mîşên hunguv derbûn û destê hevkarîyê dirêjî Simkoyî kirin ku bi hev re dewletekê pêk bînin. Ji bo vê mebestê Mar Şîmûn; serokê Asûriyan, roja 3'yê Cemazî el Sanî 1336/1918'yê z. di hevdîtinekê de ji Simkoyî re got: Ev axa Kurdistanê welatê me hemûyan bûye. Lê cihêtiya dînî, em ji hev qetandine (bizdandine). Divê em bibin yek û vî welatî têxin bin desthêlata xwe. Ê me, piyadeyên me gellek in, lê siwarên me kêm in, heke were, piyadeyên me û siwarên me bigihên hev, ew dikarin Tebrîzê jî dagirkin(12). Di dema vê dîtînê de peyayên



Simko (yê rûnûştî) li gel birayê xwe yê biçûk Xurşîd, 1910 (?) ji arşîva Elî Sunko (nevryê Simko)

Simkoyî li ser banan xwe veşartibûn. Mar Şîmûn piştî guft û goyê li gel Simkoyî radibe û Simko bi rûyê xweş wî verêdike. Gava Mar Şîmûn dixwaze li paytona xwe ya sipehî siwar bibe, Simaîl Axa di pencerê re lê diteqîne û dihingêve. Alî Axayê birayê Simko jî bi gulleyekê wî sar dike.

Ji Îsmâîl Axayî hatiye bihîstin ku gotiye: Ez bi mebesta kuştina Mar Şîmûnî li gel wî civiyam, ji vê mebesta min jî bes Alî Axa agadar bû. Piştî kuştina Mar Şîmûnî, çekdarên Simkoyî destê xwe dirêjî hevalên wî dikin û hemû wan sed û çil kesan dikujin. Nivîskarê Tarîxê Xoy dibêje: Yên kuştî not û

neh kes bûn(14)

Di tolhildana kuştina Mar Şîmûnî de, Asûrî êrîştî ser koneşarê û birrek navçeyên dîtir dikin talan û kuştineka gellêk dikin, bi vê bûyinê gellek bêşûc jî tîr kuştin yan malwêran dibin .

Şandina bombeyekê ji Simkoyî re

Gulana 1298/1919'yê z. Mukerrem el Mulk; cîgirê ustandarê Azerbaycanê bi hevkarîya Ermenîyan, bombeyekê di pakêtekê de saz dike û bi postê verêdike Çîhrîqê, ji Smaîl Axayî re, ku xwedêgiravî şêrînayî ye û xwesiya wî ji zarokên keça xwe re hinartîye. Lê Îsmaîl Axa ne hinde safik bû ku di vê fêlê negihê. Gava pakêtê werdigre venake û nahêle kurepiçûkê wî jî veke . Dide kesekî tenîştî xwe ku bizanibe ka çi têde ye. Gava ew kes deziyê pakêtê vedike, çîrûskeka kêr jê vedide: Simko bi carekê de bezekê ji ba pakêtê dide xwe, radike kurê xwe jî û xwe li zêvî dide. Çend gavan bi wir de diçe ku bombe diteqe û Alî Axayê birayê wî û çend kesên dîtir jî tîr kuştin û Simko ji mirinê xelas dibe(15).

Riza Şah li ber destê Simkoyî

Di adara 1304/1925'ê z. de, Riza Şah, -ku berê jê re serdarsipah dihate gotin - xwest serî li Azerbaycanê bide, belkî riyek peyda bikira ji bo şikandina şoreşa Simkoyî ku bi kêmayî deh hezar cengawer li gelê bûn. Riza Refî'ê Qaymeqam el Mulk nunerê pêşî yê parlamentoya Îranê di bîranînên xwe de li ser vê meselê dibêje ku; rojekê li gel Şahî em di çarerêka Hesnavaya Tehranê re dibuhurîn Rizayî ji min re got: Li gorî serleşker Abdullah Xanê Tehmasbî ji bo niştecîkirina eşîretên koçer divê ez serekî li Azerbaycanê bidim, tu jî xwe rapêçe da em zûtîrekê herin. Ez ê ku hay ji hêz û desthelata Simaîl Axayî hebûm, min got: Qurban di niha de ev sefer ne baş e. Şahî got: Divê herim, min divê ez Simkoyî bibînim, ka bizanim bê dest ji şer û pevçûnê venakêşe.

Serleşker Xudayar Xan û serleşker Mehmûd Ensarî û taximek ji fermandegiregiran dawê li min (Riza Refî') kirin ku ez Şahî poşman bikim, çimkî bi ya wan wiha bû ku vegera vê seferê nedibû. Min ji wan re got ku Şah li ser soza xwe bi îsrar e, divê em tevdirêkê bikin ku ev sefer bêserêştî derbas bibe. Roja dawiyê bi çend makînen Ford ên kevn li gel Şahî em ber bi Selmasê birêketin. Ji Selmasê re şeş kilometre mabû ji nişka ve em tûştî nêzîkî pênc hezar siwareçekdarên Simaîl Axayî bûn. Hejmara me jî ji şêst û du kesan nedibihurî Tevî Şahî em di ber siwarên Simkoyî re rabihurîn, siwaran bi rûçikekî tîrş bala xwe didane Riza Şahî, qet rêz lê nedigirtin. Wiha diyar e ku li hêviya wê yekê bûn ku Simko çavekî li wan bişkîne ew jî xwe bera ser ruhê me din. Tîrsê li

me hemuyan venîştibû, Şah ji me bêtir ditirsiya. Di vê demê de Simko bi cilên Kurdî diyar bû. Serleşker Tehmasbî ji bo wê yekê ku rê li ber destdirêjayiye-ka Simaîl Axayî bigre û dilê wî têxe cîh Simko himbêz kir û bi vî aliyî wî aliyî ew maç kir. Simko bi qesda desthelat û azayetî di xwe dernexist, di wê dema ku li hemberê Şah rawestiyabû, destê xwe danîbû kêleka xwe bixêrhatineke sivik li Riza Şahî kir. Piştî bi piyan çûne karwanserayekê. Riza Şah li ser kursiyekê rûnişt û li gel Simkoyî bi Tirkî ketin gotûbêjê. Me hemuyan ruhê xwe sipartibû, em ditirsiyan ku ji nişka ve dest dirêjîyek li me bê kirin û serê me tê de biçê. Piştî demekê wênegirek hat, Simkoyî dawê li Şahî kir ku pêk re wêneyekî bigirin. Şahî bi zimanekî nîvgilî ji min re got; Riza Refî tu rabe li gel Simaîl Axayî wêne bigire, min nevê ez wêne bigrim. Di wê gavê de serleşker Tehmasbî rawestiya û li gel Simkoyî çend wêne girtin. Riza Şah bêçek bû. Lê Simko hemû çekên wî yên sar û germ hebûn. Li ber çavan gelek gir jî dixwiya. Wextê rojava çay anîn. Piştî em çûn çend odeyan ku ji bo me hatibûn amade kirin. Şah gellekî ditirsiya, destê xwe ji xwe şûştibû li ser textekî wekî marekî xwe kulorî kiribû, min gellekî dilxweşî dayê, wî got: ev asî ne, ditirsim ku me ji navê hilînin. Min got; qurban, dilgiran mebe, serleşker Tehmasbî xerîkî(mijûlî) wê yekê ye ku riyeke çareseriyê peyda bike, di vê bareyê de ez jî li gel wî bi ray û tevdir im.

Şahî pirsî:

— Xewa we nayê?

Min got:

— Îşev xew nabe. Heke em ji vê tahlûkê rizgar bin, sibê bi şev em têr dinivin. Şahî got; ez nanivim, dilê min xweş mekin, ka here bê ew çî dikin. Bi şev saet di heştan de, ez çûm aliyê serleşker Tehmasbî û min ji serleşker Xudayar Xan, debbîrê a'zam Behramî û hevalên dike yên Şahî re got: Vê tirs û lerza we dijmin teşwîk dike ku êrîşî ser me bike û me ji navê rake.

Listika dameyê

Serleşker Tehmasbîyî got: Niha tiştek ketiye bîra min, min ji naîbê yekem Îbrahîm re gotiye ku biçê kon, alî Simaîl Axayî û bi qiseyên xweş serê wî mezin ke. Ji bilî vê ez dizanim ku Simaîl Axa gellekî ji listika damê hez dike, bira pêre rûnê heta dikare wî mijûl bike ku bala wî nekeve ser tiştekî din, belkî sibehî bê teşqeale em ji Selmasê derkevin. Bi vî awayî Îbrahîm ta ku roj hilat Simkoyî bi listika dameyê meşgûl kir. Serleşker Tehmasbî jî carcaran diçû konê Simkoyî, pesnê listikzaniya Simkoyî dida û ew han dida ku listikê dirêj ke. Me ew şev bi tirs û lerz kire roj. Sibehî zû bi bêxatirxwestina ji Simkoyî em siwarî makînan bûn di nava siwarên Simkoyî re bi lez û bez me Selmas bicîh

hişt . Heta em gihîştin Urmîyê jî awirên me li rê bûn, ji mejî tirê siwarên Simkoyî bi rê de li pey me ne.

Riza Refî di dewama gotinên xwe de dibêje: Carekê di seferê de min sefera Selmasê bi bîra Riza Şahî anî, mirûzê wî tirş bû û dilê wî teng bû. Navberekê piştî wê seferê, Simkoyî di hevdîtinekê de ji serleşker Tehmasbî re gotibû; mezintirîn şaşiya min di wê şevê de ew bû ku min destê xwe dirêjî Riza Şahî nekir. Heke min ew bikuştaya yan min wî li gel hevalên wî bigirtaya, min hemû Azerbaycan dagîr dikir. Riza Refî di dawiyê de dibêje: Lîstika wê şevê nehişt Simko bigihîje armanca xwe, gava ji xewê hişyar bûbû bi hezaran tumen biribû û nêçîra wî jê çûbû.(16)

Li gorî hinekan welê ye ku wê şevê Simko Riza Şahî wekî mêvanê xwe dîtîye, ji bo wê destê xwe dirêjî wî nekiriye. Çimkî li gorî adetên Kurdan mêvan xwedanê îhtîramê ye. Lê siyaset tiştên wiha li ber çav nagire. Her loma jî Riza Şahî di encamê de gunehê xwe bi mazûbanê xwe neanî û bi fêlbazî ew kuşt.

Simaîl Axa çawa hat kuştin?

Di dewra Riza Şahî de gellek hewl hat dayin ku Simko ji meydanê were rakirin, lê bêfêde bû, heta bi navê gotûbêjê, Simko qenaet pê anî ku bê Şîno û li gel serleşker Muqeddem; fermandeyê Tebrîzê çavê xwe bi hevdû xin. Îbrahîmê nunerê pêşîn ê Meclisa Şûreya Millî ya Îranê, ku di planê kuştina Simkoyî de destê wî hebû, di bîranînên xwe de dibêje: Teymûr Axa navberek bû ku bi birîndarî hatibû girtin. Serleşker Muqeddem ew birader hinart nik min bi wê meqsedê ku peywendî li gel Simkoyî deynim. Ji bo vê amancê min nameyek ji alî fermandeyê leşkerî û xwe ve bi Teymûr Axayî re şand ji Simaîl Axayî re. Me dawê lê kir ku dev ji şoreşê berde û kîjan çiya pê xweş e li wê derê bi aramî û hêminî bijî. Simko li ser vê nameyê, ji Barzan çû Qendîlê, li ber konê Xurşîd Axayê Herkî daket û dawê li serheng Sadiq-Xanê Newrozî; fermandeyê Şîno kir ku hev û din bibînin. Di wê wextê de serleşker Muqeddem ji Tebrîzê telgrafek ji min re rêkir ku ji bo karekî pewîst biçim Tehranê. Di cewaba xwe de min got: Simaîl Axa li van nêzîkan e, çûna min a ji bo Tehranê ne pewîst e. Min divê tevî serheng Newrozî biçim çavpêketina li gel Simkoyî da em wî razî bikin ku bê Tebrîzê. Roja dinê Simaîl Axa bi xwe bi bîst û neh xulam û çekdarên xwe ve hate Şînoyê û li ber mala serheng Newrozî daket. Em gellek ecêbmayî mabûn ku Simkoyî çewa wêrabû ku tevî bîst û neh kesan were Şînoyê, di halekî de ku deh serbazên piyade û sê serbazên suwarî yên me li Şînoyê bicîhkirî bûn. Lê belê derket ku mebesteka din a Simkoyî heye, dixwaze me bixelitîne, her loma jî Kerîm-Xanê Xêlanî bi sed siwarên ça-

lak ve bi şevê bi qesda dîtina Simkoyî hate Şinoyê. Sibehî jî Xurşîd Axayê Herkî bi sed û pence siwaran ve hat . Bi dûv wan re serokê eşîra Surçiyân û serhedîyan her hinek bi taximek siwar ve hatin. Hejmara hemû wan siwaran dibû şeş sed kes. Serleşker Muqeddem di wê wextê de li Tehranê bû., zanibû ku Simko li Şinoyê ye û tirs jê tê kirin. Piştî nîvroya 2'yê tebaxê (gelawêjê) bi fermana Riza Şahî vegeriya Tebrîzê, tîpeka bi top û şestîr û çekên din ber bi Urmîyê ve xist rê. Ew bi xwe jî hat Urmîyê û bi telefonê got: Heta tu bi min re xeber nedî meçe Şinoyê. Piştî vê di saet 3,5 ê pêş nîvro de bi rûsî got: Ez bi xwe tîm Şinoyê, qene çavê min bi Simko dikeve. Min got, qurban melezzîne heta tîm nik te.

Piştî wê ku li Urmîyê min serleşker dît, roja piştî wê serê sibê-birêketim saet di yazdan de gihîştim Şinoyê û li ber mala serheng Newrozî peya bûm. Serheng, emîr E'lem, Simko, Kerîm-Xan û Xurşîd Axa li wir bûn. Serheng Newrozî destek cilên taze û buha pêşkêşî Simko kiribû, Simkoyî halê min pirsî û got: Ev cil xelata serhengî ne.

Îbrahîmî li ser vê bahsê didomîne û dibêje: Nîvrokî me nan dixwar, Simkoyî got: Dilê min qet venabe û ne şadim jî. Ev yek got û berê xwe da Xusrewê kurê xwe û jê re got: Tu piçekî yariyan bike, bira bîhna min fireh bibe.

Piştî nîvro, Mehemed; xizmetkarê serleşker Muqeddem hat hundur û nameyeka serleşkerî da serheng Newrozî. Tê de nivîsibû ku rîz li Simaîl Axayî bigre, ez bi xwe jî tîm dîtina wî. Simaîl Axa bi van gotinên serleşkerî kêfxweş bû û pirsî ku kengî tê. Mehemedî got:

— Ez dibêjim qey wê saet di sisiyan de bigihê vê derê. Hatina serleşkerî bi min(Îbrahîmî) nebaş bû. Lê gava Mehemed got, ji bo min diyar bû ku serleşkerî ji bo xapandina Simkoyî ev gotin xistine devê Mehemedî. Çimkî bi dev ragihandibû ku her çi dibe bila bibe 24 saetan Simkoyî ragirin heta ku hêz ji Tebrîzê, Urmîyê û Seblaxê digihîjin. Simko û serheng Newrozî li ser wê li hev kirin ku saet di 2'yê piştî nîvro de biçin pêrgiya serleşkerî û li derveyî bajêr, li bin daregwîzeke mezin çav li riya serleşkerî bin. Serheng Newrozî ferman da eskeran ku piyatî biçin wî cihê ku ji bo çavriyê hatibû diyarkirin. Simaîl Axayî pirsî ku ew esker çend dîr ji wan radiwestin. Min (Îbrahîmî) bersîva Simkoyî da û got: Dizanim ku qet te nevê taximek esker nêzikî te be. Simkoyî weka pirsîyarekê got: Îca ji bo çi mirovê zana nêzik dibe? Min got: Diyar e ku tu hê sarezayê belêniya serbazîyê nîn î!

Simko merivekî xweparêz bû, kesî ew li şûnên gûmanlêkirî nedidît, her li mala xwe jî piştî xwe nedida cihên vala û penceran.

Simaîl Axa û hevalên wî li gel Kerîm-Xanê Xêlanî û Xurşîd Axayê Herkî ji bo pêşewaziya serleşkerî çûn û di sîbera daregwîzekê de çavênîya hatina ser-

leşkerî kirin. Serheng Newrozî dizanî ku serleşker nayê. Got ez ji bo mêvandarîyê li Şinoyê dimînîm û her gava ku min ji Nexedeyê xebera hatina serleşker zanî ez tîm pêrgiya wî.

Îbrahîmî peyvên xwe berdewam dike û dibêje: Min xwest ez Simkoyî bixapînim, çûm nik wî li ba dara gîzê û min jê re got, makîna serleşkerî xera bûye bi telefonê ji Heyderabadê (Bendereke/Lîmaneka Gola Urmîyê ye) xeber ji bo min ragihandiye ku biçim nik wî û pê re vegerim. Edî min Şino bi cîh hişt û çûm avayiya Kendewêle. Mam Azîzê kurê Qerenî Axayê rehmetî li wê derê gazind ji min kirin.

Di vê çûn û hatinê de Simaîl Axa dikeve gûmanê û dixwaze hêza dewletê ya li Şinoyê ji navê rake. Heta şevê bi hêviya hatina serleşker Muqeddemî rûdinê bi wê hêviyê ku serleşker bi eşkereyî were Şinoyê wî bikuje, yan jî tevî çend siwaran biçe Nexedeyê eger li wê derê nivistibe, wî bigire û bikuje. Ji bo ancamdana vê mexsedê di vegera xwe de ya ji bo Şinoyê li çend aliyan tîla telefonê dibire. Dawiyê Xurşîd Axa tevî çend kesan dişîne ku serheng Newrozî bigirin. Ew bi xwe jî tevî hevalên xwe ji bo bêçekkirina serbazan diçin bajêr ku li hespên xwe siwar bibin kuli nêzîkî mala serheng Newrozî hatibûn girêdan û bi siwarî bikaribin bi ser serbazên piyade de biçin.

Xurşîd Axa li deriyê mala serheng Newrozî dide, serheng dibêje; niha ez tîm û vedikim. Xurşîd Axa, lez dike, taximekî ji bo girtina serhengî dihinêre jorê. Serheng ditirse û deriyê dîwanê ji hundur ve dadixe, dest davêje tivingê. Peyayên Xurşîd Axayî palê didin derî, serheng tivingê diteqîne û xulamêkî Xurşîd Axayî dukuje. Xurşîd Axa jî dergevanê serhengî dukuje, li ba wî çekdarêkî serheng Newrozî li Xurşîd Axayî diteqîne û pêvedine. Di vê pevçûnê de Simko tevî taximekî diçe baxçeyekî nava bajarê Şinoyê. Muhemmed; peyayê serleşker Muqeddem, di pencerê re li Simkoyî diteqîne û wî dihingêve. Simko bi dest birîna xwe digre û dijûneke bi Ecemî dide. Zabitekî bi navê Mubeşşîr Nîzam jî di pencerê re li Simkoyî diteqîne û lê dide. Siwarên Herkî termê Xurşîd Axayî derdixin. Sê kes ji çekdarên Simkoyî jî Xusroyê kurê wî li nav qerebalixa nav meydana bajêr vedişêrin û di tariya şevê de wî derbas dikin. Kerîm-Xanê Xêlanî jî bi destê birîndar berê xwe dide berzayiyan û derdikeve(17).

Alî Dehqan di kitêba Serzemînê Zerdeşt de nivîsiye ku; Serheng Sadiqxanê Newrozî kemîn ji bo Simaîl Axayî danîbû. Gava ku Simaîl Axa birîndar dibe vedigere ser Xusrewê kurê xwe ku wî xelas bike, bibe, lê bi gulleya dawiyê dikeve ser xweliyê (axê) û giyanê (ruhê) xwe dide.(18)

Serwan Kawyanpûr, di Tarîxê Rizaiye(Wirmê) rûpelê 176'an de dibêje: Serheng Sadiqxanê Newrozî dûrbîneka Simkoyî li balê bû. Bi wê dûrbînê li gel çend kesên din li cadê nihêrtiye. Gava Simko nêzîk bûye di pencerê re lê te-

qandiye û ew kuştiye.

Serheng Babîwêrdî, di rûpelê 144'ê Tarîxê Eresbaran de dibêje: Simko bi gulleya istuwar Mehemed Xanê Qeredaxî hat kuştin. Welê derdikeve ku ew birader her ew Mehemedê peyayê serleşker Muqeddem buye ku berê behsa wî hat kirin.

Termê Simkoyî tê birin ji bo Urmîyê û sê rojan ji bo temaşekirina xelqê tê danîn. Yek ji jinên wî diçe ser termê wî û dibêje: Ew bi xwe ye. Bi wê nîşana qameyî ya mezin a destê wî xuya ye. Çimkî gava marî pêvedabû bi xencerê ew qevd birrîbû da ku jahra marî tevî xwîna wî nebe.(19)

Bi vî awayî, komek palewanên cengawer ên Kurd roja 30'yê Pûşbera 1309/1930'ên z. ji navê hate rekirin ku bi salan şoreş û xabat kiribûn û hustu xwar nekiribûn.

Tehran 29'ê Xakelîweya 1374/18'ê Nîsana 1995'an

- Ev nivîs ji kovara Mamostayê Kurd jimare 26'an hatiye wergirtin. Mûrad Ciwan ji Soranî kiriye Kurmancî

- 1 Hawar, Mehemed Resûl: Şêx Mehmûdî Qareman, bergê duduyan, r.372, London 1991
- 2 Kesroyî, Ahmed; Tarîxê Meşrûtiyetî Îran r. 143
- 3 Sefayî, Îbrahîm; Pencax Xatire ez Pencax Sal, Tehran 1381, r 55
- 4 Tarîxê Meşrûtiyetî Îran r. 143
- 5 Tarîxê Meşrûtiyetî Îran r. 144
- 6 Tarîxê Meşrûtiyetî Îran
- 7 Tarîxê Meşrûtiyetî Îran r. 145
- 8 Tarîxê Meşrûtiyetî Îran
- 9 Tarîxê Meşrûtiyetî Îran
- 10 Salnameyê Dunya, meqaleya Îbrahîmî, hejmara 16'an, Tehran, r. 56
- 11 (Di metnê orîjînal de ciyê vê jêrenotê ne diyar e N.M.) Pencax Xatire ez Pencax Sal, Tehran 1381, r 55
- 12 Kesroyî, Ahmed; Tarîxê Hicde Saleyê Azerbaycan, çapa şeşan, Tehran, 1356 r. 727
- 13 (Di metnê orîjînal de ciyê vê jêrenotê ne diyar e N.M.) her ew...
- 14 Rıyahî, Doktor Mehemed Emîn; Tarîxê Xoy, çapa yekê, Tehran 1372, r. 502
- 15 Kesroyî, Ahmed; Tarîxê Hicde Saleyê Azerbaycan, çapa şeşan, Tehran, 1356 r. 832
- 16 Salnameyê Dunya, meqaleyê Rıza Refî (Qaymeqam el Mulk); hejmar 17, Tehran, 1340 r. 150-153
- 17 Îbrahîmî, Xatiratê Siyasî yê rîcalê Îran, çapa ewwel, c. 1 Tehran 1348, r. 327-334
- 18 Alî Dehqan; Serzemînê Zerdeşt, Rızaîye, (Urmîye), Çapa ewwel, Tehran 1348, r. 596
- 19 Her ew serçavî r.597
- 20- Mehdi Bamda; Şerhê Helê Rîcalê Îran, c. 1, Tehran 1357
- 21 Huseyin Mukî; Tarîxê bîst Saleyê Îran, c. 2, Tehran, 1359
- 22 Nesrullah Şifte; Se Murdê Ecîb; Laurens, Simko, Seyyid Ferhad, Çapa duwem, Tehran 1326

Balkêşandîneke *Mamostayî Kurd*: Di nivîsa mamoste Tewekkulî de hejmarên panivîsan nozde ne, her çendê di dawiyê de gihîştibin 22'an jî. Her çî em dizanin şaşîtyekê rû daye jî me ew yek çêtir dît ku em gotarê her wekî xwe belav bikin.

JI BÎR NEKE

Tiliyên min li Gabarê man
li Zagrosan
Lingên min li Cûdî, Herekol
Çavên min li Agirî
Li ser axa te mirî bê goristan in
Bila melodiyên xemgîniyê dilê te nesojin
negirî
Hin caran bûm zaroyekî/e porsîde
tenê mam
Ji çîyan bipirse
Ez dîsa te fikirîm
Min ji bîr nekir navê te
Niha dişibe spîndareke şikestî bejn û bala min
Min xwe bi dawa dêrê te girtiye.
Min tenê nehêle, destê min ber nede
Ku min rojekê xewnên xwe winda kirin
Bila evîna te wan li min vegeirîne
ji bîr neke.

KEKÊ XÊLIT

BEREKA DAWIYÊ

Ax... em têgihîştin êdî
Rûbarên me ê bimiçiqin
Ber bi cengên nû
hespên kumeyt ê nebin me
Xezeb ê bibe volkanekî
bes dê hew biteqe
û vekîşe ber bi kûrahiya dilê me
Me hê xwe bi azadiyê negihand

heywax
bi lêvên agirî
çavên belek
dêmên gulî

Êdî bi tenê bereka dawiyê
sivikahiya êşên salan e
ya ku me dipê tim li ser dilên me.

KEKÊ XÊLIT

HÊSRÊN KEÇEKÊ

Dema wan tu anî ber dîwêr leza zewaniyan hebû
Û saeta maran bû
di dilan de serobinî hev dibûn
Tiving zûzûka verast kirin ber bi navenda dilê te
Reşkên çavên gewr ji mirinê têr nedibûn.

Çûk li ser spîndaran venîştin
Û di çavên te de dîtî wê demê
Di nîdayeke zirav de xeyalê keçekê
Çawa olan dide û dişkê.
Çûk bi firê ketin
Tu welgeryayî
Fena dareke çinarê
Li ser piştê.

Dît dinya alemê
ji hêsrên wê keçikê
bi baraneke nîsanê ve
çawa hatin şûştinê lêvên te
ku biyaniyên ramûsanên bûn
Û eniya te
ya weke roê.

KEKÊ XÊLIT

ÇI BI TE HAT?

Êş im, jan im, keser im
Zimanê agiran e
ya ku bi şev û ro dadilêse hewara min
Olan nade awaza min di esmanê wijdanan de
tenêtiya min welatê min tîne bîra min.
Ehdek e li vê dinê ya ku ji min re ma
Û di dilê min de li ser birînekê hêviya min
Êdî tu tiştî ji min nepirsîn
Keriyê zewaniyên dojehe
û kuliyan mirinê bûn
ên ku berbangekê
di xalif de rastî jiyana min hatin.

KEKÊ XÊLIT

DÊ Ê BIPONIJIN

Di awirên wan de sêdar rêz-rêzî ne
Revdeyên xwînî
Pûk
Jiyan hatine diyarîkirin bi careke
Li ser zimanan peyv êdî xav bûne.

Bi dilên dibînin ew rojên bîn
Ev gel ê rake bêderê
Hingê di esmanê dilê me de stêrk ê nexuricin
Rojek ê bê
Wê neşkên çilakên fidana hêviyê
Bes dê ê baponijin hela
Di berbangên xwînavî de
heya demekê.

KEKÊ XÊLIT

BILA AWIRÊN TE MIN BIBIN KURDISTANEKE AZAD

Evîna min
Ca çavên xwe veke
û awirên xwe bikute bîbikên min
Ji wir jî bimeşe
giran giran
ber bi navenda dilê min.
Bes ne ku jibo kezebsotinê
an jî giyansitendinê ji min
Da ku di awirên te de
Li ser mêrg û zozanên Kurdistanê azad
û li peravên Gola Wanê
Bi te re fena zarekê
Ez xwe bikaribim bibînim.

KEKÊ XÊLIT

"KÜRT TEALI CEMİYETİ" YA DIYARBEKİRÊ

(Komeleya Pêşketina Kurdan ya Diyarbekirê – 1918)

ZINAR SORAN

"Kürt Teali Cemiyeti" (Komeleya Pêşketina Kurdan) di sala 1918-an de, li Diyarbekirê hatiye ava kirin. Di avakirina vê komeleyê de, roleke taybetî ya hinek endamên "Komeleya Xwendekarên Kurd- Hêvî" çebûye. Li gorî agahdariyên ku Zinar Silopî dide, ji bo avakirina vê komeleyê li hewşa "Kara Cami"yê û derûdora wê, bi beşdariyeke gelek mezin civînek çêdibe. Gelek kesên ji malmezinên Diyarbekirê jî beşdarî vê civînê dibin. Ev civîn bi saetan dajo. Di civînê de li ser rewşa siyasî û pêwîstiya bidestxistina mafên neteweyî tê rawestandin. Di dawiyê de Hemdî Efendî diaxîfe û daxwaza serbixebûna Kurdistanê weha tîne zimên: "Divê perçê ku di laşê gebgeba Osmanî de bûye kangren bête jêkirin û avêtin. Di vî warî de, divê em bêdudilî bilezînin û Kurdistanê ji kangirên rizgar bikin".

Di encama vê civîna mezin de, biryara damezrandina "Kürt Teali Cemiyeti"yê tê girtin. Ji bo serlêdana resmî ya vekirina komeleyê, di bin serokatiya Ekrem Cemîl Paşa de, heyetek ji Cercîszade Kerîm, Çerkezzade Fikrî, Ganîzade Reşat, Cemîl Paşa û Ömer Beg pêkhatî tê hilbijartin. Di demeke kin de, komele di nav xelkê de belav dibe û piştgiriyeke mezin ji her çî û refên civatê digre. Ew komele di nava gel de, weke "Qlûba Kurdan" jî dihate nas kirin (1).

Ekrem Cemîl Paşa di bîranînên xwe de, navê vê komeleyê weke "Kurdistan Cemiyeti" nivîsandiye. Di warê damezrandin û komîteya birêvebir ya vê komeleyê de jî ew weha dinivîse:

"Li ser awayên meşandina xebata hundurê Diyarbekirê û wîlayetên din yên Kurdistanê gotûbêjên dîrûdirêj hatin kirin. Di dawiyê de, komîteya birêvebir hate hilbijartin. Komîteya Birêvebir ji çar kesan hatibû ava kirin: Reşat, Fikrî, Ömer Beg û Ekrem. Ekrem serokê yekem yê komeleya yekem ya siyasî bû ku li Kurdistanê hatibû ava kirin" (2).

Dîsa li gorî agahdariyên Ekrem Cemîl Paşa, komele di demeke kin de gelekî pêşve dihere û hejmara endamên komeleyê pênc sed kesan derbas dike. Ji

kesên ku berê pêxwas bûn bigre, heta mamoste, mele, eşraf, tucar, memûr, doktor, avûkat û rewşenbîrên ciwan, ji gelek çîn û refên civatê endam hatibûn nivîsandin. Bi hezaran kes hebûn ku li deftera komeleyê weke endam nehatibûn nivîsandin, lê piştgirî û hevalbendiya komeleyê dikirin. Li Nisêbînê, Stewrê, Farqînê û Liceyê liqên komeleyê hatibûn damezirandin. Li Madenê, Elezîzê, Meletê jî gelek hevalbend û sêmpatîzan hatibûn peyda kirin. Komeleyê ji bo çapkirina pirtûka Mem û Zînê alîkariya Heze Begê Mikisî kiriye û ji bona weşandina kovara “Kurdistan”ê ku ji aliyê endamekî komeleyê Muhemed Mîhrî Efendî ve dihate weşandin, alîkariya aborî dikir.

“Kürt Teali Cemiyeti” ji patrîkxaneyê Kildaniyan çapxaneyêke biçûk kiribû û bi wê çapxaneyê, bi navê “Gazî” rojnameyêke çarpelî diweşand. Gelek qelemşorên kurdperwer weke Avûkat Hecî Mihemed Efendî, Cemîl Paşazade Cevdet, Pertew Begê Licêyî, Elî, Mîrî Katibzade Cemîl Beg û Ganîzade Reşat di vê rojnameyê de dinivîsandin (3).

Piştî ku ji Stenbolê Ganîzade Dr. Cewdet Beg tê Diyarbekirê, ew jî beşdarî nav xebata komeleyê dibe. Dr. Fuat Beg jî endamê komeleyê bû. Ji bona ku ji wan kesên weha xwedî tecrûbe û şareza bêtir bê îstifade kirin, komîteya birêvebir ya komeleyê îstifa dike û kongreyêke îstisnayî dicivîne. Di vê kongreyê de, Cemîl Paşazade Qasim Beg weke serokê komîteya birêvebir, Ganîzade Doktor Cewdet Beg serokê duyem, Cercîszade Kerîm muhasîb, Ömer, Fîkrî û Ekrem weke endamên komîteya birêvebir û Xoce Hemdî Efendî jî weke şewirdarê serok tînin hilbijartin (4).

Ekrem Cemîl Paşa di derheqê vê kongreyê û hilbijartina komîteya birêvebir ya nû de weha dinivîse:

“Piştî şewir û gotûbêjan, em ghiştin vê encamê: Komîteya birêvebir ya nîha wê istifa bike, kongreya îstisnayî wê bê civandin, kongre wê bi hilbijartina veşartî komîteya birêvebir ya nû hilbijêre. Civîneke şehane hate çêkirin. Li derdora sê sed endaman beşdar bûn. Komîteya birêvebir bi vî awayî hate hilbijartin: Serokê komeleyê Qasim Beg, şewirdarên serok Xoce Hemdî Efendî û Dr. Cewdet Beg, cîgirê serok Ekrem Beg, muhasîb Kerîm Efendî, endam Ömer, Reşîd û Fîkrî Beg. Ji vê komîteyê du grub hatin çêkirin. Ji bo wan du grûban du vatiniyên girîng hatin tespît kirin. Grûba yekem ya propogandayê bû, ya duyem jî ya weşanê bû. Piştî ku komîteya birêvebir ya komeleyê bi vî awayî hate hûnandin, tevgera komeleyê geştir bû” (5).

Weke ku diyar dibe, di nav agahdariyên Zinar Silopî û Ekrem Cemil Paşa de, hinek cihêti hene. Li gor Zinar Silopî, cîgir ya jî serokê duyem yê komîteya birêvebir Ganîzade Kasim Beg e û navê Reşîd Beg jî di nav navên endamên komîteya birêvebir de tune. Lê li gor Ekrem Cemil Paşa dinivîse, cîgirê se-

rok Ekrem e û Reşîd Beg jî endamekî komîteya birêvebir e.

Di lîsteya komîteya birêvebir ya destpêkê de jî di nav agahdariyên Zinar Silopî û Ekrem Cemîl Paşa de cihêti heye. Li gorî Zinar Silopî, komîteya komeleyê di bin serokatiya Ekrem Cemîl Paşa de, ji Ekrem Cemîl Paşa, Cercîszade Kerîm, Çerkezzade Fikrî, Ganîzade Reşat û Ömer Beg pêk hatiye. Lê li gor Ekrem Cemil Paşa dinivîse, komîte di serokatiya wî de, ji van çar kesan pêk hatiye: Ekrem, Fikrî, Ömer û Reşat. Cercîszade Kerîm di lîsteya Ekrem Cemîl Paşa de tune ye.

Di warê tarîxa damezrandina vê komeleyê de jî di nava wan herdu çavkaniyan de cihêti heye. Li gor Zinar Silopî, “Kürt Teali Cemiyeti” ya li Diyarbekirê piştî “Kürdistan Teali Cemiyeti” (Komelya Pêşketina Kurdistanê) hatiye damezrandin. Lê li gorî Ekrem Cemîl Paşa, “Kürdistan Cemiyeti” (Komeleya Kurdistanê) ya li Stenbolê piştî “Komeleya Kurdistanê” ya li Diyarbekirê bi heşt- neh mehan hatiye damezrandin (6).

Di vî warê de çavkaniyên ku hene behs nakin ku “Kürt Teali Cemiyeti” ya li Diyarbekirê beriya “Kürdistan Teali Cemiyeti” ya li Stenbolê hatiye ava kirin. Herweha agahdarî û çavkaniyên ku vê gavê di destê me de hene, têrê nakin ku mîrov bi awakî zela bizanibe, bê “Kürt Teali Cemiyeti” ya li Diyarbekirê weke komeleyeke serbixwe, ya jî weke liqekî “Kürdistan Teali Cemiyeti” ya li Stenbolê hatibû ava kirin.

Di nav “Kürdistan Teali Cemiyeti” û “Kürt Teali Cemiyeti” de, bi taybetî di warê şandina weşanan de têkiliyên germ hebûne. Rojname, kovar û weşanên kurdî ku ji aliyê “Kürdistan Teali Cemiyeti” dihate şandin, li çapxaneyê “Kürt Teali Cemiyeti” ya li Diyarbekirê dihate zêdekirin û belav kirin. Komîteya birêvebir ji Av. Mehemed Efendî (Bavê Tûjo), Fewzî Efendizade Mehemed Efendî, Mîrî Katibzade Cemîl Beg û Elî Efendiyê Liceyî komîteyêke propogandayê ava dike. Ev komîte ligel propogandayê û xebatên din, bi taybetî ji bo xwendin û nivîsandina kurdî di nav xelkê de pêşve bibe, hewldaneke gelekî giranbiha dike (7).

“Kürt Teali Cemiyeti” ligel wan xebat û çalakîyên kulturî, li ser pirs û pirsgerêkên siyasî jî rawestiyaye. Lê xebata komeleyê tevahiya Kurdistanê himbêz nekiriye; bi piranî, di nav bajarê Diyarbekir û derûdora wê de maye. Li gor Ekrem Cemîl Paşa jî dibêje, di wê rewşê de û bi wan îmkanan, komeleyê ji wê potansiyela dînamîk ya Rûhayê, Entabê, Maraşê, Meletê û Dersimê bi awayekî ciddî îstifade nekiriye. Xelkên li derûdora Diyarbekirê jî gelekî betilîbûn. Seferberlikê piştî millet şikandibû; piraniya xelkên derûdora Mêrdîn, Diyarbekir, Elezîz û Sêrtê di nav êş, derd, kul û feqîriyêke mezin de dijiyan. Lê çek û cepxaneyêke baş jî ketibû destên eşîr û bajariyan. Ji ber vê yekê, ko-

mîteya birêvebir ya komeleyê serhildaneke çekdarî jî dida ber çavan.

Dema ku komeleyê di wê rewşê de xebat û çalakîyên xwe didomand, hay û bala pêşengên komeleyê ji plan, lîstik, fen û fûtên dijminekî nû, Mustafa Kemal tunebûn. Ekrem Cemîl Paşa vê rewşê weha tîne zimên:

“Gava me di 1918- 1919- an de xebat û çalakîyên xwe geş dikir, raqîbekî fenok û xayîn ku nedihate xewn û xeyala me derket hemberî me. Ew kes Mustafa Kemal bû” (8).

I. SIYASETA MUSTAFA KEMAL Î KONGREYA ERZIROMÊ

Piştî peymanê Mondrosê ya 1918-an, hêzên leşkerî yên dewletên hevpeyman paytextê dewleta Osmanî Stenbolê dagir kirin. Wan, paytextê împatoriya Osmanî xistibûn bin destê xwe û bi taybetî pîkolyeke mezin li serbaz û leşkerên osmaniyan dikirin. Di wê demê de, hukûmeta Stenbolê Mustafa Kemal weke “Mufetîşê Giştî yê Artêşê” şandin Anadoluyê. Mustafa Kemal di 15-ê gulana 1919-an de ji Stenbolê derket. Hêviya Mustafa Kemal bidestxistina hevalbendî û piştgiriya kurdan bû. Ji bona ku bi fen û fûtan piştgiriya kurdan bistîne û pêşiya tevgera kurdî bigre, ew di ser Amasyayê re derbasî Erziromê bû. Planê Mustafa Kemal ev bû ku bi hinek soz û peymanan piştgiriya serokeşîr û malmezînan kurdan bistîne û tevgera kurdan ya taybetî ji holê rake. Herweha, kurdan ji bona armanc û planên xwe yên kolonyalist û nîjadperest bi kar bîne.

Mixabin, di destpêkê de ew tehlîkeya mezin û durûtiya Mustafa Kemal ji aliyên pêşengên siyasî yên kurdan ve nehate dîtin û di dema xwe de tedbîrên pêwîst li hemberî tevgera wî nehate girtin. Heta li gor agahdariyên ku Ekrem



Ekrem Cemîl Paşa, Hemzeyê Mûşî, Haco Axa (yê rûniştî) û Mustafa Kemal Paşa
(Foto ji pirtûka "Muhtasar Hayatim" hatiye girtin)

Cemîl Paşa dide, di dema haziriya Kongreya Erziromê de, yekî mîna Xalit Begê Cibrî jî bi awakî hesan tê listika Mustafa Kemal; bi soz û peymanên wî yên ji bona mafên kurdan tê xapandin:

“Kurdên Erziromê teva şehîd Xalit Begê Cibrî bi awakî hêsan ketin feqa Mustafa Kemal. Bi sozên wî yên şêrîn hatin xapandin. Mustafa Kemal ji kurdan re digot ku ew dê mafên kurdan yên siyasî bide û di her fîrsetê de diyar dikir ku Kurd û Tirk bira ne. Wî ev tişt di kongreyên Erzirom û Sîwasê de, bi awakî resmî îlan kir” (9).

Mustafa Kemal gava bi destûra Sultanê Osmanî derbasî Anadoluyê û Kurdistanê dibe, xebat û çalakîyên “Kürt Teali Cemiyeti” ya li Diyarbekirê jî nêzîk ve dixîne bin çavan û di derheqê vê komeleyê de agahdariyan dicivîne. Wî bi awakî giştî tevgera Kurdistanê li hemberî armanc û planên xwe astengeke mezin didît û dixwest ku ji destpêkê de hemû tifikên tevgera Kurdistanê bitefîne. Bi vê armancê, wî xwest ku pêşî “Kürt Teali Cemiyeti” ya li Diyarbekirê jî holê rake. Mustafa Kemal ji aliyekî têkilî bi hukûmeta Stenbolê û karbidestên dewletê yên li Diyarbekirê re datanî; ji aliyê din jî, ji bo fesadî, dijminayî û berberîya di nav êl, eşîr û malmezinên kurdan de kûr bike û piştgiriya wan bistîne, bi gelek serokeşîr û malmezinên kurdan re peywendiyên taybetî geş dikir.

Mustafa Kemal di 29-ê gulana 1919- an de ji “Erkan-i Harbiye-i Umumiye” (Serhaniya Giştî ya Leşkerî) re telgrafekê dişîne. Di vê telgrafê de ew diyar dike ku “Qlûba Kurdan” ya li Diyarbekirê jî bo Kurdistanê serbixwe dixebite û di nav vê komeleyê û komeleyên hevalbendên hukûmetê de dijaye-tî zêde dibe. Mustafa Kemal hem li ser navê xwe û hem jî bi riya kolordiyê ji serokeşîr û navdarên kurdan re name û telgrafan dişîne. Di van name û telgrafan de, ew li ser rewşa dewletê ya giştî agahdariyê didin û daxwaza piştgiriya wan dikin. Mustafa Kemal dide diyar kirin ku li gor lêkolînên wî pêwîstî heye ku li ser navçeya Kurdistanê bête rawestandin. Ji bo vê yekê jî, ew ji Serhaniya Giştî ya Leşkerî rica dike ku çi agahdariyên di derheqê navçeyên Kurdistanê Serbixwe û ew navçeyên ku ji aliyê îngilîzan ve tên xwestin û hatine dayin hene, ji wî re bête şandin (10).

Cîgirê kolordiya heştan Cevdet jî di 30-ê gulana 1335 (1919)-an de, li ser xebat û rewşa “Kürt Teali Cemiyeti” ji “Harbiye Nezareti” (Wezareta şer) re raporeke dîrûdirêj dişîne û di dawîya vê rapora xwe de dide diyar kirin ku ji ber tesîra propogandaya “Qlûba Kurdan”, li vê navçeyê hergav dikare tevliheviyek giştî derkeve holê (11). Waliyê Diyarbekirê jî, ji xebat û çalakîyên “Kürt Teali Cemiyeti” gelekî nerehet dibû û ji bona girtina wê, li qîl û behaneyan digeriya. Li ser daxwaza Mustafa Kemal, karbidestên dewleta Osmanî

yên Diyarbekirê “Kürt Teali Cemiyeti” ya li Diyarbekirê girtin. Cîgirê waliyê Diyarbekirê Mustafa, di telgrafa xwe ya ku di 8-ê hezîrana 1919-an de ji Mustafa Kemal re dişîne, mizgîna girtina “Kürt Teali Cemiyeti” weha dide wî:

“...Li ser propogandaya di bin parastina Îngilîzan de dewleteke serbixwe ya Komeleya Kurd ku li Diyarbekirê ji aliyên hinek xortên kurd ve hatibû avakirin û bi fesadiyên berpirsiyarê Silêmaniyê Mr. Noel ev tişt dikirin û ji ber lîdijderkitina xelkê ya dişwar û dijayetîya qanûna komeleyan, ev komeleya ku navê wê derbas dibe hate girtin. Di derheqê wê de, ji aliyê wîlayetê ve lêpîrsîna qanûnî dest pê kiriye. Niha, li Diyarbekirê tenê ‘İtilaf ve Hürriyet Partisi’ heye, ji derveyî vê tu komeleyên din tune” (12).

Mustafa Kemal li ser van tedbîran di 15-ê hezîrana 1919-an de, ji Amasyayê telgrafek şîfrekirî ji cîgirê waliyê Diyarbekirê re dişîne. Di vê telgrafê de, ew nerîn û piştgiriya xwe ya di vî warî de weha dide diyar kirin :

“Her komeleyeke ku bixwaze fesadiyê di nav welêt de derxîne, divê di cîh de bête belav kirin...Girtina tedbîrên weha, vatiniyeke welatperwerî ye. Ji ber vê yekê, ez bi her awayî bi wan tedbîrên we yên ku we li hemberî Komeleya Kurd girtine re me” (13).

Gava Mustafa Kemal derbasî Erziromê dibe û haziriya “Kongreya Erziromê” dike, propoganda û siyaseteke kone û durû dimeşîne. “Biratiya Îslamî, biratiya Kurd û Tirkên” derdixîne pêş û soz û peymanan dide kurdan ku gava bi hev re welêt ji bin destên hêzên biyanî derxênin, wê mafên kurdan yê neteweyî jî bête dayin. Armanca Mustafa Kemal di bin perdeya “biratiya Tirk û Kurdan” de tevgera neteweyî ya Kurdistanê bitefîne û pêşîya şiyarbûna neteweyî bigre. “Erzurum Müdafaai Hukuk Cemiyeti” di belavoka xwe ya 30-ê gulana 1919-an de, li ser wîlayetên Kurdistanê weha dinivîse: “Ev wîlayetên me emanetî namûs û welatparêziya Kurd û Tirkên ku bi dîn û dîrokî birayên hev in, ne”. Vê komeleyê di raporeke xwe ya 17-ê hezîrana 1919-an de jî mafên “milletekî ku ji Kurd û Tirkên pêkhatî” diparast. Li ser vê siyaseta kone û durû, hinek pêşengên siyasî û kesên naskirî yên kurdan li tevgera Mustafa Kemal germ dinerin û beşdarî Kongreya Erziromê dibin. Di vî warî de, M.A. Gasratyan weha dinivîse:

“Di hezîrana 1919-an de, Kongreya Tevgera Neteweyî ya Kurdan li Erziromê civiya. Di kongreyê de hate diyar kirin ku ew li tevgera rizgarîxwaziya tirkên bi sêpatî dinerin û biryarek hate girtin ku bi şertê mafê otonomiya Kurdistanê bête qebûl kirin, ew dê bixwazin piştgiriya vê tevgerê bikin. Kongreyê daxwaz kir ku eger otonomiya Kurdistanê neyê qebûl kirin, teva zîldana tevgera Kemalîstan, li hemberî Sultan divê serhildaneke berfireh bête



Yên rûnîştî: Qedrî Cemîl Paşa, Xelîl Ramî Bedîrxan

Yên li piya: Dr. Nafiz (yê duwemê destê wî lî ser girmilkê Qedrî Cemîl e), Celadet Bedîrxan (yê lî paş Xelîl Ramî), Memduh Selîm (jî alî rastê yê çaran), Ekrem Cemîl Paşa (jî alî rastê yê duwem), Kamûran Bedîrxan (lî rêza dawî yê, yê navîn)
(Foto jî pirtûka "Muhtasar Hayatım" hatiye girtin)

dest pê kirin. Pêşengên kurdan yên ku beşdarî vê kongreyê bûbûn, weke prensîb ne li dijî damezrandina dewleteke neteweyî ya Tirkî bû ku di nav sînorên xwe de otonomiya Kurdistanê nas bikin. Ji ber vê yekê, gelek ji wan di 10-23 ê tîrmeha 1919-an de beşdarî Kongreya Erziromê bûn.

Di belavoka kongreyê de weha dihate gotin: "...Wîlayetên rojhilatê Erzirom, Sîwas, Diyarbekir, Xarpêt, Wan û Bitlîs...yekperçeyekî ku bi tu awayî ji hevdu û civata Osmanî nayê veqetandin. Mîslîmanên ku li vê navçeyê dijîn...taybetiyê her grûbên neteweyî û civakî ku di pêkanîna neteweyê de cih girtine, wê li ber çavan bê girtin; lê bi awakî giştî ew unsûrên mîslîman hemû, xwe weke birayên ku ji dê û bavekî ne dibînin" (14).

Di derheqê vê "Kongreya Tevgera Neteweyî ya Kurdan" de, em vê gavê ne xwediyê çavkanî û agahdariyeke misoger û zelaڵ in. Em dizanin ku di wê demê de Xalid Begê Cîbrî û hinek serbazên leşkerî yên kurd û welatparêz di wê

navçeyê de dixebitîn. Dive ku ji aliyê welatparêzên kurdan li wê dere civîne-ke weha hatibe civandin. Lê em vê yekê nikarin bi awakî misoger îddia bikin.

Kongreya Erziromê di nav 23-ê tîrmeh û 7-ê tebaxa 1919-an de hatibû civandin. Ew tarîxa ku M. A. Gasratîyan li jor dide ne rast e. Kongreya Erziromê ji aliyê “Müdafaa-i Hukuk-u Milliye Cemiyeti” (Komeleya Parastina Mafên Neteweyî yên Wîlayetên Rojhilatê) liqê Erziromê ve hatibû civandin. “Müdafaa-i Hukuk-u Milliye Cemiyeti” di 4-ê çeleya pêşîn ya 1918-an de, li Stenbolê hatibû damezrandin. Armanca wê ya rastî, hejarkirin û dejenerekirina tevgera neteweyî ya gelên Kurdisatnê bû. Ji xwe vê komeleyê bi awakî vekirî piştgirî û hevalbendiya tevgera Mustafa Kemal dikir.

Li gor agahdariyên ku İsmail Beşikçi dide, 54 kes beşdarî Kongreya Erziromê bûne. Ji van 17 kes endamên “Trabzon Muhafaza-i Hukuk-u Cemiyeti” bûn. Delegeyên Kurdistanê yên bi navê “Wilayet-ı Şarkîye” ketibûn kongreyê zêdeyî 20 kesan bûn. Di kongreyê de Wan bi du, Bedlîs bi yek, Sêrt bi du, Qerekose bi yek, Giyadîn bi du, Beyazîd bi yek, Gêxî bi du, Xinis bi yek, Zêdkan bi yek, Pilemorî bi yek, Hesênqele bi du, Tercan bi yek delegeyan dihatin temsîl kirin. Herweha ji Erzînganê, Erziromê û Sîwasê jî delege hebûn. Mustafa Kemal û Rauf Beg jî weke delege beşdarî kongreyê bûbûn. Piraniya delegeyên ji Kurdistanê kesên eşraf bûn. Di nav delegeyên ji navçeyên din hatibûn kesên memûr, leşker û yên teqawît jî hebûn. Belavoka Kongreya Erziromê ku ji deh madeyan pêk hatibû, di 7-ê tebaxa 1919-an de hate belav kirin. Di kongreyê de komîteya birevebir jî hate hilibijartin. Ev komîteya ji van kesan pêk hatibû: 1- Mufetîşê Ordiya Sisêyan yê berê Mustafa Kemal, 2- Wezîrê deryayî yê berê Rauf Beg, 3- Xoce Raîfê Erziromî, 4- Mebûsê Trabzonê İzzettin Beg, 5- Mebûsê Trabzonê Servet Beg, 6- Ji Erzînganê Şêxê Nexşîyan Fewzî Efendî, 7- Waliyê berê yê Beyrûdê Bekir Samî Beg, 8- Mebûsê berê yê Bedlîsê Sadullah Efendî, 9- Serokê Eşîra Mûtkiyan Hecî Mûsa Beg. Piştî van kesan Kazim Karabekir jî xistine nav vê komîteyê. Ev komîte bi tu awayî neciviyaye û tu wezîfe jî pêk neaniye. Ji xwe, serokê eşîra Mûtkiyan Hecî Mûsa Beg û Mebûsê berê yê Bedlîsê Sadullah Efendî, Waliyê berê yê Beyrûdê Bekir Samî Beg beşdarî Kongreya Erziromê nebûne. Ew ne nûnerê kongreyê bûn. Bê xebera wan, kongreyê ew hilibijartine (15).

Di belavoka Kongreya Erziromê de, wîlayetên Kurdistanê bi navê “Wilayet-ı Şarkîye” (Wîlayetên Rojhilatê) tên bi nav kirin û Kurdistan bi navê “Wilayet-ı Şarkîye” weke perçeyekî civata Osmanî tê qebûl kirin. Di rastiya xwe de, Mustafa Kemal di bin maskeya “biratiya mislimaniyê û biratiya Kurd û Tirkî” de siyaseteke nîjadperest û kolonyalîst ya Tirkî dimeşand.

Ew hewldan û gotinên grover yê ku dikarîbûn bi guhan xweş bihatana jî tenê ji bona xapandina kurdan û tefandina tevgera neteweyî ya Kurdistanê bû. Mustafa Kemal ji bona ku rûyê xwe yê rastî eşkere neke, pir bi zanebûn gotinên “enasirên Kurd û Tirk”, “biratiya Îslamî” û “biratiya Kurd û Tirkan” dixebitand. Di protokola Amasyayê ya 20- 22-ê çiriya pêşîn ya 1919-an de jî, “erdên ku Kurd û Tirk li ser dijîn”, weke sînorê Dewleta Osmanî hatiye pejirandin. Ji bona pêşiya propogandayên dewletên biyaniyan bigre û kurdan bêtir bi xwe ve girêdin jî, di vê protokolê de ev biryar hatiye girtin:

“Ji bona propogandayên biyanî yê ku xwedêgiravî bi armanca serxwebûna kurdan tên kirin, berteraf bibin; biryar hate girtin ku piştgiya hemû mafên etnîkî û civakî yê ku wê serbestiya pêşketina kurdan pêk bîne, bête kirin. Munasib hate dîtin ku ev tişt ji niha de ji aliyê kurdan ve bête zanîn” (16).

Mustafa Kemal bi van fen û listikên xwe gelek serokeşîr û malmazinên kurdan xapand û ji bo şerê damezrandina “Komara Tirkîyê” alîkarî û piştgiya wan stend. Bi saya serê kurdan tevgera xwe li Kurdistanê hûnand û li ser xirbeyê Împeratoriya Osmanî dest bi amadekirina şerê damezrandina dewleteke nû kir.

II. NAMEYÊN MUSTEFA KEMAL

Piştî daxuyaniya Kongreya Erziromê, Mustafa Kemal ji hinek serokeşîr û malmezînan kurdan yê ku li ser civatê xwedî desthilatdar û tesîreke berbiçav bûn re, nameyên taybetî dişîne. Nameya pêşî di 10-ê tebaxa 1919-an ji Serokê Eşîra Mutkiyan Hecî Mûsa Beg re hatiye şandin. Şêş nameyên din jî di 13-ê tebaxa 1919-an de ji Evdirahman Axayê Şernexî, Omer Axayê Dêrşewî, Resûl Axayê Musaşî, Mebûsê berê Sadullah Efendî, Şêx Mahmûdê Berzencî, Şêx Ziyaeddînê Norşînî re hatine şandin.

Li gor agahdariyên ku Ekrem Cemîl Paşa dide, Mustafa Kemal di destpêkê de gelek nameyan ji bavê wî Qasim Beg re jî dişîne û bi zimanekî şêrîn dixwaze piştgiya wî bistîne. Lê gava di wan têkiliyan de bi ser nakeve, vê carê danûstendinê bi apê wî Mistefa Beg re datîne. Apê Ekrem, Mistefa Beg mirovekî bi emir û sofî bû. Bi riya “mislimaniyê”, “Mustafa Kemalê Selanîkî, Mustafa Begê Diyarbekirî dixapîne”. Mustafa Kemal, bi wê durûtiya xwe ne hew Mustafa Begê mala Cemîl Paşa, her weha gelek beg û serokeşîrên kurdan yê din jî dixapîne. Lê di vê demê de, li navçeya Koçgirî û Dersimê xebat û tevgera neteweyî roj bi roj geştir û berfirehtir dibû; Koçgirî ji bo serhildaneke neteweyî weke beroşeke li ser êgir dikeliya...

Mustafa Kemal bi awakî giştî tevgera neteweyî ya Kurdistanê û weke perç-

eyekî vê tevgerê xebat û têkoşîna “Kürt Teali Cemiyeti” li pêşiya bicihanîna armanc û planên xwe kelem û astengeke mezin didît. Loma jî, ew ji bona te-fandîna tevgera neteweyî ya Kurdan di nav xebateke pîralî û berfireh de bû. Ji bona ku li Diyarbekirê jî bi ser keve û xebatên “Kürt Teali Cemiyeti” ji bi-nî de rawestîne, ew sê paşeyan dişîne Diyarbekirê. Bi beşdariya hersê paşeyan û qelebalixiyeke mezin, civînek tê çêkirin. Di vê civînê de, paşayên Mustafa Kemal di lîstik û planên xwe de bi ser nakevin. Lê ji bo rûxandîna komeleyê bi awakî dijwar dijminatîya xwe didomînin. Di dawiyê de, ew Hemdî Beg zorge dikin ku ji komeleyê îstifa bike. Ji ber tehdît û zordariyên paşayên Mustafa Kemal, kesên ku di rojnameyê de dixebitin jî dev ji kar berdidin û direvin. Rojnameya komeleyê êdî dernakeve. Paşeyan bi fort, zordarî, fêlbazî û ruşwetan gelek kesên xuyanî û serokeşîr li derdora xwe dicivînin û bi aweyekî êşkere dest bi dijminatîya komeleyê dikin. Jiyana komeleyê êdî di tehlûkê de ye. Ji derveyî Mele Hemdî, endamên komîteya birêvebir yên komeleyê cara dawî dicivin. Bi dû gotûbêjên dûr û dirêj û bi piraniya dangan vê biryarê digrin: “Divê Ekrem ji komeleyê îstifa bike û ji Diyarbekirê derkeve; dû re, komîteya birêvebir bi Kenan Paşa re rûnê û meseleyê bi awakî aşîtî çareser bike”. Piştî vê biryarê bi rojekê Ekrem Cemîl Paşa Diyarbekirê terk dike û di ser Helêbê re berê xwe dide Stenbolê... (17).

-
- (1) Zinar Silopî, Doza Kurdistan, Oz-ge Yayınları, Ankara, 1991, r. 52.
 - (2) Ekrem Cemîl Paşa, Muhtasar Hayatım, Weşanên Enstituya Kurdan ya Brukselê, Îlona 1989, r. 33.
 - (3) Ekrem Cemîl Paşa, berhema navê wê derbas dibe (b.n.d), r. 32- 33. Ekrem Cemîl Paşa, gava behsa alîkariya ji bo çapkîrîna pirtûka Mem û Zînê ku ji aliyê Hemze Begê Mîkîsî ve di-hate amade kirin, dike; navê wî Remezanê Mîkîsî nivîsandîye.
 - (4) Zinar Silopî, b.n.d, r. 53.
 - (5) Ekrem Cemîl Paşa, b.n.d, r. 34.
 - (6) Binere: Zinar Silopî, b.n.d, r. 53. Ekrem Cemîl Paşa, b.n.d, r. 33.
 - (7) Zinar Silopî, b.n.d, r. 53.
 - (8) Ekrem Cemîl Paşa, b.n.d, r. 38.
 - (9) Ekrem Cemîl Paşa, b.n.d, r. 38.
 - (10) Yê ku ji “Harf Tarihî Vesîkalari Dergisi”, sal: 2, hejmar: 5, Belga 90- î, Ankara- Îlona 1953 neqil dike: Hîdîr Göktaş, Kurtler İsyân-Tenkil, Alan Yayıncılık, Stenbol, Nîsana 1991, r. 33-34.
 - (11) Binere: Hîdîr Göktaş, b.n.d, r.34.
 - (12) Soylev, cild 3, belge 8, r. 9.
 - (13) M.A.Gasratyan, Yenî ve Yakîn Çağda Kurt Hareketleri, Weşanên Jîna Nû, Swêd, Îlona 1991, r. 125- 126.
 - (14) M.A.Gasratyan, b.n.d, r. 126.
 - (15) Ji bo dirêjaya vê behsê binere: İsmail Beşikçi, Kurdistan Uzerinde Emperyalist Boluşüm Mucadelesi 1915- 1925, cild 1, Yurt Kitap Yayın, Ankara, gulan 1992, r. 253-262.
 - (16) Ji bona Protokola Amasyayê binere: İsmail Beşikçi, b.n.d, r. 381-382.
 - (17) Ji bo dirêjaya vê behsê binêre: Ekrem Cemîl Paşa, b.n.d, r. 41- 44.

WARGEH

Kî ye xwediye van wargehan
û vî welatî

Destên xwe di nav porê min re dibe sir
roj ramûsanê datîne ser hinarkên min
di ber baskên pacê re çavan dinoqîne;
sihar ji paxila min der tê bê pêjin...

di sira siharê de hilma axê divîbûm;
beytik divîbûm, dîk divîbûm
û ew bêhna çilo...
guhekî min li dû bilûra şivên,
bi dengê rojê hildiçenim, looo!
bajar e birako.
sihara bajarê
naşibe xewn û xeyalên helbestkaran...

ku lîstibûm li gasînên wê
bi xilçan, bi çavgirtînkê, bi çirrê...
û berûyêk min lê çandibû...
Çalê gundek e,
di zaroktiya min de ma...
vingûvala ne aniha
Cibiltîne, Xirbê Hinarê, Serê Kaniyê;
û Cinata te Miho!
Silêman! Çala te...
de... li xwe xe Sadûn!
ka li ku ma axatiya te?...

ev tirî, misebiq e,
rezvanê hoste kesax bike,

ma kî têr dibe ji tamê...
ev kerkûş e,
gûnroj e libqurûş e...
û ev jî merzone ye,
rûmeta rezvanê çiyê,
tamek ji dîroka keda me...

hesk derketine ji destên me,
kevçiyên dar, halet û gîsin...
di kûra êgir de hesin me hilandiye.
ne..., karkerekî me bû Kawa?
navbêra herdu avan li der û dorê
ev qesr, pir... avanî
hîmên pêşerojê ne,
ne..., da li ser bilind bûba dahatû?

nebêje çû nede dû!
ji Newrozê şerm bik û
ji wê girra xwe xwe a bi rik...
qewmekî perest û bi milk;
ev rik e..., ev dahfik?...

veparime
û bipirse ji xwe:
-ka ez çi me?
bipirse:
-ka ez kî me?
û bipirse:
ên ji dûr hatî
an ez im xwediyê van wargehan
û vî welatî?..

ARJEN ARÎ

BABETA SALA MIRINA ŞERÎF PAŞAYÎ (Lêkolîneke bîyografîk)

ROHAT ALAKOM

Di “lêkolînên kesan” û “lêkolînên bîyografîk” de dem û cîhê bûyîn û mirina kesan gelek giring e. Dema min lêkolîna xwe ya Şerîf Paşa amade dikir, beşa ku zêde serê min êşand, beşa salên wî yên dawîn bûn. Bi taybetî jî dîrok û cîhê mirina wî bû. Ez di nav şikekeke mezin de bûm. Kêmbûna zaniyarî û agahdarîyên li ser van salên Şerîf Paşa bêguman zêde wextê min digirt. Jîyîna Şerîf Paşa jî, wek jîyîn û bîyografîya gelek şexsiyetên Kurd yên mayîn hatibû ji bîr kirin, tiştê zêde nehatibû nivîsîn. Eger dokument û çavkanî li ber destê mirovan tune bin, wê çaxê ji nû ve nivîsîna bîyografîkê ewqas diwarttir dibe.

Çawa çend çavkanîyên Tirkî didin dîyar kirin ku Şerîf Paşa di sala 1944'an de mirîye. Ji van çavkanîyan yek ya here giring û bingeîn jî Ansîklopedîya Meşhurên Tirk e ku bi destê Ibrahim Alaettin Gövsa hatiye amade kirin, di dewra xwe de çavkanînek bingeîn dikare bê hesabîn. Di vê ansîklopedîyê de tê dîyar kirin ku Şerîf Paşa di sala 1944'an de mirîye, cîhê mirina wî nehatiye kivş kirin (1).

Ev zaniyarîyên İbrahim Alaettin Gövsa bi salan, ji alîyê nivîskar ve lêkolînerên mayîn de hatiye dubare kirin û heta van rojên îroyîn jî wusan hatiye qebûl kirin. Tarik Zafer Tunaya yek ji wan lêkolînerên Tirk jî ku mirov bawerîya xwe zêtir pê tîne, ew jî sala mirina Şerîf Paşa wek 1944 nîşan dide (2). Wusan tê xuyanê ku Tarik Zafer Tunaya jî, ev agahdarîya kurt ji vê Ansîklopedîya Meşhurên Tirk girtîye - belkî jî ji çavkanîneke mayîn - çimkî di nav notên Tunaya de jî navê ev ansîklopedîyê wek çavkanîneke duwemîn derbas dibe. Çend lêkolînerên ku bi koka ne Kurd in, ew jî sala mirina Şerîf Paşa wek 1944 nîşan didin. Ji alîyê din ne İbrahim Alaettin Gövsa, ne Tarik Zafer Tunaya, ne jî çavkanîyên mayîn cîhê mirina wî nadin. Ne tenê sal û cîhê mirina wî, roja mirina Şerîf Paşa jî, îro ji me re ne zelal e.

Pirtûka min ya li ser Şerîf Paşa li Stockholmê di sala 1995'an de der çû (3). Min, angorî van çavkanîyan sala mirina Şerîf Paşa 1944'an nîşan daye. Lê belê dema min ev pirtûka xwe amade dikir, ez fêr bûm ku di çavkanîyeke

mayîn de, tê dîyar kirin ku Şerîf Paşa di sala 1951'an de li Romayê -Italîyê mirîye. Ev zaniyarî di pirtûkeke Mihemmed Resûl ya ku li ser Şêx Mehmûd hatîye nivîsîn, li wir de derbas dibe (4). Min ev çavkanî jî peyda kir, lê belê nehatîye dîyar kirin ku ev agahdarî û zaniyarî ji kîderê hatîye girtin . Dîsa jî wek zaniyarî, min ev dîtina di dawîya pirtûka xwe de, beşa notan de nivîsî û di vê babetê de min derî nîv-vekirî hîşt (5).

Him dema amadebûna pirtûkê de, him jî piştî derketina pirtûkê min bi devkî û nivîskî ji gelek kesên dîroknas û pispor ev yeka pirsî û li gelek derîyan xist.

Berî ku xebata min ya li ser jîyîna Şerîf Paşa bê çap kirin, lêkolînên min yên li ser dem û cîhê mirina Şerîf Paşa berdewam kirin. Li ser dîtina Mihemmed Resûl (Hawar) ku dibêje Şerîf Paşa di sala 1951'an de li Romayê mirîye, vê carê min bi rêya nameyekê ev yeka ji Mirella Galletti pirsî. Ev xanima Italî, wek kurdnasekê tê zanîn, li ser Kurdistan gelek xebatên wê hene û niha li Bolongayê dimîne. Piştî gelek pirs-pirsîyarîyan, ew jî negîhişte tu cîhekî. Di nameya xwe ya bi 5.9.1995 terîxî de dide dîyar kirin ew jî ev saleke pey vê pirsê ketîye, lê belê rastî tu dokumentekê nehatîye. Di nameya xwe 24.9.1996'an de jî dinivîse ku, ew çûye Romayê, lêkolaye, hejmarên kovara Oriente Moderno heta sala 1952 raçav kirîye, rastî tişteki nehatîye.

Lê belê di eynî nama xwe de, Mirella Galletti bala me dikşîne ser agahdarîke piçûk û balkêş. Angorî nûçeke ku hejmara vê kovarê de çapbûyî (hejmar:1-3, 1950) Şerîf Paşa li ser mafên Kurdistan memorandumek belav kirîye. Mirella Galletti dide dîyar kirin ku ew ne emîn e ku munasebetê vê nûçeyê bi lîderekî Kurd re - bi Şerîf Paşa re hebe, ji ber ku Şerîf Paşa zêtir bi nîşana xwe ya “Sefîrê Osmanî yê kevn li Stockholmê” tê nasîn . Emê paşê jî bibînin, ev zaniyarîyên derheqa 1950'yê gelek balkêş in, ji ber ku di çavkanîyên mayîn de jî derbas dibin ku salên 1948 û 1950'yê de Şerîf Paşa bi navê Kurdistan careke din derketîye sahneyê.

Gelo derheqa dem û cîhê mirina Şerîf Paşa li Misirê mirov dikare rastî hin agahdarî bê? Ji bo vê yekê min namek ji balyozxana Swêdê li Kahîrê re şand. Bersîva nama min gelek dereng ket. Piştî ku pirtûka min ya li ser Şerîf Paşa der çû, min bersîv girt. Bi navê balyozxanê Hans Olsson bersîva xwe de waha digot: “ Ji bo nama te û pirsîyarîya derheqa Şerîf Paşa gelek spas. Di mehên derbasbûyî de bi rîya gelek qanalan me hewl da ku daxwazên te yên derheqa terîxa mirina Şerîf Paşa de bînin cîh. Em derheqa wî de li arşîvên cure-cure, wezerata karên der, pirtûkxane, wusan jî bi çend dîroknasan re peyivîn, lê belê em di lêkolînên xwe de pir mixabin negihîştin tu serfirazîkê. Ew hewl-dayînên em pê re ketin kontaktê, pir mixabin tu bersîvek derheqa wan zani-

yarîyên ku tu pirsîyarîya wan dikî, nedan. Bi silavên dostanetîyê” (Nama bi 25.2.1996 terîxî). Min wusan bawer dikir ku, bersîva vê nameyê wê gelek pirsan zelal beke. Lê belê wusan nebû. Ji alîyê din de, piştî vê nameyê ew dîtina ku dibêje Şerîf Paşa salên xwe yên dawî li Misirê derbas kirine, êdî ji min re wek tezeke xurt ne hate xuyan.

Lêkolîna min bi navê Salên Bagerê yên Dîplomatekî Kurd - General Şerîf Paşa, zivistana sala 1995'an li Stockholmê bi zimanê Tirkî hate weşandin. Lê belê dem û cîhê mirina Şerîf Paşa timê di hişê min de ma, lêkolînên min berdewam kirin û niha jî berdewam in. Paşê min namek ji Mihemmed Resûl re şand, gelo ew ji kîderê fêr bûye ku Şerîf Paşa di sala 1951'an de li Romayê mirîye? Ew, bi nama xwe ya bi 6.3.1996 terîxî de dibêje ku, wî ev zaniyarî demekê di deftera xwe de qeyd kirîye, niha nayê bîrê ku, wî ev zaniyarî li kîderê dîtine. Di dawîya nama xwe de dibêje ku dema wî ew dokumenta dît, wê ji min re bişîne! Mihemmed Resul, di pirtûka xwe de her çiqas nivîsîye ku Şerîf Paşa di sala 1951'an de li Romayê mirîye jî, ew bawerîya xwe bi dîtînen dîroknamekî Erebbî, Mîr Besrî tîne û sala mirina Şerîf Paşa wek sala 1944 rasttir dibîne. Mîr Besrî, ev dîtina xwe di pirtûkeke bi navê Navdarên Kurd de daye dîyar kirin ku li Londonê bi Erebbî hatîye nivîsîn. Lê belê piştî çendekî Mihemmed Resul, ev bawerîya xwe guhirand.

Heta niha min wusan zanibû ku teza 1944'an tenê di nav dîroknasên Tirk de heye, lê belê piştî vê çavkanîyê û nivîseke ku li ser Şerîf Paşa li Surîyê hatîye weşandin (6), êdî min jê derxist ku ew dîtina zêde belav bûye û tenê ne dîtina dîroknasên Tirk e.

Min ev yeka bi name ji Cemal Nebez pirsî, wî jî sala mirina Şerîf Paşa nizanibû. Nama xwe ya bi 1.1.1996 terîxî de navên çend kesên ku niha najîn dide, eger ew bijîyana, bi bawerîya Cemal Nebez, mimkûn e wan ev yeka bizanibûya, yek ji wan jî Mihemmed Elî Avnî bûye... Paşê ez fêr bûm ku keçeke wî, bi navê Doreya Avnî, niha li Parîsê dijî, min wusan bawer dikir ku, ew derheqa vê babetê de xwedî zanîyar be. Lê belê dema em bi telefonê peyivîn, wê got ku :Min navê Şerîf Paşa qet nebîhistîye”.

Di dawîyê de rojnama New York Timesê bîna me piçekî, mirov dikare bêje nîvî-nîvî fireh kir. Nûçeyêke ku di sala 1950'yî de di rojnama New York Times de çapbûyîbi dide dîyar kirin ku Şerîf Paşa di sala 1944'an de nemirîye, ew diji: “...Di roja 29.11. 1948'an de delegasyoneke Kurd bi serokatîya Şerîf Paşa - yê ku di Konferansa Aştîyê li Parîsê de timê Kurd temsîl kirine-memorandûmek ji sekreterê giştî yê Yekîtiya Netewan re pêşkêş kirîye”(7) Paşê ez fêr bûm ku Şerîf Paşa wek serokê delegasyoneke Kurd, di salên 1948'an û 1950'yî de du memorandum li ser mafên Kurdan belav kirîye.

With the Soviet radio now broadcasting in the Kurdish language from two stations, the most influential of which is in Baku, attention has lately been focused on the activities of Kurdish nationalists who have taken refuge in the Soviet Union after having been driven out of Iraq and Iran.

Kurdish leaders in Paris, whose representations to the United Nations and to the Western powers appear to have gone unheeded, are increasingly embarrassed by their failure even to be heard. They wonder how long, under these circumstances, they can hold the confidence of the Kurdish people.

On Nov. 29, 1948, a Kurdish delegation headed by Sherif Pasha, who already had represented the Kurds at the Peace Conference in Paris in 1919, addressed a memorandum to the Secretary general of the United Nations.

Basing the Kurdish claims on the United Nations Charter as it applies to the rights of non-autonomous territories, the memorandum charged that the Kurds were being subjected of « systematic extermination. » It also recalled the Treaty of Sèvres had recognized the right of geographic and ethnical entity.

Ev nûçeya ku di New York Timesê (6/1 1950) de çap bûyî, nişan dide ku Şerif Paşa bi kêmanî heta sala 1948'an jîyaye. Ev nûçe wisan jî di Bulletin du Centre d'Etudes Kurdes de hatîye weşandin (No: 10, 1950).

Hem ev agahdarîyên nû, hem jî tekstên van memoranduman, wusan jî di Bultena Navenda Lêkolînên Kurd (Bulletin du Centre d'Etudes Kurdes) cîh girtine. Çawa tê zanîn ev weşana ji aliyê Kamuran Bedirxan de wek 13 hejmaran (1948-1950) li Parîsê der çûye. Tê dîyar kirin ku ev delegasyona li Parîsê hatîye saz kirin û ji çend kesan pêk hatîye. Di nûçeyeke mayîn ku dîsa di New York Times de çapbûyî de, Kamuran Bedirxan dide kîvê ku : "Hefta tê roja Çarşemê delegasyoneke Kurd li dijî êrîşên Iranê wê protestoke hişk li gel Yekîtîya Netewan pêşkêş bike "(8). Piştî hilweşandina Komara Mahabatê, çawa tê zanîn ku êrîşên li dijî Kurdan berdewam in, problema Kurdan li dinê dîsa aktuel dibe. Ev delegasyon ji çi kesan pêk hatîye? Angorî namaya Mihemmed Resul ya bi 25.3.1996 terîxî, di nav vê delegasyonê de ev kes hebûne: Şerif Paşa, Kamuran Bedirxan, Nurettin Zaza, Mihemmed Hilmi Beg, Dr. Nafiz (xelqê Qamişlîyê). Çawa em dibînin Nurettin Zaza bi xwe jî, di bîranînên xwe de besa delegasyonekê dike, dide dîyar kirin ku ew jî endamê

wê bûye. Lê belê zêde zaniyarîyan pêşkêş nake (9). Piştî van zaniyarîyan êdî derkete holê ku Şerîf Paşa, wek di gelek çavkanîyan de cîh girtîye di sala 1944'an de nemirîye, heta sala 1950'yî jî jîyaye, lê belê kîjan salê mirîye ne kivş e.

Mihemmed Resûl di vê nama xwe ya duwemîn de, ya bi 25.3.1996 terîxî de, derheqa mirina Şerîf Paşa de wek nama xwe ya pêşîn êdî bawerîya xwe bi "teza sala 1944" nayne, ji ber ku dokumentên teze derketine. Lê belê li vir pêwîst e bidim dîyar kirin ku, Mihemmed Resûl yek ji wan kesan e, bi meraqeke mezin ya dîrokî li pey vê pîrsê ketîye. Mirov dikare bêje ku, yek ji wan endamên here aktîf yê "Komîta Tespîtkirina Terîxa Mirina Şerîf Paşa" ye. Derheqa salên Şerîf Paşa yên dawîn de, ev zaniyarîyan ji bo me tiştine teze ne. Ev pirtikên zaniyarîyê, wek tîrêjeke nû, me ronî dikin, hêviyên me yên dîrokî xurttir dikin. Ji alîyê din ev zaniyarîyên nû, derheqa vê babetê de, wan şikberî, şuphe, bêgumanî û nebawerîya gelek kesan ji ortê radike, ji nû ve nivîsîna bîyografîya Şerîf Paşa re dibe alîkarîke mezin, derheqa salên Şerîf Paşa yên dawîn de jî me gelek agahdar dikin. Ev zaniyarîyan her çiqas wan dîtî-nên berê pûç dikin jî, lê belê sala mirina Şerîf Paşa dîsa nezelakirî ye û di nav tarîyê de dimîne.

Derkete holê ku Şerîf Paşa di sala 1944'an de nemirîye. Pekî bi rastî Şerîf Paşa, çi wextî û li kîderê mirîye? Bersîva vê pîrsê, angorî dîroknasên ku em pê re ketine pêwendîyan, sirek e !(mystery), nayê zanîn. Ev babetên piçûk, bi rastî ji li pêşberî nivîsîna dîroka Kurd îro problem û şerêşîyên mezin pêk tînin, dest pîyê mirovan tînin girêdan, mirov di cîhê xwe de sar dibe.

Piştî vê yekê êdî ez hatim ser wê bawerîyê ku dîroka netewekî bi ajîstasyon û propagandayê ve nayê nivîsîn, êdî pêwîst e dîroknas, lêkolîner û nivîskarên Kurd dev ji zîhnîyet û sloganên wek "Kurd namirin" ! berdin. Eger Kurd pey dîroka xwe nekevin, Kurd dikarin bimirin, ji ortê rabin û bîr kirin jî.

1) İbrahim Alaettin Govsa, *Türk Meşhurları Ansiklopedisi*, rûp. 369.

2) Tarık Zafer Tunaya, *Türkiye'de Siyasal Partiler II*, rûp.219.

3) Rohat Alakom, *Bir Kürt Diplomatının Fırtınalı Yılları: General Şerif Paşa*, Stockholm, 1995.

4) Mihemmed Resûl (Hawar), *Şêx Mehmud- Qehreman u Dewletek-y Xwaru-y Kurdistan*, London, bergê II, 1991, rûp:16.

5) Rohat Alakom, *eynî berhem*, rûp.123.

6) Bavê Goran, *General Şerif Paşa, Pîrs - Kovareke Rewşenbîrî*, Serbixwe ye, hejmar:1, 1993.

7) *New York Times* 6.1.1950

8) *New York Times* 11.9.1950

9) Nureddin Zaza, *Bir Kürt Olarak Yaşamım*, Stockholm, 1994, rûp.182.

GULSÎPAN

Leşkeran kincên Gulsîpan yên kesk û sor û zer çirandin. Gulsîpan ji hêrsan tiliyên wana gez kir. 1991, meha yazdan.

xêl hat
xêla daweta giran
di nav xêlê da
yek ji xêliyan
delala dilan
Gulsîpan.

bi şahî û xweşî
bi evînî û başî
bi xemla xwe ya rengîn
bi pora xwe ya zêrîn
bi wî zarê şîrîn
dike axîn û zarîn
Gulsîpan.

Gulsîpan keça kurd
heft salî bû
xemlandî bû
bi seranser
bi kesk û sor û zer
hate girtin pêşî
li xêlê
êrîş anînê
ser xemlê
bi hêrs mêzekir li wan
hêvî ya dûwerojan
Gulsîpan.

nizanîbû
qedexe ne reng
fekirî dor û alî
bê deng
hêrsbûn neyarên
rengan û dengan
cûda kirin
ji nav xêliyan
Gulsîpan.

bi hovîti êrîş
birine ser
gotin: qedexe ye
kesk û sor û zer
û çirandin kincan
weka hovan
bi kîn mêzekir li wan
gula dilan
Gulsîpan.

bê mecal bû
bê zar û ziman
evîndara rengan
çavên wê tijî bûn
ji hêrsan.
tinebû qet çekên wê
ji dervê diranên wê
ji nişka va
êrîş bire ser hova
bi hêrs gezkir tiliyên wan
tola xwe girt
li meydan
hêvîya me
Gulsîpan.

rûken be
bi hêvî be
Gulsîpan!

weke çiyayê
Sîpan.
bikene
ku
kîn û hêrsên wana zêde be
ku
kesk û sor û zer
bê hêvî nebe
û
kincên te çirde nebe
ken û hêvî
wê xelasiya me be.

govendê geş bike
dilê wana reş bike
govend bila sar nebe
kincên te çirandî jî bin
bila dilê te teng nebe.

rûken be
bêhên fireh be
bila hêrsên te
hêviyê tûj bike
ji bîr neke:
tê welat
bi rengan
û dengan
bixemile
û
govend wê
ji nûh va
dest pê bike.

BEDIRXAN EPÖZDEMİR

BISERHATİYÊN ÇEND MIROVÊN SEYIDXANÊ KERR

CELADET ÂLÎ BEDIRXAN

– III –

[Ji devê] Feyzilah (Fêzo) Axa kurê Hecî Axa ji mala ... (49), birayê Elîcanê rehmetî, emrê wî 29 salî [hatiye nivîsîn].

Osman Axayê Mirdêşî (50) kurê Sebrî Axa ji mala Efendî yan Heyder Axa, ji [devê] Feyzilah Axa nivîsîbû, min jî jê nivîsîye. Ewî bi Tirkî nivîsîbû lê ji min re bi Kurdmançî got. -[Celadet Alî Bedirxan]

Teşkilata Geliyê Berazan

Geliyê Berazan di wîlayeta Bayezîdê, di qeza Tûtaxê de, di aliyê bakur ve Cemaldînan, li aliyê rohilat Sipkan, aliyê nîvro re Hesenan, li aliyê rojava Zirkan dimînin.

Sî gund in, 300 mal in. Hemiyên wan dêmanî (51) ne. Qebîleyên havînê diçin zozanan navê wan: Xazîyan, Mala Mîrê yanî Mîrekan, Bevrana (?), Gewozan, Ibeydan, Rîzeran in.

Li zozanê vê eşîrê hanê Qereyazî, Mêrgê Mîr, Çeqmaqan, Qûça Reş, Qendîla Sîran zozanên wan in. Her car bi Hesenan re yek in.

[Elîcan]

Di sala 1930 de serê buharê, Elîcan Axa bi sî siyarî ve derketibû çiyê. Berî çend mehan Ferzende Beg çûbû nik Elîcan, nav di wî da bû ko rabê û jibona welatê xwe bixebitê.

Piştî du mehan cara siftê li qeza Hesênqelê li nahya Qereyazîyê, [ew û] midirê kar yanî Tewfîq Beg bi mifreza xwe ve li Qirxûnderê rastî hev hatibûn. Piştî şerekî baş, çar hesp, du tifing [bi dest xistibûn], çar jî esker hêsîr kiribûn. Ji mirovên Elîcan kes birîndar nebûbû. Vegeriyabûn Qûça Reş, pênc rûjan li wir mabûn. Şeva şeşan bi rê ketibûn, ji nehya Qereyazîyê derbasê çiyayê Çetelwîranê bûbûn. Birûjê li wir mabûn, êvarê bi rê ketibûn çûbûn Çiyayê Balyemezê, rûja xwe li wir derbas kiribûn. Saet yekê şevê de bi ser Qulixa Wescialiyê (?) de girtibûn. Gundiyan xwestibûn ko zebtiyan biparêzin û şer bûbû. Dawiya şer de du mêr û jinek ji gundiyan miribûn û çar eskerên ko di qulixê de bûn girtibûn û kuştibûn. Qulix jî xirab kiribûn (52). Ji gundiyan xwalê Elîcan, Evdilahê kurê Qadir bi çar xwîlamên xwe ve tevî wan bûbû.

Ewê şevê ji wir bi rê ketibûn, bi şev heya sibê û sibê heya nîvro dîsan çûbûn Qûça Reş. Li wir deh rûj ma[bû]n. Piştî wê, ji Hesênqelê zabitê zebtiyan bi çil siyarî ve hatibû gundê Elîcan Hespreşê, kurê wî Reşîd bi sê xwîlamên wî ve girtibûn. Gundiyan xeber dabûn Elîcan û Elîcan hatibû doralîyê gund girtibû. Zabit Xulûsî Efendî mimkuna revê nedîbû, hatibû cem Elîcan, kur û xwîlamên wî berdabûn. Xulûsî çû[bû] Tûtaxê, Elîcan jî vegeirîbû Qûça Reş, pênc rûjan li wir mabûn. Piştî wê zebtiyên Erzerûmê, yên Hesênqelê, yên Xînisê, yên Tûtaxê, hemiyên wan 150 esker hatibûn ser Elîcan. Elîcan jî bi sî û çar siyarên li nik xwe çardeh siyar şandibûn rêberkîyê, bi bîst siyarên mayîn ve hatibû Çepê. Di wê çaxê de ji mirovên Elîcan, Tofanê kurê Efendî rêberkîya esker kiribû. Ewê şevê berî sibê bi ser gundê Çepê de girtibûn. Elîcan jî bi bîst siyarên xwe ve ji gund bi derketibû û şer kiribûn. Hetanî saet pêncê rûjê yanî nîvro şer kiribûn. Di wî şerî de ji siyarên Elîcan du xwîlam şehîd bûbûn. Ji eskerên Tırko 14 heb bi Tofanê rêberê ve hatibûn kuştin. Tevî 14 birîndaran 50 esker bi zabîtekî piçûk ve hêsîr girtibûn, 50 tifing, 23 hesp, 30 bombe jê standibûn.

Semerek (53) siyarên ko mabûn, revîbûn çûbûn Xînisê. Êsîrên ko girtibûn, [jê] zabit kuştibûn, dawiya mayîn berdabûn. Dîsa vegeriyabûn Hespreşê.

Di ewê rûjê de saet neh û nîvan gaziya eskerên Tırko 20 siyar ji Qerekilîsê hatibûn ser Elîcan û şer bûbû. Heya mexrebê li hev dabûn. Bi tariya êvarê re Elîcan gund berdabû. Ewê şevê çûbûn çiyayê Pasînê, xirabê Gozelderê.

Ewê rûjê li wir mabûn, bi şevê re bi rê ketibûn. Di deşta Pasînê re hatibûn gundê Çixirkomê. Li wir gundiyan gelek qencî jê re kiribûn. Piştî mexrebê verê [bû]bûn çûbûn Çiyayê Alagozê.

Ewê rûjê li wê mabûn. Bi şev bi rêberkîya xelkê Alagozê çûbûn Çiyayê Avnîgê, Aqdaş heye li wir mabûn.

Ew rûj li wir buhartibûn. Bi şevê bi rê ketibûn çûbûn Çiyayê Seqildûtanê, gundê Îlanlî.

Ewê rûjê li wir mabûn. Êvarê bi rê ketibûn, li nizîka Erzerûmê bi saetekê çûbûn Çiyayê Nalbendê.

Ewê rûjê li wir mabûn, bi şev verê bûbûn dîsan saetekê li nizîka Erzerûmê çûbûn Çiyayê Deveboynî, li wir xeber şandibûn ji Şewqî Begê kurê Qosin [re] li Hêrtêfê. Şewqî Beg bi deh siyaran ve hatibûn li Deveboynê gihabûn Elîcan. Jibona ko hindêk cebxane ji xwe re bistînin, ewê şevê berî berbangê rêya Hesênqelê-Erzerûmê birîbûn. Heya nîvro sê qemyon hatibûn, her sêyan jî barê wan zebes bû. Ji ber wê tiştek pê re negotibûn, berdabûn, çûbûn Çiya[yê] Palatokanê.

Ewê şevê li wir mabûn, sibehê dîsan ew rêya ha birîbûn. Tırko neh qemyon esker hinartibûn. Rastî hev hatibûn, bê şer ji hev qetiyabûn, çûbûn Çiyayê Qirxebazarê.

Ewê şevê li wir derbas kiribûn, sibê çûbûn li qeza Nermanê gundê Koşkê.

Ewê rûjê li wir mabûn, bi şev çûbûn nehya Hinsê. Berî sibê bi ser de girtibûn. Bê şer midîr 14 zebtiyan ve girtibûn, hesp û tîfingên wan jê standibûn û berdabûn.

Ewê rûjê li wir mabûn, bi şev derbasê qeza Kotekê gundê Zanzakê [bû]bûn. Li wir tehsîldarek, çar zebtî, başçewişek girtibûn. Başçewiş bi du zebtiyan ve kuştibûn. Tehsîldar û du zebtiyan berdabûn. Ji wêderê vegerîbûn Avnîgê

Şevê din çûbûn Çetelwîranê, ji wire çûbûn Bizirxanê, ji wir çûbûn li Qereyazîyê gundê Bîrû [Biro]. Ji wir çûbûn Qerekeviç [Qeregivîç?], Elûcar [Elûjar], Mela Elî, Kotekan, Gomika Seyidan, Hesên Paşa, Dignûk, Nûredîn, Gundê Helê [Xelê?].

Li wan her gundekî şevêkê mabûn.

Li wir neh suwar cuda cuda gihabûn Elîcan. Ji wir çûbûn gundê Odinçorê jibo ko xelkê gund, wî gundî aliyê Tırko bûn, tîfingên gundiyan jê standibûn, derbasê qeza Kopekê [Kopê] bûbûn.

Li wir, li ser nehya Lîzê de girtibûn. Li hev dabûn. Di dawiya şer de sê zebtî mirî, şeşên wî birîndar, başçawîş (54) bi selametê girtibûn. Midîr bi revê filitîbû, birîndar giş miribûn, başçawîş berdabûn.

Ji wir çûbûn Dehlikê. Ji wêderê Seyidxan brayê xwe Tewfîq bi çend suwaran ve şandibû nik Elîcan, hevalîya wan xwestibû.

Li ser wê, sala 1930, di serê payîzê de, li gundê Sêgiran, bi Seyidxan ve gihabûn hev. Piştî ko Seyidxan bi panzdeh suwaran ve giha Elîcan, li her alî su-

warên Kurdan berî [xwe] da bûn wan. Koma wan bûbû sed suwarî. Li wir, bi berî çend rûjan, gundê Mela Xidran li ber Seyidxan serî hildabûn. Jibona rêanîna wan, bi ser wî gundî de girtibûn. Temamê çekên wan ji wan standibûn. Wê gavê de gundiyan xeber dabûn mifrezê, du sed esker bi ser wan de girtibûn û li hev dabûn. Ji aliyê din sêsed eskerên din jî xwe gihandibûn pêşiya şer. Di nava şerî de ji şerkiran Fesîh (55) birîndar bûbû. Ji eskerê ko berî hatibûn çardeh mêr bi yuzbaşîkî ve hatibûn kuştin, çar mêr jî hêsîr bûbûn. Ji wan hêsîran yek kuştibûn, sisê berdabûn. Hejdeh tîfing, bîst hesp bi hinde hûr û pûr ve ji esker standibûn û li hev belav kiribûn. Ew eskerê ko sêsed bûn, li vî şuxlî nihêribûn hema tu tişt nekiribûn, xwe dabûn pala çiyê, ji wêderê çûbûn gundê Bostankendê, derbasê çiyayê Qicixê bûbûn. Di derbasbûna Deşta Mûşê de rastî panzdeh zebtî hatibûn, lê dabûn, başçawiş kuştibûn, çar nefer hêsîr kiribûn, talîya mayîn reviyabûn. Li wir bi ser nehya Têlê de girtibûn, kesek li wir nedîtibûn. Daîra midir [bi] qereqolê ve hilbişandibûn (56), rûja din di gundê Nûh Begê re derbasê pala Xaça Reş bûbûn. Li gundê Vartxaxê du rûjan mabûn. Ji Bidlîsê pênc qemyon esker hatibûn ser wan, kurê Hecî Mûsa Begî Medenî bi çeta xwe ve jî bi esker re bû. Li hev dabûn. Temamê esker bi zabitekî ve, bi temamê çeta ve hêsîr kiribûn.

Medenî bi qomandanê esker ve nîzingî cihê şer reviyar gundê Îçdamê. Mala gundiyekî de veşîrbûn, nehatibûn dîtin. Ji esker çardeh mêr hatibûn kuştin. Ji hêsîran zabî bi tinê kuştibûn, talîya mayîn beredabûn. Elîcan di wê gavê de li serê çiyê şehîd bûbû, bi xulamêkî xwe ve. Cendekên wan veşartibûn, derbasê nav eşîra Bidêriyan, gundê Mehbûban bûbûn. Ji wir çûbûn Şêxo, deh rûjan li wir mabûn. Dîsan vegeziyabûn Deşta Mûşê, çûbûn Kîrtakomê; li wêderê gundiyan tîfing agir kiribûn ser wan, ewan jî lêdabûn, temamê gundiyan hêsîr kiribûn. Gundiyan yek ji hevalan şehîd kiribûn. Talî xwîna şehîd standibûn, li hev hatibûn.

Jê derbasê Çiyayê Seyda bûbûn û Elozerek, Talik, Zoxak. Li wir li ava Firêr qelibûn çûbûn Şalûrê, Xamûrbêd, Kela Zêrnagê. Li wir teyarekê ewên ha dîtibûn, xeber dabû esker. Kurdmanc derbasê karê xwe bûbûn, hesp û tîfîngên qolciyan standibûn, derbasê Qirimqayê, Gopalan, Elocaran (57) bûbûn. Ji wêderê Şewqî Beg bi dwanzdeh suwaran, xwalê Elîcan Evdile jî bi donzdeh (58) suwaran ve ji Kurdan veqetiyabûn, koma wan heştê suwar mabû.

Ji wir çûbûn Geliyê Berazan. Hinek suwar li Corava mabûn, hinek jî derbasê Kalo bûbûn. Li gundê Elîkulekan, Qulo ji şeşsed esker re rêberî dike, li ser Coravan de digirin. Kurdmancê ko li Kalo mabûn ew jî xwe digehînin şer, heya êvarê şer dikin. Şeş esker hatibûn kuştin. Kurdmanc jî bi silamêti ji

tarîya şevê dest ji şer digrin. Ji wêderê derbasê Çiyayê Mêrgemîrê dibin.

Ji wê vedigerin Çiyayê Bexdanê, di Kotekan re derbasê Adakendê [Adeken-dê] dibin. Ji wê talê li Firêr [Mûrad] diqelibin. Di Çiyayê Qetewîne re, di Pat-nosê re derbasê Eledaxê dibin.

Çiqas ko heya hir bi fikra derbasbûna Araratê diçin jî li ser îsrara Seyid-xan, jibo vegera Sûriyê, di Sivêsor re, di nav Hêderan [Heyderan] re tèn Geli-yê. Li wir tèn Şêbowê Kêrsê, Çiyayê Seyda Qazanan, Têlê re tèn Xaça Reş. Li wir çil Kurdmanc mabûn.

Li wir tèn Xerzan, Çiyayê Sobeserê eşîra Şêxkan, di Ava Batmanê re tèn nav Silîvan cem Hisênê Hecî Sadon Axa. Ji wir tèn Malgirê, cem Şêx Fexrî. Kêfa wan ji Şêx Fexrî re naye, ditirsin ko bêbextiyê li wan bike. Di Derê Kur re dibuhirin, li wêderê Emînê Perîxanê, Rizo bi zilamên xwe ve tev esker pê-şîya Kurdan girtibûn, li hev dabûn; ji eskerên Romî zabitek, çar mêr hatibûn kuştin. Ji Kurdan kurê Êsîf Axa, Tewfîq li difnên xwe birîn bûbûn. Îmkana derbasbûna tixûbê Sûriyê nedîtibûn. Dîsan bi şûn de vegeriya bûn, di bin gundê Malgirê re li Ava Batmanê qelibûn derbasê nava eşîra Hevêdan bû-bûn, çûbûn gundê Dûdêran nik Şêx Mihemed. Gelek qencî û camêrî jê dîtî-bûn.

Ji wir çû[bû]n nik Xiyan cem Emerê Mihê. Li wir Emer, Şêx Mihemed, Hi-sênê Hecî Sadon evên ha derbasê Talorê kiribûn. Jibo ko berî wê eskerê Tîr-ko doralîyê Talorê standibûn, jibona ko xirabîya ehalî nebe, hespên xwe tes-lîmê ehalî [kiribûn] û xwestibûn evê zivistanê li Talorê bibuhêrin. Heya ko li Talorê mabûn Emerê Mihê, Şêx Mihemed, Hisênê Hecî Sadon xwarin û vex-warina wan bi tevayî li xwe girtibûn. Temamê zivistanê bê şer û deng buhar-tibûn. Serê buharê de derbasê Xaça Reş bûbûn. Li ber Ava Reş di kelekê re bihurîbûn çûbûn gundê Zoravayê. Gundî xeber dabû hikûmatê. Kurdmanc jî bi şevê derbasê Çiyayê Seydayê bûbûn. Esker xwe negiha[n]dibû. Li Çiyayê Seyda, Kanîçûkê, di Koxagê re derbasê Çiyayê Bilêcanê bûbûn. Panzdeh rû-jan li wir mabûn. Wê çaxê ji gundê Melakendê, Şêx Kamil, Faris, Şîkrî jibo ko çeta hukûmetê bûn xwestibûn li Kurdan xin. Ewan jî di Nazûkê re derba-sê Xidiran bûbûn. Li Xidiran mixbîrê hukûmetê Mehmûdê Rîqer bi kurê xwe ve kuştibûn. Hesp [û] tîfingên wan standi[bûn] û vegeriya bûn Bilêcanê (59). Li dora Şaqo sê (?) hesp standibûn, piştî heşt rûjan ji Ferêr (60) derbas bûbûn, çûbûn nav Cibran. Di bireka Anêrê re ji Ava Heftreng derbas bûbûn çû[bûn] cem Leledaxê. Di Qazgolê re, Çiyayê Torakan [Toraqan] re, Newala Gendelê re çûbûn Kûça [Qûça] Reş.

Berî wê li gundê Elîkulekan, bi ser Qulo de girtibûn ko îxbarîya wan kiri-bûn, kuştibûn, mala wî şewitandibûn; vegeriya bûn Çiyayê Altûntehtê Qere-

yazîyê, Girê Keçel, Kevirê, Lele Hesên Paşa, di Bihurê Reş re li Ava Firêt (61) qelibûn. Li hinda Qetewînê, leqayî Mûsa Begê ko mixbîrê hikûmatê bû hatibûn. Şerekî baş çêbûn. Mûsa Beg, Mehmûd Beg, Sidîq Efendî bi sê xwila-mên wan ve hatibûn kuştin, 24 suwarên mayîn hêşîr kiribûn, hesp [û] tiffin-gên wan ji wan standibûn, derbasê Çiyayê Qetewînê bûn.

Piştî sê rûjan li Pîlwerê li mifreza (62) Fewzî Begî rasthatibûn. Heya saet dudowê şevê li hev dabûn, du hespên Kurdmancan birîndar bûn. Bi gotina ehalî ji Tirko pênc mêr, başçawişek hatibûn kuştin. Wê şevê derbasê Çiyayê Qulingo bûn. Alagezê Çiyayê Qazanan sê rûjan mabûn. Di Resûlan re, Çiyayê Seyda re, binîya Mûşê re li Ava Reş raperîya bûn. Qizilaxacê Zengûkê [Zengokê], nava Badikan re navbera Mûşê û Licê, çiyayê Gêncê re çûbûn nik Osman Begê Dumilî. Pênc rûjan li wir mabûn. Derbasê Zozanê Şerevdînan bûn. Du şevan li Bîngolê mabûn. Li wir derbasê Şûşarê bûn. Di Çiyayê Hêsanên de bi Çarekan re li hev dabûn, hesp û mêrekî wan hatibûn kuştin, heşt hespên wan standibûn.

Ji wir derbasê Tekmanê bûn. Jê çû[bû]n ...(63) Ji Ava Reş derbas bûn, hatibûn Yekmalê, Tehterewanê, Tîrnegolê, Qeretaşê, Qerecixê, Saricixê, Pîrhisênê, Alagozê, Xosrê, Gazîcelalê [Qazîcelalê?]. Li wir leqayî mifrezekê heftî eskerî hatibûn. Wê rûjê li hev dabûn. Wê şevê berî sibê Deştê Pasînê de pêşiya esker biribûn, rev lêdabûn (64), 12 mêr û milazimek ji eskerê Tirko hatibûn kuştin, 12 hesp ji wan standibûn (65).

- IV -

[Ji devê] Silêman kurê Elî mala Seydo, emrê wî 32 [salî, hatiye nivîsîn].

Em hatin, berbang bû, Seyidxan ji min re got “here Qewsan”. Hatim perê gund. Merifên me di gund de hebûn. Seyidxan digot “em westiyane, ji me re misade bikin heya êvarê li vir em bisekinin”.

Ez û Sidîq em çûn nava gund. Esker hatibû gund. Qereqolê wî em dîtin, em sekinîn, denyn [deng] nekirin. Min deyn kir: “Sen kimsin?” Gotin: “Ben eskerim.” Me devê hespê xwe xist em zivirîn. Ewî jî tu teqîn çênekir.

Em zivirîn hatin cem Seyidxan. Seyidxan tevê suwaran li perê gund sekinîbû. Me got “em bajon, esker di gun de heye”. Li wê ez bi rê beled bûm (66),

min da pêşiya wan ez hatim hidûdê Cilîn. Erdê wî bi kevir û çiya ye. Em hatin, zevî hebû, me hespên xwe li ser berdan. Sê rûjan em bi şevxwîn (67) hatibûn, xewa me jî pir dihat. Seyidxan ji me re [got] “serê xwe dayînin rakevin”. Em ... (68), tevayî em raketin, Seyidxan bi tinê ma. Tîrs di zike min de hebû, ez ji xewê zû hişyar bûm. Min hêz da (69) ser xwe, ez rabûm. Seyidxan di girekî de, dûrbîna wî li ber çavên wî ye, dineyire [dinihêre]. Ez çûm balê, min jê re got “tu jî were, serê xwe dayîne, hinikî xewa xwe hilîne” (70). Ez mam li wir, ew jor de hat cem suwaran, hingê ew jî raket. Ji min re got “zehf mesekinin, [piştî] nîv saetê werin me rakin”.

Ez jor de nîv saetê sekinîm, hatim cem wan. Min ew hişyar kirin, em tevayî rabûn, me hespên xwe girtin, me tengên wan şidandin, em suwar bûn. Em hatin derbas bûn paş Cilînê. Li wêderê em şarge bûn, sekinîn heya nîvro. Paşê, nîvro em hatin ser avekê, em çûn cem palan. Em tî bûn, me av ji wan xwest. Av jî, kanî û çem tunebûn, avê[n] wan [di] sarincê[n] kevir [de] bûn. Dan pêşiya me, em anîn ser sarincê. Em jî pir tî bûbûn. Me têr av vexwar, îcar me hespên xwe avdan. Bi satilan me dikişand, av dida. Em pir derengî bûn ser bîrê. Paşê me dît deh suwar esker hatin. Em jî nîvê me cilê Kurdmançî, nîvê me cilê eskerî [li me] bû. Herçi cilê Kurdmançî [lê bû] me xwe veşart, herçi çekê eskerî lê bû ew sekinîn. Esker jêlî (71) hat, gazî kir got “hun kî nin?” Me got “em esker in”. Jêlî ew hatin, neh hebên wî li jêr sekinîn, çawîşê wan hat jor.

Paşê ko hat jor, fehm kir ko em ne esker in. Ji par re zivirî, em tevayî rabûn, me aliwek tifeng lêxist, me got “teslîm!” Teslîm nebûn, hespên xwe hiştin revîn. Me berda wan, me tamam girtin. Me anîn, hatin, [me] tifing û hespên wan standin, paşê me berdan. Em ji cem wan suwar bûn, bi rê ketin. Me qesda wî alîyî kir. [Em] neh-deh deqe ji wan dûr ketin, esker li me qelibî. Me û esker li wir me li hev xist. Me qesda wî alî dîkir, me şer dîkir û ji ber dikişîyan. Em pêş de dihatin, ew jî hey kêlek ji me distand pêşiya me bizivirînê. Me jî ew firsend nedidayê, [me] hem şer dîkir hem nedihîşt bikevin pêşiya me.

Em ji erdê Cilîn derketin, em ketin erdê Dêrbiguz, orta Dê[r]biguz [û] Şivistan. Li wêderê suwarê[n] me nîvî pêş de çûn, diyarek girtin, nîvê wî jî li mihefeza wan sekinîbûn. Ev tenê suwarên mihafezê bûn. Me jî hey li wan xist heta suwarên me çûn cihên xwe girtin. Suwarên me çûn cihên xwe girtin, li wan zivirîn û li wan xistin. Paşê em rabûn me qesda wan kir [da ku] em herin şûna wan, ew jî pêş de herin dîsan. Cihê me dihar bû. Em jor de derberjêr bûn, me xwe jor de berda newalê. Em jêlî qîyamê bûn, li nîvê qîyamê tomatîk ji tenîşt ve li me girêdan, li min xistin. Ez neketim. Min ajot, ez derke-

tim cem hevalên xwe. Birînên min li wê sar bûn û xwîna wan pir hat, ez li wir ketim. (Birîn di sînga wî de bû. Ji par re avêtibû.-Celadet Alî Bedirxan)

Hespê min anîn, ez suwar kirim; lêxistin hespê min jî ket di binê min de. Min nikaribû ez suwar bibim û min ji wan re got “hun herin, ez hey mirî me, bira li we nexin”. Ewan got “em terka te nakin”. Min sûnd xwar: “Ez nayim, hûn herin.”

Ewan terka min kirin. Ew jor de der berjêr bûn, hatin çem. Ez mam li wêderê. Paşê min got “wan Tirkana bên ser min, hemin ez mirî me, feqet ew bên min bi cizaret (72) bikujin.” Paşê min hêz da xwe, ez rabûm ser xwe, Xwedê teala were hez kir, çokên min şidiyan. Hinekî qidûm hat ber min, ez rabûm min jor de qesda hevalên xwe kir. Ewan li jêr ez dîtîm ko ez rabûm, Evdilhemîd gazî kir got “Tewfîq, Silêman hat!” Ew li hêviya min sekinîn li wir, heta min xwe gihand cem wan. Êdî ez tî bûbûm. Min av xwest. Evdilhemîd bi şefqê xwe av da min. Anîn dîsan ez suwar kirim, dîsan hespê min hat kuştin. Ez jî pir aciz bûm, min gelek li wan lava kir, min got “ez nikarim bêm”. Esker jî pir bû. Qiweta (73) wî pir bû. Şer giran bû. Ew jî bêmkî bûn, paşê ji ser min çûn. Ew çûn, ez rabûm. Cih dar bû, mêşe bû, min xwe di nava bûtekî (74) de, di devê avê de min xwe veşart.

Paşê esker hat. Esker ez dîtîbûm, li min digeriyan. Heta hatin di ber min re, yanî min darê xwe dirêj bikira digehîştê. Min xwe berda nav avê. Hez kirina Xwedê pê tunebû (75), ez nedîtîm. Heta êvarê li min geriyan, ez nedîtîm. Kurdmancekî dengê wî hat. Dengê wî de min dît dengê jinekê jî pê re tê. Ez rabûm, min [got] çere hebê evêha Kurdmanc e, ezê xwe pê bihesnîm, [ewê] min ji wir derîne. Ez rabûm derketim ji cihê xwe, min gazî wî kir. Bi jin û kerê xwe diçû aş. Min gazîê kirê, li min fetilî. Lê nêrî, ez birîndar im, xwîn bi min ve heye, fehm kir. Got “xwe veşêre, ezê bêm cem te”. Ez hatim cihê xwe runîştîm. Paşê ew hate cem min. Min gelek lê lava kir ko min ji wê derîne. Ewî got “wilo nabe, bira tarî bikeve erdê, paşê ezê bêm te bibim”. Li cem min sekinî, kosteka saeta min dît, ji min re go: “Ev çi ye di bêrîya [bêrîka] te de? Ka saeta xwe bide min.” Min saeta xwe dayê. Ji min pirsî: “Pereyê te he-ne?” Qederê deh-panzdeh mecîdî bi min re hebû. Go “saet ji min re ye, pere jî bidime yekî din, em bên te bibin”. Min dizanibû derewan dikê lê ez mec-bûr bûm. Min dayê. Ew çû, min gelek çavênîya wî kir, heta eşayê dereng ne-hat. Paşê ez rabûm, min go “ez hêj li ser xwe me, cihê xwe bigohêzim, dibe esker sibê bê, bira min nebînê”.

Ez ji wêderê derketim, avarê [êvarê] ez hatim diharekî qederê nîv saetê, min dîsa xwe berda ser çem. Ez hatim, li jor min ji xwe re şarge dît, ez ketim, tê de ji xwe re sekinîm. Paşê merif pir dihatin-diçûn lê emnîyeta min bi wan

nedihat. Min kes bi xwe nehesand. Paşê êdî ez canekar bûm, êdî teqîna dara (?) dihatin min (deh rûj hebûn derbas bû[bû]n). Ez rabûm, min got ez tîm kuştin bira, ez çûm nik wan, du heb sofî bûn. Lawikekî bê rih û simbêl jî nik wan bû. Yek jî şêx bû. Ewên Kurdmanc hatin pêşîya min, li ser min giriyan, evê şêx qebûl nekir, got “bira meyê nik me”. Êvar bû, ewan du mirovan pir lê lava kirin, gotin “em Kurdmanc in, eşîr in; şerm e, divê em wî bihewînin”. Ewê ha got “ev ko bisekine ezê elam bidim qereqolê”. Min bêminet kir, min got “hemin ez mirî me, hema here ciwabê bide”.

Nan ji xwe re çêkiribûn, anîn navê danîn, êdî ji ... (76) nexwarin, min jî nexwar, bi min de neçû. Ewan jî ciwaba hev dan. Şêx çû erzelê raket. Wî lawikî qatek lihêfa wî hebû, avêt binê min, li ber agir. Ez ji xwe re vezeliyam. Kevroşkek girtibûn, ewan jî nexwar, ma li wêderê. Em ji xwe re raketin heta sibê. Sibê berbangê lêxist, rabûn ez birim xistim nav bûtekî tirîreş, ez tê de mam heta êvarê. Sewlê xwe tijî av kirin danîn ba min. Ez mam li wir heta êvarê. Êvarê her du rabûn dan pêşîya min, ez anîm cihê min ê berî.

Ez li wê sekinîm, ew çûn cihê xwe. Min lava kir, ji min re her rûj sewlêkî ava sar bînin, şêx nehişt, lawik bi dizî anî. Paş wî ez mecbûr bûm, şivan dihatin, pezê xwe li ser avê dixistin. Sofiyekî şivan hebû, min gazî wî kir, sofî hate cem min. Got “te çi divê, tu kî yî?” Ê min, halê xwe jê re mijûl bûm. Sofî bi ser min de giriya. Ji min re got “tu birçî ninî?” Min got “bele”. Rabû çû ji min re kodek şîr dot ani. Hat, nan deranî, min xwar. Min got “her rûj we re nik min”. Got “ser çavê min”.

Her rûj dihat, rûjê kodekî şîr û nanekî dida min. Paşê lawikek xwedanê keriyekî din hat. Ez rabûm min gazî wî jî kir. Lawik ji sofî pirtir ser min de giriya. Di mihacirî de li wî welatî mabûm, min kundirê wan bi pîvaz û îsot û tişt çêdikirin. Paş[ê] ket bîra min, dilê min xwest, min ji lawik re got, got “ser çavê min, sibê ez ji te re bînim”, pezê xwe rakir çû. Ma sibê, di wextê nîvro de min dît dîsan hat. Xwarin ji min re anîbû û min xwar hêdî hêdî heta êvarê. Lawik lexist çû. Ser wî kundirî îşteha min vebû (77). Her rûj şivan dihatin, kodek şîr û nanek didan min. Rûjên min bûbûn 14-15.

Cihê min nimz bû, rê serdest bû, min çûn û hatina mirovan didît, ewan ez nedidîtim. Sofiyekî derbas bû, jina wî pê re bû. Heywanekî barkirî pê re bû. Rabû min gazî kirî ê, rabûn her du hatin cem min. Li halekî xirab de ez dîtim, zehf ber min ketin. Ji min pirsîn: “Tu çi dixwazî?” Min mehîr xwest. Tavil jina xwe şand ko bîneê. Çekên min ji min xwestin ko buşûn, min got “berdêla wî ba min nîne”. Her du rabûn çûn.

Paş du saetan her du jî hatin. Satileke tijî girar anîn. Firaqekî jî nanê sêlê,

rûn berdabûn ser. Min girara xwe giştik xwar. Tirş bû, dilê min pê rehet bû. Ew rabûn çûn.

Roja piştî wê, ez di cihê xwe de bûm. Gelek rûjan şivan nedihatin, ez birçî dimam. [Ez] sekinîm, min çavniherî kir, şivan nehatin. Bû mexreb. Paşê min dît dengê hat, ez rabûm, min lê nihêrî, xortek bû. Min gazî kir, hate cem min. Min jê pirsî, li ser rê dixebitî. Ji min re got “bavê min hekîm e, bira bi-sekine heta eşayê, ezê bêm te bibim mala xwe dayînim (78)”. Min zanibû zehmet e, min jê re got “ji min re bacanê sor bîne”. Çû ji min re ani lê êdî bi ser min de hat.

Paşê, gundekî nîzing hebû, di mihacirîyê de mala min tê de mabû. Mala Hecî Mihemed digotin, qesra wan nîzik (79) bû. Çemê ko ez tê de bûm, ew darê wan bû, darên wî dabûn yekî Mêrdînî. Kurê Hecî bi Mêrdînî re hatibû dar jê re nîşan bide. Hatin devê avê. Yek[î] ez dîtîm, bi dizî ji min re got “xwe veşêre, metirse”. Halê xwe min jê re got. Mêrdînî nesekinî, ev mirov û brayê wê li êlaxê, pazê [pezê] wî hebûn. Çû cem brayê xwe. Ji birayê (80) xwe re mesela min mijûl bûbû; birayê wî û du mirov ji Meşkîniyan, yek Hîsên û [yê din] Hemo, her sê hatin, ez anîm mala xwe, nav êle. Holekê ji min re vala kirin, ez danîm holê.

Ji min re berxekî serjê kirin, Kurdanîya xwe temam anîn navê. Du rûjan ez li wir mam. Paşê esker ji Mêrdînê hat, cîranên wan tirsîyan, ser mêrik de polûpol kirin; bi wan sê mirovên ko ez anîbûm, di piştî holê de şewir dikirin. Min gazî wan kir û ji wan re got: “Ez ji xwe mirî me, min navê ji rûwê min hûn bikevin agirê; cihekî minasib peyda bikin, min têkin tede.” Ewan jî gotin: “Şikeftê (81) heye, emê te bibin li şikeftê de dayînin heta em mirovan bibîn[in] te bibin.”

Berbangê, Heseno digel hevalên xwe hat, dewarek anîn; ji min re nan, se-wîlekî av û kêsekî qatix [anîn], ez anîm di şikeftê de danîm.

Ez wê şêvê mam li wir, wê rûjê birûj jî heta êvarê mam. Êvarê eşayê min dît li devê şikeftê gazi li min kirin. Min dengê wî nas kir, Hiseyno bû. Ez derketim, min nihêrî çûyê Zinarê, ciwab dayiyê, Silêman ji mala Şêx Bêzarî, ew jî tavi suwar bûye, pê re hatiye. Li wêderê ez suwar kirim hespê xwe, me ji ên din xatir xwest.

Silêman ez anîm mala xwe. Sê rûjan ez li mala wî mam. Rûja sisêya (82) êvarê ez suwar kirim, peyatî da pêşîya min, em hatin ser Cada Mêrdînê. Qullig [qullix] hebû wêderê. Di wextê mexrebê de dewrîya wî li me rast hat. Silêman nedîtibû, min dît. Du heb peya hatin, em dîtîn rûniştin. Min Silêman re go “peya li pêşîya me hene”. Silêman nedîtî, gazî li wan kir, gotin “ben esker, werin derbas bin”. Silêman got (83) “hûn herin bi rêya xwe de, em na-

yin”. Rabûn çûn gehîştin hev, bûn pênc-şes heb, zivirîn hatin me. Ewan û Silêman li hev xistin. Dîsan ez û Silêman zivirîn çûne mala wî. Kerwanê Zinarî dihatin Bin Xetê. Silêman, Ferhan û du pismamên wan bi tifingan ez suwar kirim, ez anîm heta Qerewanê.

Ez li Qerewanê anîm li mala Kurdm[an]cekî navê wî Hemo bû; ez li mala Hemo danîm. Jê çûn Dehlikê, ciwab dan, Bedrî Beg li wir bû.

Sibetir Bedrî Beg hat. Serê sibê Bedrî Beg hat nik min. Otomobîl bi dest neket, du rûjan li wêderê mam, rûja sisêyan ez suwar kirim anîm Hesîçê (84).

(49) Celadet Alî Bedîrxan evder vala hîştîye, yanê navê malbatê nenivîsiye. (M. M.)

(50) Jî Osman Axayê Mirdêsî mebest Osman Sebrî yê nivîskar û şair e. (M. M.)

(51) Celadet Alî Bedîrxan li pêşîya vê kelîmê kelîma “koçerî” nivîsiye lê paşê li ser wê xêzek kîşandîye û îptal kirîye. (M. M.)

(52) hîlbeşandîn/hîlweşandîn

(53) semer: bir yuz

du semer, sê semer

sed suwarek: bir yûz suvarî

(54) Lî jorê, ev kelîmê wîsa hatibû nivîsîn: başçewîş. (M. M.)

(55) Lî gor agahdarîyên ku Elî Zerdest dide ev Fesîh, bî navê Fesîhê Mihê Mîrze, Fesîhê Hesênî yan jî Fesîhê Mûşî tê nasîn û di sala 1987’an de çûye rehmet.

(56) hîlbîşandîn/hîlweşandîn

(57) Lî jorê, ev nav wîsa hatibû nivîsîn: Elûcar. (M. M.)

(58) Lî jorê, ev kelîmê wîsa hatibû nivîsîn: dwanzdeh. (M. M.)

(59) Dî vî rûpelê nivîsa Celadet de ev not heye lê baş nehat xwendin: “Esmâ-ı hass ... olarak nehir isimleri “robar” ve “çem” ... muzekkerdîrler.” (M. M.)

(60) Xûya ye ku bî şaşî Ferêr hatîye nivîsîn, dîvê Mûrad bûya. (M. M.)

(61) Xûya ye ku bî şaşî Firêr hatîye nivîsîn, dîvê Mûrad bûya. (M. M.)

(62) mîfrîze (m).

Lî vir bî herfa m, Celadet Alî Bedîrxan xwestîye nîşan bide ku ev kelîmê (mîfrîze) mê ye (fêminî e). (M. M.)

(63) Lî vir kelîmêyek nehat xwendin. (M. M.)

(64) rev lêdan: bozguna uğratmak

(65) Dî destnivîsa Celadet Alî Bedîrxan de ev nivîs evqas e lê tê fêmkirin ku Celadet xwestîye dewama wê paşê binivîsê. Loma jî wî, di deftera xwe de, piştî vî rûpelî heft rûpel bînivîs hîştine. (M. M.)

(66) beled bûn

(67) şevxwîn

(68) Lî vir du kelîmê nehatin xwendin. (M. M.)

(69) hêz dan/[min hêz da xwe]: hareket ettim, yukarı doğru kalktım

(70) Dî vî rûpelê nivîsa Celadet de ev not heye:

“Ewê ha ne mîna rêzika welatê me ye.”

“Fîlan rêzika bavê xwe neajot.”

(71) jêlî: jêr ve

(72) cîzaret: ezîyet

(73) qîwet: quwwet

(74) bûte-k = kem (?): nehir kenarındaki küçük ağaç ...

- (75)pê tunebû: yanî bi wê tunebû
 (76)Lı vır kelîmeyer nehat xwendin. (M. M.)
 (77)madê min lê vebû
 (78)danîn/dane, datînın, dayînın
 (79)Li jorê, ev kelîme wisa hatibû nivîsîn: nîzing. (M. M.)
 (80)Li jorê, ev kelîme wisa hatibû nivîsîn: brayê. (M. M.)
 (81)Celadet Alî Bedirxan li ser vê kelîmeyê wisa nivîsandiye: (m).
 Yanî Celadet xwestiye nîşan bide ku ev kelîme (şikêft) mê ye (fêminin e). (M. M.)
 (82)Celadet Alî Bedirxan, li kêleka vê gotinê wisa nivîsandiye: Ferhan. (M. M.)
 (83)Li jorê, ev kelîme carna wisa hatibû nivîsîn: go. (M. M.)
 (84)Li kêleka hın rûpelan Celadet Alî Bedirxan hın gotin nivîsandine ku têkiliya wan bi vê nivîsê re tune. Ez wan jî li gor rêza elfabeyê dînivîsim. (M. M.)

avzê/avzê: av jê dizê

berdest kirin: derdest etmek. Emr dabûn filankes xweş mırî berdest bikin.

gîhayê wî bor dibe: feyzî (?) olmak. Zevîyê filankesî bor bûye ketiye.

em ne di bin darê wan de bûn

mın şîr fir kir

karaz (n): büyük kup

Lı vır bi herfa n, Celadet Alî Bedirxan xwestiye nîşan bide ku ev kelîme (karaz) nêr (masculin)
 e. (M. M.)

te neheqî li xwe kiriye

pirût: kup yapan usta

tomast

weza/goştê weza: etin zayıf olması

xizîn: boğultulu (?) ses

xwîl: mail

STRANEK LI SER SEYIDXANÊ KERR

SEYIDXANÊ KERR °

Derê wî axawo, axawo, axawo, wîî axawooo
Êla bavê bavê mino sehera sibê ye
û ezê bi diyarê tayê Taloriyê Kevirê Kelereşê
Kêşa Newala Seyida ketim
sibe ye ji xema dilê min û te ra wa ma li ger e.
Na, na wele ez vê sibê bala xwe didimê
mi dî celebê siwara ji jor da derketine tên
siwarê pêşî tim û daîm namluya tîfinga xwe dajo ji pê re.
Bi lexema kurmanciyê ji vî siwarî ra dibêjin:
"Bexê Mala Ûsivê Seydo, Seyidxanê Kerr e".
Lê şahde w şûdê vî xweşmêrî li dinyayê gelek hene;
Roja şer û oxilmê giran bi sonda qesemê
li orta meydanê mêra dikuje
nahêle kesek di kozika xwe de tevbigerel!

Mi dî Seyidxan bi sê denga fikir gazî digo:
– Lo lawo Sidîqê lawê Mistefa Begê
emî mahkûm û firar in, barê me qaçax e
ji bona Xwedê wele vêga berê me li xeta Firinsawê
eman destê min ê li dawa te be
destê te li dawa Pêxember be
lo lawo li vî welatê Serhedê
tu yê qîsr û qusûrê li me nekî
de tu yê pêşîka firyarê me berdî
lo bira paşîya qaçaxê me hereewûûû

Sidîqê lawê Mistefa Begê
li bexê mala Ûsivê Seydo
bi sê denga fikir gazî digo:
– Lo lawo Seyidxanooo
wele nabî, bi sî cizû Quran nabî
bi Şêx Badînê erda Lulûkê
bi sedmalê gola Nazûkê
bi ziyareta Qolîbaba kim nabî

Minê sond xwarî bi sonda telaqê cot-cot xanima
Îro cotê xanima
wele qaçax û firarê mala Ûsivê Seydo
bê qetl û qtûl di ser mi ra, hey looo derbas nabîî

Gidî wî axawo, axowo, axawo, wî axawooo
Êla bavê bavê mino, sahira sibê ye
û ezê bi diyarê tayê Taloriyê Kevirê Kelereşê
Kêşa Newala Seyida ketim
sibe ye ji xema dilê min û te ra wa bi çem û kanî
Seyidxan bi sê denga fikir gazî digo:
Lo looo Teyfîqo, Silhedîn, Elîcan û Ferzende
hûnê beşera çavê bavê min in
ji mêra mêrê çê bin
hûnê destê xwe bavên qevdê mîratê modeliya
lê mîna carîcaran bi hevdu ra lêxin bi mêranîî
Na, na wele ji Xwedayê min da aza û bi hêsirî
me kir nekîr bi hêvila mekana me xwe ji destê
begler û axayên vî welatî xwe dernanîî
Lo looo Teyfîqo lo bira
serê vê sibê li orta meydanê
ji kuştina Sidîqê lawê Mistefa ra
hay looo, car tu çawan îî?
Wele dibê hê gotin di devê va ya nava xweşmêra
destê xwe avête baxê mîrata fişeka, pakêta xwe deranî
li devê darê qesra Hecî Mûsa Begê qelp bû
ji canibê Xwedê ra mîratê derba xwe hilnanî
Bexê mala Ûsivê Seydo li orta meydanê
derbekî li eniya wî danî
qapaxa serê wî bi carek hilanî
Bi sê denga fikir gazî digot:
Keko helhêl!
Ez bavê te me, gula mala Ûsivê Seydo me
şehde w şûdê min li dinyayê gelek hene
em daîma mêra li orta meydanê dikujin
hey looo, ca bi mêranîîîwwwuuuu...

• Ev stran ji pirtûka Zeynelabidîn Zinar, *Xwençe*, cild 2, r.57- 59-an hatiye girtin.

DENGÊ DIHOLÊ

Gava ez hatim min Ewrûpa dît
Xudê dizane ruhê min êşî

Gerîyam li gelek şûn û waran ez
Dakû peyda kim avêşên merez

Avêşên derd û kulên jîyanê
Jîna bendestî ya li Kurdistanê

Bo dermanê çûme ba Kurdan
Da ji wan re bêjim ez kul û derdan

Çûme komel û kom û civînan
Da ku ji wan re vekim baxçekî birînan

Gava min dîtî komel û civîn
Xudê dizane dil bû gola xwin

Ewak min pêşda dida ber çavan
Ya ku min dixwast bi dil û hinavan

Hemû wek xewnê payîzê virr bûn
Ji dilê min re debayê dirr bûn

Ceger peritî dil birîndar bû
Hinav hilhilî, mêjî zamar bû

Li Kurdistanê zimanê Kurdî
Dujmin berhemd kir zor bi nemerdi

Vira jî komên me yên ramîyarî
Dujmin re dîkin ew arîkarî

Nanê xwe dixwin li nav Kurdan
Avê vedixwin ser deravê Kurdan

Lê bi Tirkî wan gel hev gep dikin
Serê xwe ji hevr re Turki rep dikin

Pirtûk, belevok, rojname, kovar
Bi navê Kurdên belengaz, hejar

Lê bi ferheng û zimanê dujmin
Diweşînin ew ax bavo li min

Min pêşta digot Kurdên me yên li vir
Ronak in hemû serî, tijî, pîrr

Hemû kurdhez in, Kurdî dixwazin
Kurdî dixwînin bo Kurdan miraz in

Kurdî dipeyîvin, bi zimanê dê
Ji bo Kurdistanê ew didin bacê

Mirazê wana Kurd e, Kurdistan
Ji bo welêt didin rûh û can

Lê gava min dî hemû derew bûn
Hemû mirazim hewekî xew bûn

Min dît gişt vala wekî peqavê
Li dû Kurd ketine nêçîr û ravê

Ew gişt komelên bi deng û bi nav
Yên ku navê wan li dinê belav

Min dît dilê min navda herriî
Rûh û giyanê min tevda qerrîî

Min dît sosretên giran li çavan
Ar û pêt kete hundurr hinavan
Gişt xeber didin bi zimanê dujmin
Dibêjî bûne ajanê dijmin

Dujmin dixwaze vî kar û barî
Ewan jî dîkin ax! arîkarî

Ewan jî alî neyaran dîkin
Zimanê Kurdî topbaran dîkin

Ez gelek şaş mam li wê dema han
Min got ku belkî zivîrîye dewran

Yan jî ku gelo min xwe şaş kirî
Hişê xwe yê kêr min belaş kirî

Li dewsa herim komelên Kurdî
Şaşî hatime ez bo vî erdî

Lê tablo rast bû, nav navê Kurdan
"Navî giran e, bajarî wêran"

Min zeft neanî, ew xeber pirsî
Bi lerr û ricaf bi gelek tirsî

Min go hevalno! li min biborîn
Derdê dilê min gelek û zor in

Ez hatime vir Kurdan bibînim
Bi dîtina wan giyan biwejinim

Nehatime ku Tirkî guhdar kim
Ruhê xwe jarî pirr birîndar kim

Ez nabêjim ku Tirkî nebaş e
Ew ji Turkan re gelekî xweş e

Tirkî ji Turkan re, Kurdî ji Kurdan re
Her Kurdî maye ji Kurdistan re
Bo her gelekî zimanek heye
Ziman tune be gel jî tune ye

Zimanê Kurdan ma ne Kurdî ye?
We doza mezin ji bîr kirîye

Zimanê Kurdî pênasê gel e
We bo bêrêz kir weha sergele?

Wan hevalan bersîva min dan
Bi bersîva wan ser bû hêlikan

Bersîv ev bû hûn jî guhdar bikin
Derdan li serî derdên xwe bar kin:

"Tabî efendîm buradîr dernek
Kurdler dernekî bûdir bê henek

Bura en bûyûk dernekimizdir
Hep siyasallar şurada gezer"

Burasi merkeza çanda Kurdandir
Okumadin mi tablasî nedir?

Hindî min kurt got wana dirêj kir
Serê minî pûç ewana gêj kir

Li erd û esman destê min qetîyan
Nikarim rabim ez li ser pîyan

"Hem ji dêrê bûm hem ji arakê"
Li serê xwe kim ezê çî xakê?

Wan dîlsar kirim ji hemû derdan
Lewra ez bûme îro "DILBIJAN"

Çi rast gotine xebera geş e
"Dengê diholê li dûr ve xweş e"

DILBIJAN

RASTKIRIN

Di hejmara 4. a Çirayê de, di şî'ra Dilbijan de (r. 62) du şaşiyên çapê hebûn, li ser agahdarkirina Dilbijan, em digel rastiya wan dinivîsin:

Şaş: "Zivistan bû li Kurdistanê"

Rast: "Zivistan bû li Kurdistan"

Şaş: "Ji jaran ra kîn, nîfrîn û le'net bû."

Rast: "Ji jaran ra bi kîn, nîfrîn û le'net bû."

Gozêre

SERDAR ROŞAN

- 4 -

Heskerdiş, Rindî û Zilm

Eyro zî Dîkê Kê Hecî Silêmanê şaşikçewtî hame û min ver ro derbas bi, şî miyanê erdê xu. Şima go vacê eno çi yo, ma we bira(rasta) dîk o, yan ti ana vanê?

Belê, verê ku ez Dîkî bidî naskerdiş, lazim o ez bi şaşikçewtiya Hecî Silêmanî dest pa bikerî. Di dewa ma de çend hebî hecî bi namey Silêmanî bî; û dewican îne hergû yewî rê leqamêke peyda kerdbi. Ena rey verê ku Hecî şaşike çewt bido serey xu ser, hergû hewe weş şaşêke girêdayne û bi usûlêkew weş nayne serey xu ser. Wexto ku rocêke Çawîşê qereqole, di miyanê dewe de geyrayne û di verê dikanê Ristemî de -dewicî ge-ge ûca kom bîne- dewican ra va “Ez nêzana, eno bi çend serrî ku Serekkomarê ma yê nêmerdey înkîlab kerd û cil û belgî bedelnay. Ka min rê vacê, şima çirê hema zî enî şaşikan û kelan danê serey xu ser? Erdîşa xu zey bizan veredanê?” Hecî waşt vaco ku di barê îne de edet o, wexta ku ê benê pîrî şaşike yan zî kela danê serey xu ser, la hema vatişê Hecî nêqediyabi Çawîşî şaşika Hecî serey ê ra ante û este erd... Hecî vengê xu nêkerd. Şaşika xu erd ra darte we. Badê ku Çawîş şî, Hecî şaşika xu nay serey xu ser la ena rey rast nêkerde; şaşike serey Hecî ser o ver bi destê rastî çewt bî; cuwe ra wexta ku Hecî bi xu di cemaet de hazir nêbayne dewican tera vatine “şaşikçewt”.

Sebro û Fatê yewbînan ra bi zere û gan hes kerd. Welew ku Fatê ciniya viyaye bî zî, Sebroy goş nêda dewican; zey xu û bi zera xu kerd. Verê ku ê bi-zeweciyê, dewican yarî kerdêne, vatêne:

— Ero ti bi Homa kerê Sebro, ka vace to çi di ya viyay de diyo ku ti ana aşiq biyê, aqil di serey to de nêmendo, semedê qotêke cinî wexta ti bikewê çolan...

Sebro hewayne, destê xu berdêne serê serey xu, kelay xu dartêne we û vatêne:

— Ha şîma rê, ena kelay min reyêke tenê bidê serey xu ser û bi çîmanê min banîrê Fate ra, şîma go bivînê ka ya seyîn a. Bi Homay, bi Homay ne ena dewe de ne zî cayêkew bîn de yewa zey Fate ne esta ne zî bena. Hema xu qet aciz mekerê. Fatê yew tenya wa, tenya...

Sebro xortêkew êtîm û feqîr bi. Wexta des serre bi, zimistanêke hewrêskewt banê îne ser û kê îne di binê vewre de mend; heya dewican ê binê vewre ra vetî da û bay ê merdî. Dewican Sebro merg ra feletna. Di dewe de Sebro ewilî şî golikan ver û dimacû şîwaneyî kerde. Badê ku bi pîl hindî di miyanê erdanê xu de kar kardêne.

Erdîşipeyanê dewe rocêke qerar da û va lazim o ma Fatê û Sebroy bize-wecnê. Dewican hergû yewî bi gorê taqetê xu îne rê yardim kerd; veyveyê îne viraşt û “aşiqê dewe”, ay namdarî resnay yewbînan.

Heskerdişê Fate û Sebroy badê zewacî zî kemî nêbi. Sebroy ciniya xu ra zehf hes kerdêne û tim ya rê yardim kerdêne, nêverdayne ya karêkew giran bikero. Eh, de ena rey şîma vacê, ma di dewe de di halêkew anayîn de merdim fekê dewican ra feletêno?

Ê kê Hecî Silêmanê şaşîkçewtî zî çend kergî û dîkêke îne bî. Di dormarê banî de, di serê sergoy de wexto ku yê xu rê qut geyrayne, yê dîkî eger çîke bidîne hema nikulê xu dayne erd ro û bîne tix tixê yê, baskê xu erd ra kaş kerdêne; xu nepexnayne, veyndayne kergan; ew wer(qut) nêwerdêne dayne kergan. Cuwe ra zî wexta ku yew dewic bi ciniya xu wa girêdaye(beste) û merdey ciniya xu bibayne, dewican eno name nayne pa: Dîkê Kê Hecî Silêmanê şaşîkçewtî.

Dewican di binê verestiya min de semedê ronîştîşî sekû virašta. Kalê mehelaya nîzdî min yenê di serê sekûyan de nişenê ro û xu rê sohbet kenê.

Bê kalan yew yew rey Mela Ehmed û feqiyê xu hameyne di binê verestiya min de munaqêşe kerdêne an zî dersê xu di binê verestiya min de wendêne. Wendişê îne bi zîwanêkew xerîb, yanê bi Erebi û bi zîwanê dewa ma bi. Erebi mûsayne la dersê xu bi zîwano ku ez tera hes kena şerh kerdêne. Xeyrê kitabên dînî îne kitabê bînî zî wendêne. Mesala şîrê Melay Cizîrî, Feqiyê Teyran û Ehmedê Xanî wendêne. Kitabê Ehmedê Xanî “Nûbihara Biçûkan, Eqîda Îmanê” û her rey ku hameyne qismêke “Mem û Zîne” zî wendêne. Ez zî kewta miyanê meraqî, min vatêne, Homawo ti rehîrê îne etya ra fînê, ez bizanî ka çî bi serey Mem û Zîne hame.

Di miyanê feqîyanê Melay de xortêke bi namey Dilşadî bi. Xortêkew derg û çeleng bi. Vengê yê zehf weş bi. Wexta ku bi vengê xu yê weşî Mem û Zîne wendêne zera merdimî heliwayne. Ge-ge zera min zîz bîne, yew yew rey zî hêrs û heybetî ez girotêne. Labelê roco ku Dilşadî qismê şewa zîfafa Tajdîn û

Stî wende, ez bi asîman kewta; di erşê alay de geyrawa; perrawa... Min zere û gan ra waşt ku ez cay îne de bayne. Min vatêne, were bi ay aşiqan, were bi heskerdişê îne...

Dilşad kewtbi newyes serriya xu. Serrêke bî ku yo tenê nêbi. Binefşe keynay Mela Ehmedî dir zeweciyabi. Wendişê xu rew ra qedênabi. Eger semedê melayî bişîne dewêka bîne da û bay ê tenê mendêne; semed yê nêwaşt ku ê tenî bimanê, cuwe ra di barê îne de mend. Di dewa xu de, di serê erd û reza-nê xu de weş-xirab go îdarey xu bikerdêne.

Emsarr rezê îne baş bî; hinî mewî di binê giraniya weşanê engure de bibî çewtî. Ver bi şan bi. Hindî germayiya tîja rocî şikyaybî.

Binefşe di dewe de ay keynanê rindan ra yewe bî. Ya û Dilşadî wirdînan zî yewbînan ra hes kerd bi û zeweciyaybî. Enka ya û Dilşad di miyanê rezê xu yê binê Zinarê Hingan de geyrayne. Enî zinarî ça ra eno name giroto û zinarêkew seyîn o? Belê, zey çîyanê bînan meselay namey enî zinarî zî esta. Mevacê ke ser û binê ê heme zinarêke wo. Eno çî meqûl niyo, coka ez mecbûr a ez vacî ku eno zinar zinarêkew edetî niyo. Teyrê ku wazenê leyrekanê xu nefes ra bipawê şîne di nîmey enî zinarî de halîne xu virazenê. Zinarêke, zinarêkew berz. Tî des bananê ena dewa ma bidê pêser qasê yê berz nêbenê. Eno zinar seyîn ûca bi ca biyo û ana zeke bêro çiknayîş werişt o lîngan ser, Homa zano. Amnanêke, wexta ku hingan (mêsanê engemînî) şitil daynê, yê şitlan ra yew qefleyî şa rêbere xu dima, dewe ra veciyay, şî di nîmey yê zinarî de, di qulikêka zey karî de ca giroto. Yê rocî ra nata namey yê zinarî bi Zinarê Hingan.

Di kîşt a yewbînan de, di miyanê rêzanê (barananê) mewan de geh bîne vinî, geh serey îne eysayne; şiyayîş de gege hêtê îne ginayne pêro û Dilşadî nerme-ya hêtê Binefşe di ganê xu de hîs kerdêne. Yew yew rey bi hanyayîşêkew nerm û germ hanyayne yewbînan ra û reyra şîne. Binefşe kesekêke herî qelebyay; fek û rî ser kewte war; la semedo ku erdê miyanê rezî nerm bi ya nê-decay û bi hewayîş va “ay”. Di binê fistanê ya yê amnanî de hêtê ya bewlû bî. Dilşadî waşt ku ya werizno, la bêhemdê yê hanyayîşê yê şî serê hêtanê ya. Di a vîstike de wexto ku ya di binê çîman ra hanyay, dî ku o hanêno hêtanê ya ra, bi niyetê xu qelebnayîşî ya bi awayêkew nerm bineyna zî hêtê xu berz kerdî; bi enî livyayîşê ya ra hêtê ya bineyna bîne eysay, fistanê ya di miyanê şeqanê hêtanê ya de hînke bi ca bibi. Ya xu qelebna û destê xu ver bi yê wa derg kerd; bi antêşêkew nerm ê fikrê ya fam kerd; di binê mewanê engure de îne yewbînan gevezna... Bi gazkerdiş û lewan îne di ganê yewbînan de deqê sûrî mor kerdî. Geh cêr û geh cor ra îne cilê yewbînan şelênay. Di binê mewanê engure de bi pelanê mewan piştêbî. Ê di cenet de zey ê di merdimanê

verînan bî...

Di binê mewêka engura siyay de, bi zerêka pirr hezkerdiş hanyayne yewbînan ra; ê weşeyêke engura siyay ra çend hebî(gillî) tera kerdî; -di miyanê lewanê ya de ronayne û îne bi lewanê sûrgulan hezkerdişê xu pare kerdêne- çimê yê tadiyah çala gerdenê ya ser; ê çend hebê bînî weşe ra tera kerdî û di serê kortika gerdenê ya de di miyanê giştanê xu de peleznay; çilkê engure kewtêne çalika gerdenê ya; pelaznayîşê çend gillîyan dima kortike bî pirr û dalpeyêke ver bi acêr kewte rehîr; di miyanê di koyan ro newale de şî, hamey resay naka ya, “yeniye qestelî”; ûca bêtaqetî ra sere na ro. Dilşad zî bi hanyayîşê xu çilke dir şîne; o zî hame serê “yeniye qestelî”, vindert; serey xu ver bi yenî nizim kerd; bi zîwan û lewanê xu yê teyšanan awa yenî ya rengşerabe zîwa kerde û rehîrê peyay verûcû ver bi cor ramit; ya di binê yê de bi çimanê xu yê nîmakerdan yê karexezalan perrayne; pêlanê heskerdişî di binê zîwanê yê de zey laserêke ya şanayne tê. O resabi çalike gerdenî û a awa rengmeyî peysnaybî...

Wexta ku beryay cenetî di verê yê de bi weşî nîşanê xuakerdişî day, espar bê tereddut dekewt zere; di cenet de, ê yewrey yewbînan ro sûr bî; gan û rih bî yew; yewbînan ra dûrî kewtî; reyna bî yew; reyna... Xu di serê deryay de di gemîyêka hanî(hewnî) de dîne; wexto ku gemî pêlanê deryay ver bêcareyî û bêmecalî ra, ver bi qerax şî û lenger eşt binê deryay, hindî rêwî mest bîbî. Midetêke di binê mewa engure de, ê hanyay tîrêjanê rocî ra ku miyanê pelan ra herekiyayne û rengêkew sûr dayne erd û mewanê rezî. Roc ver bi awan şîne; dûrî ra zey lengeriyêka adirî eysayne. Awankerdox, rindî û heskerdişê îne ver bi kêfweşî di asîmanê hewtine de hewayne...

Payîz wextê çînayîşê engure û serê reza bi. Enî des rocî bî ku Dilşad û Bînefşe reza de meşxul bî. A serre engure zaf bî; îne di lînê şîre kerd bastêx, yew kerd dims û yew zî aqît; lînêke zî kerd kesme û lepikî. Dirikan ra bera-nî, şivê vamêran, çend fikiyê beyan û miroyan day esîde(helîre) ro û verê tîce de nay ro ku bibê wişkî. Nîmlênêke semedê meşlûlanê sûran viraşte; meşlûlê gozan dayne esîde ro û îne ku midetêke xu girotêne reyna dayne esîde ro; enawa hîri-çar rey tekrar kerdêne, heya ku meşlûlan xu weş girotêne û bîne goştin. Nîmlênêke şîre zî semedê meşlûlanê sipeyan ard keye.

Semedê çalmî darê çalmî viraştêne; dara belelûke ra çend şivî tera kerdêne û taştêne; dergiya şivan henda metreyêke bî; serê şivan zî tera kerdêne labelê çiqle serê yîne pa verdayne û çend şivî dayne pêser, girê dayne. Helîre xu viraştêne û semedo ku rengê helîre ver bi sipeyî bibo hînke do verdayne miyanê helîre; dimacû ku helîre peyşay verdanê teştêke, bi ay şivanê belelûkan daynê piro heta ku ya reng bedelnena bena sipey û kef dana. Badêcû zey

meşlûlanê sûran meşlûlanê xu çend rey danê esîde ro û danê verê tîce.

Di dewa ma de dewicî karê xu ra pey bi awayêkew rincan badê nimacê eşay konê ra. Ena rey zî îne ana kerd. Kundêke hame û di dara tuye şamî ra nişt. Bi çîmanê xu yê biloqan hanyayne tariyê şewe ra.

Eno şefe qzey şefeqanê bînan bi roşn nêame; xu dir esker û cendirmeyê cil zergûnî ardî. Ê çend seetî verê şefe qî hamey û di dorê dewe de cay xu girot. Serê şefe qî eskeran venda muxtarê dewe û muxtarî ra va “Devican ra vace wa pêro di verê qereqole de kom bibê. Emrê qumandarî yo...”

Qereqole di hetê rochelatî de di banêkew yewqat de bî, o zî qeracê koy ra bi, di kişta qereqole de, di destê raştî de kaşêkew veng bi teli û siyanê bereqnayan bi. Semedo ku kaş nizdî qereqole bi, dewicî zêde ver bi uca nêşîne.

* * *

Sebro û Fatê şanê Homa ra di verê mengeney titûnî de ronîşte demetê titûnî hazir kerdêne. Serê sibay go Sebro bişîne şaristan. Ê Fatê ra va “Hema piyasey titûnî nêbiyo a, eger ez enka titûn berî û biroşî go pereyêkew baş bikewo destê min.” Titûn pel bi pel kerdêne pak, damarî tera antêne û kerdêne demet(cema).

Îne davîst cema titûn kerd pak. Sebroy her raye çar cemey titûn dekerdêne kozikê mengênî. Raşta karê titûnî û mengenekerdîşê cê mesalayêka derg a. De ka titûnê qutiya dikandarê Çarşiyê Veyşnayî wa şima rê meselay xu vaco:

“Toximê min wesarî di serê erdêkew zibilin de yeno eştîş. Badê ku ez ze şitil bena pîl, min bi kok ra ancenê û benê di miyanê bostanan û erdan de nanê ro. Badê çend efar û awdayîşan lemê min benê pîlî. Di heto binî ra, wexto ku deqê zerdî ginenê pelanê min ro hinî wext o ku min tera bikerê û semedê araqnayîşî berê di keye de bikerê binê çarşefan ku ez weş reng bedelnî, bibî zerd. Dimacû min layan an şerîtan ra kenê û semedê vişkkerdişî danê vera tîce. Wexto ku ez bena vişk min di cayêkew hutin de nanê ro; heya payîzî ez weş bena nerm û ay çaxan bi gorê renganê min ê bedelnayeyan min yewbînan ra ciya ciya cema kenê. Enka zî ez semedê mengenekerdîşî di kardiya Sebroy ver de wa. Yo ku min mengene keno eger yewo jêhatî bo ez zey porê keynanê kejan bena zerd û derg. Min zehf rayan şinawito ku tanî merdiman vato “Merdim wazeno ku enî titûnî boro.” Eger ez rehîrê şaristanî ra destê cendirman ra û di şaristan de zî destê qolçıyan ra xilas bibî ez di Çarşiyê Veyşnayî de yena rotiş... Ena ray dikandaro erînayox, ti vanê qey ê bi xu ez xuliqnawa; bi qutiya xu min taneka xu ra veceno û dano embazanê xu...”

Dewicî ne bi vengê melay ne zî bi vengê dîkan şiyar bî di ay şefe q de; bekçiyê dewe di banan ser o geyrayne û fermanê qumandarî bi vengê xu yê hew-

ninî dewican rê eşkera kerdêne. Dewicê ku serê sibay rew şîne erdanê(hêganê) xu ser, karê xu ser û ay ku hayiya îne ferman ra çinîbî an zî waştêne ku xu di teberê dewe de binimnê, bi destê eskeranê ku dormarê dewe girotbi hameyne tepiştiş û komkerdiş; peynî de heme xort û camêrdê dewe bi weşî an zor verê qereqole de kom bî.

Sebro cendirman reyre û di serê polê yê de mengene û çuwalêke titûn ver bi qereqole hameyne. Cendirman we raşteraşt berd qumandarê xu hete. Qumandarî bi şiva destê xu mengene mocna û persa va “Eno çi yo?” Sebroy va “Eno mengeney titûnwerdîkerdişî yo.” Di verê Qereqole de, di verê çimanê hemînê de qumandarî biney titûn bi Sebroy da werdîkerdiş. Qumandarî dî ku raşt o, îşaretê yê ser ra cendirman bi nuskidayîş û paskilan Sebro zî berd miyanê dewicanê bînan.

Qumandar hame dewican ver de vindert û gefî vendî va “şima ra yewî em-şo tifing banê Çawîşî ra nawo. Ka vacê şima kamî ana kerdo? Eger şima nê-vacê ez go ana bikerî ku şima poşman bibê ku şima day xu ra biyê.” Wit dewican ra nêveciya. Heme zey telebanê mektebe rêz bîbî. Qumandar, di dest de şivêka barî, dewican ver ro şîne hameyne. Bêvengiya dewican ew yewrey hêrs kerdêne û ê bi şiva xu dayne binê çeney dewican ro, persê xu tekrar kerdêne.

Dewicî bêveng bî... Qumandarî emir da eskeranê xu, va: “Xu rê çivanê başan peyda bikerê û enî heran ra kewtan biney talîm bikerê.” Eskeran hewşanê nîzdî qereqole ra çîwey zixmî ardî û bi emrê “marş”î verê dewican şa ay kaşê kîştê qereqole. Dewicî vazdayne û eskeran zî pey ra, nêvatêne sere wo, paştî ya, mil o, dayne îne ro. Dilşad û çend merdîmanê bînan ê ku waşt qise bikerê an zî qarşî enî zilmî bêrê, hemine zêdetir kutîş û derb werd. Eskeran her rey rêzêke dewicî dayne verniya xu û ê “talîm” kerdêne. Wexto ku tanî eskerî bîne rincan tanî bînan cay îne girotêne. Serê sibay ra heya wextê nîmacê teştîrî dewicê ku di verê qereqole de kutîş nêwerd nêmend... Wexto ku eskerî dewe ra şî bêvengiyêka bi dec û nefret xu dewe ro pişt...

Dilşad zî di miyan de, zehf tenî bi rocan, tanî zî bi hefteyan di miyanê nivînan de mendî...

- 5 -

Ez hema zî etya wa; di dewa xu de, di serê erdê xu de wa; min bi kokê xu di binê dewe de ristim(rêç) dawo; ez di serê erdî de bi hêz û heybet a. Bi kankilanê xu weşîya zera tûtan a. Bi heme dec, jan, weşî û nêweşîyanê xu ez etya wa. Bi emr a, kal biya. Dostanê min yê dewicanê ena dewe ra zehf şî rehmet.

Torinê îne, torinê torinanê îne hamey û şî; zilm bi îne bi; veyşan mendî, pêlê zilmî îne ro wiştî we; adirî û tofanan xu bananê îne ro pişt. Bi koyan kewtî, di şikeftan de, di dol û newalan de mendî...

Destê yewbînan girot û hamey; reyna kişta min de roniştî; bi kul û keder axî antî... Nêzana reye çendine banê xu newe ra viraştî; bi destanê xu yê terkayeyan sî nay sîyan ser, heyatêkew newe na ro; toximê heyatêkew newe ramit*...

* Hetê rastkerdişê ziwani ra Malmisaniyî zehf min rê yardim kerd. Ez gelêke sipasê ê kena.

HESRÊ MI

Hergû raya ki
jan dana derbêka kutikbavan
qesbaya min a daxnaya di
hergû raya ki
roj şono awan
bê xeberêka xeyrêni
bê mizgîna pawita
ez vana
-Na ray zerra min a teniki mela
pîzze camêrdeya mi nêveşna!
Ez vana
-Mela na ray pêpey biginî
bigindirî bêrî war
barê mi rê nêbî serbar
hesrê min ê guloverî!

Çi heyf ki zerra mi
gilana gangiraney kena.

Zimistan-1996

J. ESPAR

ANTAGONÎZMA

Zurê ki waştay pey şad bena
pêrû raştî yî.
Raştê ki zerra împêratorî pey weş
bena bincaran zurî yî.

Zimistan-1994

J. ESPAR

ŞADBIYAYENA ZILMÎ

Ebi şayî, ebi seremonî
meyîtî sere birênî
semedê şadbiyayena zilmî.
Kardiya kalênî ra
virsikêno helmê mergî
Neseliyêna gonîya çirisiyaya
vewra heznîni ra.
Mat maneno Hûmay Cengî Ares
No çi tewir ceng o,
na çi şayî ya?

Vewra heznîni ser o
di sereyê biriyayey
di sereyê wedardayey
di destan miyan di yî!
Hinî deklanşorî çikenî
cellad pawibê xelat o.
Ebi hesreta binê herri
meyîtî zî pawibê celladî yî.

Seremonî qedêna, şayî zî.
La bipersê na bêvengey!
Veynî hetanî key
pêl dana alaya xezebî
vewra heznîni ser o?

Adar-1996

J. ESPAR

USÊN VE BAKILÎ RA..

MUNZUR ÇEM

Çi turî ke veng kewt de ke esker nawo yêno, çokî ro miletî şîkîyay. To hen zonêne ke Sovayîge de endî mordem nêmando. Hal kewto werte, sarê uzay tê de qir bîyo, qedîyo. Herkes hurêndîya xo de vinetîvî, motê raye bîvî, eskerî ser de nîyadêne.

A deqa de Mazra Sekernû ra Hesê Mistî kî uza bî. Hesê Mistî, mordemêde zonawox, wayîrê tecrubeyî bî. Êy rindek zonêne ke amayêna eskerê Tirkî se-va rindîye nêbîye. Sebebê amayîşê înan ya qirkerdene bîye, ya kî surgin. Ma zovî çi karê dîne uza bibîyêne ke? Xo ve xo fikirîya, dormê xo de nîyada û fêkê xo de pila, vake:

— Ez gere se bikêrî? Mî dest ra tuwa nîno. Mesele, meselê wertê Dêsmû ve xo nîyo ke ez dest berzî ra ci, hal bikêrî. Kar karê dewlete wo, dewlete kî bî-ya zindîq e. Lewê cîsnê Mewranî de endî qe tawa pere nêkeno. Tirkû îsanênî bine ra xo vîra kerda, ez se bikêrî?

Çi esto ke onciya kî bine ra bêomid nêbî. Hem nîya na çekuyî vatî, hem kî dormê xo de nîyada ke çîyê ke dest ra yêno, bikero. A deqa de di domanî kewtî ra çimû ver. Çiturî ke yê dî kî, zerê xo pê vesa û vake:

— A nê domanê rindekê delalî kî yêne kîstene? Meke ez yardim kêrî, qe ke nêyê bixeleşîyêne.

Na vatene ra têpîya nêvinet, venga domonû da vake:

— Ero hala bêrê îta.

Hurdemêna lazê apû; Usiv ve Xidirî ra eve lerze amêyî lewe û hen bêveng, pay ra vinetî. Hesen nêvinet, heto zu ra bî ra rast şî, heto bîn ra kî vake:

— Mevîndê mi dime bêrê.

O ver, domanî dime terkitî şî. Eke kewtî wertê korekî, uza de tenê raye gu-rete, Hesenî yê kerdî xeta korekî, te de merrednay ra û vake:

— Hata ke mi venga sima nêdo, hurêndîya xo ra mevêjîyêne. Korek derg o, eke sima vengê xo mevezê, kes sima nêvêneno. Temam, sima vatena mi fam kerde?

Îne va:

— Ya.

Hesê Mistî o ra têpîya pêyser cêra ra ame, hama çêwû nêşî. Pêyê bonû de darê jîyare bî, terkit şî pêyê dîne de pul ra vinet.

Zêde ranêvêrd, eskerî zê vergonê vêsanû guret ve dewe ra, tede axme bî. Çêverî eve lerze kerdî ra, pîl û qizî ardî pêser, uza ra kî berdî binê darê jîyare de zuvinî ra gîrêday, day vindarnayêne. Ci ra hîrê-çor tenêy têynay bî, ayê bînî kom kom pê ra gîrêdayîbî.

Sivte, qe kesî vengê xo nêvet, çîyê nêva. To hen zonêne ke kîlît sano fek. To hen zonêne ke destê kewto qirrike, nêverdano ke qesê vazêne. Fekê xo we nêbîyêne hama aqil û fikirê xo her deqa merdene ser o bî. Ma wû pîyû, çimî domananê xo ra, xort û çênonê xu yê azevû ra durî nêfistêne. Herçî ke dîne de nîyadêne kî, dez kewtêne zerre, ustinê zerrî şîkîyêne. Çinay re? Çinay ser o pîl û qiz tê de amêne qirkerdene? Çi sucê xo bî, kamî rê se kerdîvî ke na bête-re eve na torê amevî kêwtîv çêver?

Eke eve o qêyde uza tenê mendî, Elay Qimendarî cêr o vêjîya. Wertê eskerû de hen xo nahet-dohetî ser tada, giranîye kerde, ame rindek bî nêjdî. Eke so-pê hen çimî îsanê dewe se ra fetelnay kî vake:

— Muxtar!

Muxtarî va:

— Buyir beg.

— Her kes naza ro, keso ke kemî yo esto?

Çiturî ke na qese nîya hesna, sayêke kemer vora mutarî ro. Recefiya, kewt telase, çimê xo eve ters dormê xo de fetelnay û pêniye de kî vake:

— Di domanî werte de nîyê qimendar beg.

— Ma kotî yê eceva?

— Nêzonen.

— Hala rêyê ser o vinde, beno ke ti bîyarê ra xo vîrî.

Muxtarî vake:

— Ma se vajîne, nêzonen beg.

— Çi beno bibo, ma gereke yîne bivênîme muxtar. Ti kî zonena ke hondo ke ma yîne mevênîme naza ra nêsome. Mevindê, eke kotî ye vezê bîyarê, zahmet ma medêne.

Wêlî na çekûyû ser o kilmek fikir kerd, o ra dime kî burîyê xo voro kerdî berzî, çarê xo kerd qirmoçikin û pul ra Hesê Mistî de nîyada, vake:

— Eke bizono mezono na mordem zoneno.

Qimendarî naye ser o venga Hesê Mistî da, o ard lewê xo. Çiturî ke ame ci ra hurêndîya domanû pers kerde. Hama ey cuwav nêda, çîyê nêvake. Aye de di desmizê ke lewe der ê, dîne ra juyî vake ke:

— O Tirkî nêzoneno beg.

— Eke hênî yo berfekênî bike, vatena mi ci rê biçarne zonê sima. Vaze domonî ke kotîyê va şêro bîyaro. Eke mîyaro, êy kî ken wertê nayînê bînû, gîrêdan ben.

Eke na qese hesna, nêzona ke se bikero Hesenê Mistefay. To hen zonêne ke uwa sure cor da verdîya ra ser. Rêyê qimendarî de, rêyê sarê dewe de, rêyê xo de nîya da. Se bikerdêne gereke? Qimendaro Tirk endî hêşîyavî pê ke di domanî uza nîyê. Wes ya kî merde, êy gereke yê era xo dest fîstêne. Zovî mumkun nêbî pêsîr ranêverdêne. Bîşîyêne bîyardêne nê, mîyardêne nê. Bîyardêne domanî amêne kîstene, mîyardêne eve xo. Eke eve o qêyde tenê vinet, vake:

— Temam son an.

Na qesî ra dime bî rast, tenê dohetî ser şî, kewt wertê korekî û venga domanû da. Vake:

— Mi va yanê sima bixelesnîne hama nêbî. Heq sevevî rê nêverdo ma se vajî?

Domonî vêjîyayî, amey.

Aye de maya Usivî Xêycane û pîyê dêyî Mursayî de hal nêmendîv. Rîyê xo bîvî zê wele. Hen bîvî ke to vatêne ke gonî te de nêmenda. To vatêne ke leya kundir a, bê uwe menda, pemelîya ro. Zerrê xo de boyna vatêne:

— Çikê Heqî ve pira nîstayê muxtarî fêkê xo pêneguret, bî sebebê na domanû. Bî sebebê dîne, ê kî ardî estî kardî ver.

Na ra Sovayîge de bostonî ramîyavî, qawin û qerpuzî, xîyar û tomatêşî, lovîk û kundirî dêyrayî bî. Eskerû çiturî ke sarê dewe ard pêser, pêra gîrê da, nêvinetî kewtî wertê bostonû, zê vatena xo qawin, qerpuz û xîyarî werdî. Çilpe çilpe û milçe milça fêkê xo bîye. Eve o qêyde waxt vêrd ra peroz ame. Se ke bî peroz, na ra kî eskerî vake:

— Ma vêsanîme.

Hen tenê senikek ke vinetî, wertê xo de qesêy kerd, ci ra di-rê tenêy şî lewê sarê dewe, destê Mursa ve Xêycana kêrdî ra, bî ra raştî ke hetê bonû ser şêrê. Çiturî ke hen kerd, xaftela yek de qîrriye ginê ro Usivî, vake:

— Ez kî ma û pîyê xo de son. Mi dîne ra dûrî mevindarnêne.

Qumendarî xo çarna ra berfekî ser, vake:

— O se vano hen?

Berfekî va nîya nîya vano.

Qumendarî rêye di rêy binê çimû ra têy nîyada, nîyada û o ra dime kî vake:

— Temam. Destû rakerê, ey kî berê.

Eve o tore, se ke şî kewtî zerrê bonû, di eskerû xo sana nahet-dohetê çêve-

rî, pay ra vinetî. Mursayî ve Xêycane ra kî dest kerd ci ke werdene hazir kerêne. Hetu zu ra ardî vîti ro, hetu zu ra kolî û hêjî eşti lozine adir kerd we, o ra têpîya kî towikî sanay tê lewe, ru vilêsna ro, çor-ponc nonê toway potî. Tavî Usiv kî o werte de tol nêmend, çiqaşî ke dest ra ame yardim da ma û pî-yê xo. Xêycane hem gureyêne, hem kî hêşîrî kerdê war, zerrê xo de boyna başîyêne, zotî dêne eskerî ro. Vatê:

Dewa Heqî bo, dewa Îmam Usênê Kerbela bo. Hetu zu ra ma sanenê têlêwe, dest û payonê ma girê danê ke ma qir kerê, hetu bîn ra kî nonê xo eve ma danê hazirkerdene. Mi na dewa xo da ve Xizirî. Na dewa, mi esta çêverê melekê qoyê Qilxerû, koyê Duzginî. Zonayêna mi ra gore, gereke Duzgin hen geves nêbo, hesavê neqîye zalîmî ra pers kerone. Vanê ke Duzgin Bava wayîrê topon o, eke topê xo est kotî, uza têsêr û têbin ra keno. Omidê mi u yo ke topê kî nano çêverê na kafirî ra. Jîyar û dîyarê Dêrsîmî! Bimbarekê hardê dewrêşî! Xo vîr ra mekerê, dewa ma dewa sima wa. Hesavê naye pers kerê. Pers kerê ke neqîye kerdoxî rê nêmano. Xizir o Kal, tîya ke her ca de hazir û nazir a. Tîya ke dermanê her derdî ya. Tîya ke roza tenge de, pûk û pûkela de resena îmdadê qom û qevîlî, tenge ra xelesnena. Firesend ve na zindiqû mede, na honde feqîr û fiqarî mede qirkerdene. Ma rê çêverê ci sane, rayêda xêre bivêne.

Eve o qêyde werdene bîye hazire. Çituri ke bîye hazire kî, eskerî hetu zu ra Mursa ve Xêycane û Usivî ra pêyser berdî hurendî, destî girêday, hetu bîn ra kî dorme de bî topî, xo kerd mird. Înê werdêne, sarê dewe kî hen vêsan û têsan dûrî ra têy nîyadêne.

Non werdene ra dime qe nêvinetî, Sovayigijî sanay xo ver deva cêr berdî. Her kesî zonêne ke esker yîne beno verê çemê Harçîge, uza qir keno. Çi ke hata a roze mileto ke kewtîv ra dest, zêdê dîne hen kêrdîv. Ardîv verê çemî, tîrrû ser o qir kerdîvî, cendeğî tayê estîvî uwe, taye kî tîjî ver ra mendîv. A wa ke bîyamêne dîne sare kî têpîya a bîye.

Çi esto ke, eke dewe ra tenê senikek kewtî durî, uza fêkê derî de amêy vindarnayîs. Emrê qimandarî ser o, çokî nay ro, çokû ser o vinetî. Manê na karî o bî ke sata qirkerdişî amêvî. Bê sik, sarê Sovayîge kî zê herkesî hêyat ra hes kerdê, merdene nêwastêne. Zerê xo vêsêne, cîgerê xo bîyêne letêy. Hama yîne zelemela zêdîye kî nêkerde. Zonêne ke eke se bikerê lewê qimandarî de pere nêkeno.

Eke tenê senikek werte ra waxt vêrd ra, xaftela qimendar poseman bî, vake:

— Naza wertê dewon o, nêbeno ke naza qir kêrîme. Era raye fiye, bêrîme fekê çemî.

Naye ser o, komê îsonê Sovayîge rêyna kewt ra raye, hetê çemî ser şî. Wer-tê dîne û çemî de ke hona nêjdîyê poncas-şêştî game raye bîye kî, xaftela dot ra di suyarî vêjîyay. Hama kamî bî, kotî ra, seva çinay amêne kêşî nêzona. Suyarî ke amey bî nêjdî, qe nêvinetî, rasterast şî lewê qimendarî û ci ra juyî kaxitê vete, kerde ra derge dê ci. Qimendarî a wende, tenê vinet rêyna wende, ver û pêy çarna, hurdî hurdî têy nîyada. Xêlê waxt nêlewîya, pa şî, çimê xo hard ra durî nêfistî. O ra têpîya kî vake:

— Temam endî sima ra tawa nêvame şêrê çê. Ef amo, sima kewtî ra efî ver.

Aye de çêfêde henî kewt wertê sarê Sovayîge ke, qe nîno tarîfkerdene. Tayê huyêne, tayê çêf ra berbêne, tayîne kî duya kerdêne. Çi esto ke na halî zêde kî dewam nêkerd, xaftela hen pa mendî. Çiturî ke uwa serdine vêrdîna ra le-se ser, cemedînê hen bîvî. Sayeke can te de çînebî. Ayê bînî verdavî ra hama Uşên ve Bakilî ra dest de mendîv. Hurdemêna biray zuvinî ra gîrêdavî, vor de berdêne. Qey eceva? Qimendarî çinay ser o yê ranêverdêne? Heqa dîne de çi plan bî? Eskerû yê fiştîv ra xo ver berdê ke bikîsê, ya kî meselêde bîn bî?

Endî a deqa ra dime, gosê herkesî vengê tifongû ser o bî. Pênîye de kî tersa zerrî bîye raste. Çiturî ke veng kewt ra tifongî, vake “tirng”, her kesî va wax kîstî û şîn şîwanî dest na pira.

Cuwamêrdî bêveng û bêhereket bî, cênîyû dîne xo ro berbêne, domanû kî nêzonêne ke se bikerê.

Werte ra ke tenê waxt vêrd ra, di bêkçîyê Dêsmizê ke lewê eskerî de bî vêjî-yay, amêy. Îne ve sarê dewe ra zuvinî nas kerdêne. Çiturî ke amêy nêjdî kî, xevera deze vate. Vake:

— Uşên ve Bakil ra kîstî, şêrê meyîtû bîyarê.

Milet eve lerze dormê dîne de bî top. Wastêne ke çinay ser o, eve çi şêkîl kîstê, bimisêne. Çi esto ke bekçîyû kî sebebê kîstene nêzonêne. Hama eke çiturî amevî kîstene, o ci rê qesêy kerd. Korkez ra Alîyê Uşênî dest kerd qese, vake:

— Hurdemêna zuvin ra girêdayîbî. Taye ca ke berdî, na ra kî dare ra girê-day, eskerî kî xo kerd hazir ke endî pano bikîso. Çi esto ke aye de Bakilî qimendarî ra qesêy vatî, ci rê heqaret kerd. Vake:

— Sucê ma çik o, ti qey ma di birawû ît kîsena? Eke çîyê esto vase.

Uzay ser o kî Bakil, Uşênî ra birrîna ra berd darê da bîne ra gîrêda. Uşên eve qersune kîst, Bakil kî sungî kerd. Yanê tenenê dezo zêde da ci, hen kîst.

Na qesî ra dime cenî, cuwamerd û domonî bî ra rastî, eve şuyare terkitî şî lewê meyîtonê mordemonê xo.

HELEB: "UMMUDDUNYA"

ŞAHÎNÊ BEKIRÊ SOREKLÎ

Ji mêj ve ye riya min bi ser bajarê Helebê neketiye. Di salên destpêka ciwanîya xwe de li wir diçûm xwendegêhê û min gellek rojên xweş li wir derbas kirin. Wê demê Heleb bajarekî paqîş û xweş bû, yan wisa bi min ve dixewin. Mezinên me digotin; "Heleb diya cîhanê ye".

Li dû salên dût û dirêj fersend ket dest ku ez biçim merhebayerê li vî bajarê kevnar bidim. Di nav sîh salan de bajar ji hev kişiyaye û mezin bûye. Ew kolanên bajêr yên wek Taxa Quwetlî wek xwe mane. Di rojên berê de van taxan paqîş û kîbar bûn, çirayên curbicur tê de dibiriqîn û merov hişmekar dikir di wan re bimeşe. Îroj van taxan, tu dibêjî qey pîr û kal bûne. Rûyên wan qermîçî ne, ronahiya wan melûl bûye û gemara wan bêtir bûye. Hindek ji Helebiyên kevin bi keser dibêjin; "gundiyan Heleb fetisandin". Hindekên din dibêjin; "Helebiyên kevin çûn Şamê, Bêrûtê, Ewropa û Emerîkayê û xelkê bajarokên çolê û gundiyan Heleb pîs û pas kirin". Hindikên din dibêjin; "hukmat çê-çê li Helebê nanihere". Gotin û baweriyên bi hawayên cuda di derheqê Helebê de didomînin, lê li gel hemî kêmasiyan jî Heleb ji bo gellek kesan hên wek "diya cîhanê" dimîne, Heleb ji bo wan "ummuddunya" ye.

Erê hindek beşên Helebê ber bi paş çûne, lê di eynî demê de merov pêşveçûnê jî bi çavê xwe dibîne. Li rojava û bakûrê bajêr qonax û taxên nû çêdibin, rêyên Helebê digihînin Şamê û sînorê Îraqê; li rohilat, fireh bûne û balafirên ji derve de tîyên dest pê kirine li balafirgeha Helebê dakevin. Dukan û mixazeyên bajêr tijî ne, tiştê tu bixwazî heye. Xwarin û vexwarin bêdawî ne û zatî xwarina Helebê bi nav û deng e. Ji bo kesên xwedan pere otêlên pêncstêrk û cihên keyfê jî pirr in.

Heleb, wek gellek bajarên kevnar yên Rohilata Navin, bajarekî wisa ye ku tê de sedsalên ji dem û dewranên cuda li gel hev dimînin. Bi gotineke din, di hindek beşên bajêr de merov xwe di dawîya sedsala 20'emîn de dibîne, lê beşinê din de merov dibêje qey dem berî bi sedan salan rawestiyaye. Di van taxên dorhaliyê Medîne de, wek mînak, merov dikeve cîhaneke din, cîhaneke

sedsala 12'emîn; dibe ku hên zûtir. Bi Înglîzî ji bajarekî wek Heleb re, merov dikare bibêje, "city of contradictions". Li haliyekî jinên ku xwe bi cawê reş ji ser û bin ve nixamtinî, li haliyê din jinên bi nûjentirîn kincên ji modeyên Parîsê. Li haliyekî erebaneyên ku ji haliyê keran ve tîyên kişandin, li haliyê din bihatirîn otomobîlên ji modelên herî dawîn. Ji haliyekî de otobûsên ku navê "hop-hop" li wan hatiye kirin, otobûsên ku temenê wan heye ku pênçeh sal be, ji haliyê din de nûjentirîn otobûsên ku di 5 saetan de merov ji Helebê digihînin Şamê. Dema tu ji Kelaya Helebê dadikevî navenda bajêr tu rastî xwarîngehine wisa tîyî ku laşên dewêr li pêş wan bi dar de ne. Tu xwe di bajarekî Rohilata Navîn yê kevnar de dibînî. Berê ku tu têkevî Bab il Ferec tu rastî otêla El Emîr tîyî. Va otêla te di nav deqeyekê de dike atmosfêreke Ewropayî, bi qehweya xwe ya espresso, bi xwarin û vexwarina xwe, heta bi tuwaletên xwe.

Wek gellek bajarên Rohilata Navîn gelşên herî mezin li vir jî gelşên gemara ba û kêmbûna avê ne. Bi hezaran otomobîl di bajêr de bi şev û roj di rê de ne. Hejmareke ji taksiyan ji modêlên berî pênçeh salan in, dûmana reş ji wan tê der. Dî hindek taxên bajêr de merov bi dijarî nefesa xwe dikişîne. Ji ber ku di bajêr de tramway û trênen metroyê nîn in, hemî neqliyat bi rêya otomobîlan e. Ev jî dibe sedema gemarîkirina bayê bajêr. Di gellek çayxaneyên bajêr de, bi taybetî eger zivistan be, dûyê cixareyan gelşeke mezin e. Ji deh merovan neh li van waran cixareyê dikişînin û gellek ji wan yekê bi yekê vêdixin. Gemara li ser taxan û li pêş xaniyan hindik caran bi rojan dimîne.

Ava Helebê bi boriyan ji çemê Ferêt tê. Ji ber ku bajar mezin bûye û ava Ferêt kêmbûye, di çend salên borî de av li bajêr kêmbûye. Ne tenê dar û baxçeyên bajêr nedikarin wek berê bîyên avdan, lê havînê av bi saetan tete birrîn. Ji ber sedemên wisa merov dikare tete bigihe, çima av dikare di pêşerojê de bibe sedema şerê di nav welatên Rohilata Navîn de.

Xelkê Helebê, bi pirranî, ji Kurdan hej dikan, hurmet û rêza wan ji Kurdan re heye; ew û Kurd dostên hev in. Yek ji sedeman ew e ku nasdariya wan û Kurdan pîr kevn e û vedigere pêş rojên Selahiddînê Eyûbî. Ev wê xwebêjê nade ku yên ji Kurdan nefretê dikan nînin, lê bawer dikim hejmara wan ê kêmbê. Kasetên bi Kurdî hema hema di hemî dukanên kasêtfiroşan de tîyên dîtin. Helebiyekî kal dibêje; "Kurd ji mêj ve ye li Heleb in û roleke mezin di avakirin û pêşvexistina wê de lîztine". Li Helebê beşekî bi navê "Bustan Kul Ab" heye ku wek "Bustan Kîlêb" tete ser zimanê Helebiyan îroj. Kalê Helebî dibêje, kalikê wî ji wî re gotiye ku berî gellek salan Kurdan ew ciha şên kirine û navê "Gul Av" hatiye nivîsandin û hên îroj jî wisa tete nivîsandin. Bi gotine Kurdine Sûriyê, îroj li Helebê dora 250 000 Kurd dijîn. Li vir Kurdên

herêmên Çiyayê Kurmênc (Efrîn), Kobanî (Eyn il Ereb) û Cizîrê digihin hev. Pirraniya Kurdên Cizîrê xwediyên dukanan in, yan bazirgan in, yan xanî li vir kirîne û zivistanê li Helebê dimînin. Pirraniya xelkê Kobanî di warê pîşesaziyê, dukandariyê û karkirinê de mijûl in. Xelkê herêma Efrînê wek mamûr, tixtor, garson, şofêrên taksiyan û paqijker di kar de ne. Hejmareke mezin ji zaroyên vê herêmê li kuçan boyaxçiyên qonderan in. Wek min dît û bihîst, Kurdên Kobaniyê û Cizîrê ji vê yekê gellek aciz in. Ew dibêjin; "Kurdên Efrînê yan boyaxçi ne, gerson in û wan navê Kurdan xirab kiriye". Dema merov hewl dide ji wan re şîrove bike ku kar şerm niye, ku yên van karan dikin ji neçariyê dikin, ku di nav Kurdên Efrînê de bi hezaran tixtor û muhendîs û zana jî hene, van gotinan guhên gellek kesên ji Cizîrê û Kobaniyê xuh nadin. Bi taybetî Kurdên herêma Kobaniyê di vî warî de gellekî serhişk in. Yek ji wan wisa dibêje; "lo ez ji birçîna bimirim jî, ez qunderên kesekî bûyax nakim, ne jî dibim gerson. Ez ê kevîran ji sibê heta êvarê bidim ser piştê xwe, ez ê li gund nanê cêh bixwim û nêmi li Heleb nabim boyaxçi û gerson." Kurdên Efrînê ji haliyê xwe de gotinên wisa wek paşverûtî bi nav dikin. Hindekên din dibêjin; "ev zaroyên ku qondereyan boyax dikin û jinên ku mal û xaniyên xelkê paqîş dikin ne Efrînî ne. Pirraniya wan ji haliyê Mêrdînê hatine û îroj xwe wek Efrînî didin nasîn." Tiştên wisa li haliyekî, Heleb bûye pîreke di navbera Kurdên her sê beşên Kurdî de. Helebê Kurdên herêmên Cizîrê, Kobaniyê û Efrînê ber bi hev hanîne, di navbera wan de danûstendin, hevkarî û dostayetî zêde kiriye.

Dema merov bi salan li derve dijî, merov gellek xusîsiyetên Kurdan ji bîr dike û hindek ji me dest pê dikin tiştan li gor xusîsiyetên biyanî şîrove bikin, yan tiştan ji realîteya Kurdan cudatir ber bi çav binin. Lê dema merov li dû salan vedigere welêt, merov dibîne çîqa ferq di navbera ramanên bi nivîs li derve têyên diyarkirin û realîteya Kurdan de heye. Ez li dû vê vegera li welêt gihîştim wê qenaetê ku çîqa endamên gelekî xwe ji halîne de bidin guhertin jî, tiştine hene ku guhertina wan ya bingeşê di serê pirraniya xelkê de gellekî dijwar dimînin.

Em di dawiya gotarê de car din li Helebê vegerin. Li gel hemî kêmasiyên li holê jî, va bajara hên xwediyê şexsiyeteke taybetî ye, bajarekî balkêş e ku tê de demên kevnar û yên nû rastî hev têyên, ku tê de erf û adetên gelan li nav hev dikevin, ku tê de Erebi, Kurd, Ermenî û yên din bi hev re dijîn, ku tê de milyonêr û belengaz cîran in, ku tê de ramanên cûrbecûr, nîşên ji sedsalên cuda û zanyarên bi ramanên ji hev cihê di keştiyekê de, di nav pêlên rojên jiyana xwe de, ber bi aso diçin.

Li dû nivê şevêkê, hevalekî ji Cizîrê, hevalekî ku me berî dora bîst û du sa-

lan salek li Berlîna Rojava li gel hev derbas kiribû, em di otomobîla xwe de dibirin mal. Di taxa Baron de, ku demekê taxeke navdar bû li Helebê, me li pêş xwe, di nav tûtetûta otomobîlan de, kerek û du dahşikdîtin. Bi boçika kerê de tenekeyek bi benekî hatibû girêdan. Tenekê dikir teqereq û ker ta ku jê dihat direviya. Herdu dahşikan jî dabûn şopa wê. Şûya hevalê min ya Almanî keniya û got: Ma li ku Mêrsêdes û ker li dû nîvê şevê di eynî taxê de ber bi pêş diçin?!

Çiqa dilê min bi kerê û dahşikan şewîtî, lê min şerm kir bibêjim; ”ji bona xwedê, otomobîlê rawestînin da ku em hewl bidin vî tenekeyî ji doçika kerê vekin”. Ez bi şûya xwe ya Australî şewirîm. Wê jî ji min re wisa got: ”Rast e guneh e, lê kî dizane, dibe ku va yeka li keyfa kerê jî hatibe!”

Li dû vê vegera li welêt ez gellekî kêfxweş û bextewar bûm. Berî her tiştî ji bo vê yekê: Ez ghiştîm wê baweriyê, eger ez li dû sîh salan îroj li welêt vegirim, ez ê bêyî dijarî bikaribim têkevîm nav çemê jiyana welêt û di nav heyvekê de ez ê salên li derve ji bîr bikim. Gelo va yeka nêşaneke baş be, xirab be, meseleyeke din e.

Sydney, 28/1 1996

ALEQEMŞÊ

ZINAR MISTEFA

Dilbirîn ji nêza xuha xwe Gulê bi zêrekî dabû. Herdu zarok qonaxa hefteyekê bi kerwanan re peya diçûn. Dilbirîn êdî nikarîbû Gulê ji belayên dinyayê biparêze. Ji loma tu çareyên din di destan de neman, ji bilî ku wê teslîmî hinan bike. Dilbirîn li wan topraxan bi tenê û perîşan ma. Ne bav, ne dê û ne jî xwedî. Kela girî kete qirikê, wî êdî nizanîbû bê bi ku ve here.

Hemû kesên ku meseleya wî bihîstin, dilê wan li ser halê wî rebenî dipêrîtî. Çikû bêtara ku hatibû serê wan zarokan, zilamên mezin nikarîbûn xwe li ber bigrin. Dilbirîn û Gulê şahid û şihûdên fermana Aleqemşê bûn. Wan bi çavên xwe dîtî ku çawa Tirkên pîrek û zarokên Kurdan qelandin. Di sala 1926-an de hikûmeta Tirkiyê fermana Aleqemşê rakir. Esker ji Cizîrê rabû, xelkên çend gundan dane ber xwe û ew li Aleqemşê kom kirin. Eskerên pîrek û zarok xistin hewşekê û zilam jî xistin yekê. Sara Kulek şahdetiya xwe weha dida:

“Eskerên hingî gundî dane ber fişekan, xwîn dipejiqî erd û ezmanan. Ji wan kelaşan çemekî ji xwînê herikî. Piştî ku hemû kuştin, laşê wan tev şewitandin ku hovîtiya wan dernekeve der”.

Sarê, Dilbirîn û Gulê di kozika mirîşkan de veşartin ku wan ji mirinê xelas bike. Lê kamaxa Sarê ji derve ma. Gava eskeran dest bi kuştinê kirin, fişekê ke kor lê ket. Ew çend heyvan birîndar ma, heta ku li ser destên tixtorekî kurmancî sax bû. Lê ew seqet ma. Lewma navê wê bûbû “Sara Kulek”. Bi sedan kurdên bêguneh li Aleqemşê hatin kuştin. Hinek rêsipî dibêjin ku wê rojê 1304 mirov bê sûc û bê sebeb hatin şewitandin.

Tirkên bi xwe, tawana xwe bi dizî birin serî. Lê wan geh şelandina midûrê postê dikirin hêncet; geh qahpetiya jina wî dikirin hêncet. Xwedê giravî çend zigurd bi wê pîrekê lîstine û ne bi xêr, şerefa dewletê şikandine.

Ma me kê bawer dikir ku wê ew qas Kurd li ser xatirê pîrekekê werin qirîrin?! Na, ev gotin nediketî serê kesekî. Ya rastî ev bû ku rejîma Atatürk dixwest Kurdan mehû bike; yê sax bimîne jî bistirhîne, bikin Tirk.

Ji nav wî agirî, ji Aleqemşa şewitî, ji nav lepên Tirkên Dilbirîn û Gulê fili-

tîn. Xelkê ew ji gund derxistin. Piştî bi kerwanekî re çûn, di Hîsiça de derketin. Dilbirîn salêkê li wir ji xwe re rêçberî kir. Lê debara wî pê nedibû. Rabû bi hevaltiya bazirganan re çû Şamê. Pênc salan li ber destên senetkaran şixulî. Paşê vegeriya Hîsiça qene li Gulê bipirse. Lê wî tu salox ji wî nehilanî. Wî berê xwe da Qamişlo. Bajar nû ava dibû. Ji gelek deveran xelkê koçî wir dikirin. Çend sal di wê navê de çûn, Dilbirîn ji xwe re keçeke Kurd dît. Ew bi hevdû re zewicîn. Sebra wan bi hev dihat, nemaze piştî Xwedê Siyamed da wan. Halê bavê Siyamed hino hino xweş dibû û pereyên girêdayî li nik wî çêdibûn. Di pênciyan de, wî ji xwe re dikanek û tirimpêlek kirî. Xwedê keç û kurekî din jî da wan û mal bi zarokan ava bû.

Gelek sal bihurîn, lê Dilbirîn ne Gulê û ne jî Aleqemşê ji bîr nedikir. Çikû ew kul di dilê wî de kûr hatibû çandin. Dilbirîn zilamekî di nav xwe de girtî bû; ji bilî mirov û hevalên wî yên nêzik, kesekî bi derdê wî nizanibû. Gelek caran bi hêncet û bêhêncet, ew li tirimpêla xwe siwar dibû, diçû Hîsiça li Gulê bipirse. Çi cara ku ew biçûna wir, hevalên wî digotin: “Dîsa zilamê me çû li Gulê bigere, vêga hestûkên wê rebenê di bin axê de rizîne”.

Emrê dilbirîn mezin dibû. Ew ditirsa ku berî Gulê bibîne bimre. Ji lewma jî çûnên wî yên Hîsiça gelectir bûn. Carekê piştî nîvro ew li ber dikanekê rûniştibû, hingê ji wê derê pîrekeke bi eba dihat. Gava ew pîrek di ber wî re bihurî, tirkînî ji dilê wî ve hat û çavên wî li ser wê man. Gava pîrek ji dikanê derket, Dilbirîn xwe negirt, weke ku li pê şopekê here, gav bi gav heta ku pîrek nêzikî mala xwe bû, da dû wê. Pîrek hêdîka ber bi derî ve çû ku derî veke. Wî ji nişka ve destê xwe avête çengên wê û ew hişk girt. Pîrekê kire hewar, hewar, bû xire cira wan. Dilbirîn her digot: “Tu xuha min î,... Tu xuha min î, ez hew te berdidim, ez hev ji te diqerim, ez hew terka te dikim.”

Li ser wê qelefekê, zilam û zarwên pîrekê derketin derve. Gava wan diya xwe di nav destên Dilbirîn dîtîn, ew beziyan wî. Yekî ji kurên wê digot: “Ev dîn e, bavo ev dîn e”. Zarwan nikarîbûn diya xwe ji nav destên Dilbirîn derxînin. Her wî digot; “Xuha min e, ev xuha min e. Ew hew ji nav destên min derdikeve”. Dibirîn wisa zanîbû ku ew xuha wî ye. Mîrov digot qey ew tu caran ji ber çavên hevdu dûr neketine. Zilamê pîrekê gazî Dilbirîn kir û got: “Çi mesela te yî yabo, ma tu çi ji pîreka min dixwazî?”

Kute kuta dilê Dilbirîn bû, ji kul û derdên dinyayê êdî bêhna wî dernediket. Kurê mezin ji Dilbirîn re got: “Xalo, bêhna xwe fireh bike û bi me bide fêhm kirin, ka mesela te çi ye?”

Dilbirîn bi awakî westehayî got: “Ev xuha min e. Berî pêncî salî min ew bi zêrekî firot. Li piştî wê, li milê rastê şanikek heye.”

Şanikek li piştî Gulê hebû. Wextê ku Dilbirîn ew dabû, kirasekî çiryayî lê

bû; hingê wî ew şanik dîtibû. Lê ya mestir ew bû ku hê hin ji wan sûretên kevin di bîra Gulê de bûn.

Bi girî, bi hêstiran, zarwan xalê xwe birin hundur. Gulê digirya, cîran digiryan, hemû digiryan. Ew deqîqeyên pir zor bûn. Wê dinya bêrehîm, halo ew herdu xuh û bira ji hevdu veqetandibû, lê qedere dîsa ew gihandibûn hev.

Xwarziyên Dilbirîn ji xalê xwe pirsîn, gelo wî çawa dêka wan nas kir? Dilbirîn ji wan re got:

“Lawo, çawa min diya we dît, min got ev xuha min e. Xwarzê, ev tişteki pir zor e, ez nikarim ji hinavê xwe derxim. Belkî jî Xwedê ev şanî min da, belkî min ji xwe de ew dît. Ez nizanim. Lê ya eseh ew ku xeyala Gulê tu caran ji ber çavên min neçû û heta rojek ji emrê min hebe, wê ew û Aleqemşê di bîra min de bimîne”.

Ew roj li nik wan bû dîrok, bû hêstir û şahî. Wê şevê xew nekete çavên kesekî. Roja dîtir, Dilbirîn ew hebû bi tirimpêla xwe birin Qamişlo. Li wir jî girî û şahî tevlihev bû.

Lê Dilbirîn û Gulê zêde bi hev şa nebûn. Rojekê di ser şivê de, dilêş hate Dilbirîn. Heta ku zaro çûne pê tixtor wî can da. Wê şevê xebera mirina wî giha Gulê. Roja dîtir, hevalan bi zorê termê wî ji nav destên Gulê derxistin. Vê carê, mirinê Dilbirîn heta hetayê ji Gulê dûrxist.

ÇEND PIRSÊN RÊZIMANA KURDÎ – I – *

MÛRAD CIWAN

Zimanê Kurdî îro ji her demê bêtir îmkaneka mezin a bikarhatinê ji bo xwe dîtiye. Bi taybetî Kurmancî di dîroka xwe ya seranser de cara pêşîn e ku bi vê firehiyê bikartê. Jiyana siyasî, kulturî û rewşenbirî ya Kurdan bûye xwedanê gellek dezgeh û wasiteyên bikarhatina zimanê Kurdî. Di warên herêmî, netewî û navnetewî de radyo û televîzyonên Kurdan yan yên Kurdîziman dest bi weşanê kirine. Li welêt û li derveyî welêt çapxane, komele, enstîtu, weqf û dezgehên dîtir ên Kurdan, rojname, kovar û pirtûkên Kurdî çap dikin, civîn, kongre semîner, lêkolîn û meş û ahengên xwe bi Kurdî dikin, li gel endamên xwe û li gel dezgeh û rêxistinên din bi wasitên nivîskî û devkî yên Kurdî têkiliyan datînin. Li derveyî welêt, îmkanên ders an dersxaneyên zimanê Kurdî li ber piçûkên Kurdan vedibin. Ev bi xwe ra wê yekê tîne ku gellek kes, dest bi mamostetiya zimanê Kurdî bikin. Li başûrê Kurdistanê, bi avabûna dewleta federe re, zimanê Kurdî di jiyana burokratî, siyasî, huqûqî, hînkari û gellek warên din de bi aktîfî tê bikaranîn.

Ev yek ji aliyekî de îmkanan li ber zimanê Kurdî vedike ku ew geştir, berfihretir û bikêrtir bibe, ji aliyekî de jî yên ku wî bikartînin, pirtir xwe muhtacî wê yekê hîs dikin ku bi xusûsiyet, bikêrhatin û dewlemendiya vî zimanî aşîna bibin, xwe ji kêmasî, nezanî û şaşîyan xelas bikin. Helbet mesela dewlemendkirin, zelalkirin, kemilandin û standardîzekirina ziman jî li meydana ye. Ev hemû bi xwe re wê yekê tînin ku îro ji demên çûyî bêtir îhtiyac heye ku em lêkolînên zanistî li ser zimanê xwe bikin, hemû dewlemendî, meziyet, bikêrhatin û hostatiya wî derxin meydana, bingeşên rastnivîsîn û rastaxavtina wî li ber çavê kurdîxav û kurdînivîseran zelaltir bikin.

Hema hema tevayiya xebatkarên ku di dezgehên jiyana rewşenbirî û kulturî de xebatê dikin ne pîsporê zimanê Kurdî ne, li mekteban zimanê Kurdî nexwendine, çî fêr bûbin ji jiyane, jî dê û bavên xwe, jî der û dora xwe fêr bûne, gellek caran bi îmkanên xwe yên şexsî yên kêr, xwendin û nivîsandina vî zimanî hîn bûne. Ji ber hindê jî her çendî bi piranî xebatên heja di warên zimên de bikin jî gellek kêmasî û şaşîyan jî dikin. Meriv di radyo û televîzyonan de, di kitêb û rojnamen de rastî gellek axavtinên şaş tê. Yan di warên rêzimanî û rastnivîsîn û rastaxavtinê de şaşîtiyan dikin, yan gellek caran jî dêlva peyvên ku di zimên de hene bi xwe peyvên çêdikin. Ji ber ku bingeşên zimanî jî nizanin bi awayekî şaş gotinan çêdikin. Gellek caran meriv dibe şahidê cumleyên welê ku avabûna wan ne li gora prensîbên avabûna zimanê Kurdî, lê li gora yên Tirkî, Erebî, Farisî, Rûsî an zimanekî din in.

Gelekan ji me wê çîroka qiralê ku teb'ayên wî îksîrek vedixwarin û pê dîn dibûn bihîstine. Li gora çîrokê, ew kesên ku îksîr vedixwarin û dîn dibûn xwe dîn qebûl nedikirin û ji kesên baqil re digotin ku ew bi xwe dîn in. Îksîr-vexwir di civatê de roj bi roj zêde bûn welê lê hat ku ji qiralî û der û dora wî pêştir kesên baqil neman, tevayiya xelkê dîn bûn û dest pê kirin ji qiralî û der û dora wî re gotin ku hûn dîn in. Qiralî nema karî xelkê îdare bike. Ew û dora xwe mecbûr man ku wan jî ji wê îksîra dînker vexwarin, hemû bi hev re dîn bûn. Piştî wê qiralî îmkana îdarekirina welêt dît.

Çîroka me jî wekî ya wî welatî ye. Hin rabûne di dezgehên ragihandinê û yên hînkariyê de li gorî zanîna xwe lê gellek caran şaş Kurdî bikartînin. Ev şaşîti di nava xelqê de belav dibin, xelq nizanin ku ev şaş in, dibêjin qey bingegehên rast ên zimanê Kurdî ne. Yên ku hay ji van şaşîtiyan hene eger bêdeng bimînin rojek wê were ku piraniya xelqê van şaşîtiyan wekî rastî qebûl bikin û ji rastiyan re jî bibêjin ev şaş in û wan red bikin.

Ji ber van sedeman jî Komeleya Mamosteyên Kurd karekî gellek qenc kiriye ku semînerêk bi vî awayî li ser zimanê Kurdî li dar xistiye û em vexwendine vê derê ku em karibin li gorî zanîn û bikêrhatina xwe bi hin ji pirsan mijûl bibin, muhaweले bikin ku bersîva wan bidin, heta dereceyekê hin aliyên wan zelal bikin.

Gava ez ji bo vê semînerê hatim vexwendin, berpirsiyariyeke welê li ser piştî min hat danîn ku ez li ser gramatîka(rêzimana) Kurdî rawestim. Pirseka gellek muhîm û di cih de, lê gellekî diwar... Amadekarên semînerê diyar nekiribûn ku ez li ser kîjan warên gramerê rawestim, teh'dîdkirina vî karî û hîlbijartina pirsan jî dan ser milên min. Loma jî mesele ji bo min girantir bû.

Bi îzna we ez ê li gorî zanîna xwe li ser hin xalan fikr û zanînen xwe pêşkêş bikim ku bi qenaeta min di roja îroyîn de di warê axaftin û nivîsînê de gellek aktuel in. Pirsên ku min hîlbijartine her wiha pirsînî wiha ne ku heta îro zîmannas li ser wan ranewestiyane, an rawestiyabin jî bi zelaliyeka têr ew çareser nekirine.

Yek ji wan pirsên ku li vê derê ez ê li ser rawestim, bikaranîn û çêkirina peyvên Kurdî ne. Her wekî min berê jî got ji ber ku îro gellek kes xwe muhtac dibînin ku di gellek warên jiyanê de li ser gellek meseleyan bi Kurdî bi-axivin an binivîsînin, dikevin pey tesbîtkirina peyvvan, heke di lehceya xwe de ew dîtînin dîtînin, nedîtînin yan jî lehceyên din û zimanê din tînin yan jî li gorî xwe peyvên nuh çêdikin û wan bikartînin. Helbet ev tişt ne karekî pirr ecêb e û di hemû zimanan de heye. Lehceya resmî yan jî zimanê yekbûyî yê hemû miletan ji lehceyên xwe yên cuda gotin û bingegehên gramerî girtine, ji zimanên din gotin deyn kirine û xistine nava ferhenga xwe. Lê deynkirina gotinan

ji lehceyên cuda û ji zimanên biyanî yan jî durustkirin an çêkirina gotinên nuh di wî zimanî de divê li gorî qaîdeyên wî zimanî an wê lehceyê bin, nabe ku meriv hema li gorî texmîna xwe gotinan çêke.

Di xala yekê de ez ê li ser rê û dirbên pêkhatina gotinên Kurdî rawestim, muhawele bikim pêşkêş bikim ka di zimanê Kurdî de gotin bi çi awayî tên çêkirin.

Xala duduyan a ku ezê li serê rawestim, mesela tewandina navan e di zimanê Kurdî de. Îro gava Kurdî tê axaftin û nivîsîn şaştiyek ji wanên herî mezin ku tên kirin tewandina navan e. Gellek ji wan hay jê nînin ku xusûsiyeteka tewandinê di navên Kurdî de heye, loma jî nizanin ku nav kengî û bi çi awayî divê bên tewandin.

Xala sisiyan mesela cînavên(pronomen-zamîrên) Kurdî ne. Wekî tê zanîn, cînav di Kurdî de bi du awayan derdikevin pêşberî me ku zimanzanan heta niha ew bi du grûb cînav dane dabeşkirin.

Meseleyeka din jî mesela rola artikelan(herfa tarîfê- veqetandek) e di Kurdî de. Rola artîkelan heta niha baş nehatiye zelalkirin, loma jî yan em di bikaranînê de wan nabînin yan şaş bikartînin yan jî bikarnaynin.

Meseleyeka din a ku ezê li ser rawestim mesela diyarî û nediyariya navan e di Kurdî de. Bi vê re min divê ez li ser tarîfkariya navan jî rawestim.

Di xala dawîn de ez ê li ser avakirina cumleyên Kurdî rawestim. Ev jî di roja me ya îroyîn de pirseka girîng e. Gelek caran em rastî cumleyên welê tên ku erê gotinên wan bi Kurdî ne lê avabûna wan wekî cumleyên Tirkî, Erebî, Farsî, Rûsî an zimanekî din in.

Heke me wext dît, em li ser van xalan rawestiyan, piştî beşdarên hêja heke bikaribin çi di van xalan de, çi jî di hin xalên din yên gramerê de pirsên xwe bikin û eger dîtînin wan ên cuda hebin ji kerema xwe re wan li vê derê pêşkêş bikin em ê kêfxweş bibin. Wê ji bo min kêfxweşiyê mezin be eger bi taybetî ev pirsên pêşkêşkirî bên munaqeşekirin.

DURUSTKIRINA PEYVAN

Li gorî avabûna xwe peyvên Kurdî dibin sê beş:

- a) Peyvên basît
- b) Peyvên pêkhatî
- c) Peyvên hevedudanî

Peyvên basît

Peyvên basît ew peyv in ku di zimanî de bi halên xwe yên eslîn cîh digrin, ji bal tu pêş- an paşpirtikan (prefîks û sufîksan) ji nuh ve nehatine pêkanîn, ne pêkhatiyên ji du an zêdetir gotinên yekbûyî ne.

dar, ber, av, çiya, zevî, reş, kurt, aş, bir,
hat, meriv, jin, zarok, mam û h.w.d.

Çêkirina gotinên basît hema hema ne mumkun e, çimkî ew ji berê de di nava zimên de hene. Lê li gor lazimiyê ji zimanên din tîn deynkirin û bi orîjînîaliya xwe yan jî bi guhertineke piçûk ber bi deng an formên Kurdî ve, tîn bikaranîn. Ew gotinên basît ên ku ji Erebî, ji zimanên cînar ên din û ji yên gellek milletên dinyayê bi vî awayî dikevin nava zimanê me û wî dewlemend dikin. Dîn, pêwendiyên kulturî yên cînartî û pêşdeçûnên ilmî û teknîkî hin sedem in ku peyvên biyanî dikevin nava zimanê me. Sedemekî din jî siyaseta qedexekirin û asîmîlekirina milletên serdest e. Bi vî awayî zimanê me nayê bikaranîn, nayê pêşdeexistin, qels dibe û mecbûr dibe ku ji zimanên milletên serdest gotinan deyn bike. Helbet diyardeyeka wiha ne tebîî ye ku ziman pêşde bixe, bileks xerakirineke zêde di zimanî de pêk tîne, loma jî divê meriv li hemberî vî diyardeyê derkeve. Kurd bi îsrarî li hemberî siyaseteka wiha şovenîst û texrîbkar in û di seranserî dîrokê de li ber xwe dane, zimanê xwe parastine, bikar anîne.

PEYVÊN PÊKHATÎ

Peyvên pêkhatî ew peyv in ku yan pêşpirtikek (prefîks) yan paşpirtikek(sufîks) yan jî herdu bihevve wergirtine û bûne peyvên nuh.

A) Pêkanîna peyvan bi saya pêşpirtikan(prefîksan): Peyvên wiha, gava yek ji pêşpirtikên(prefîksên) li-, bi-, bê-, di-, da-, hil-, ra-, der-, ve-, wer-, lê-, jê-, pê- û vê- yan jî ji edatên bê, ne, na-, ni-, me bê pêşiya peyvekê çêdibin.

li-: likar, lirê

bi-:

a) Tê ber navekî û hevalnavekî(adjektiv-sifet) durust dike:

bibext, bikêr, biber, bixîret, bibav, biînsaf, bijahr, birûn, bişekir...

b) Tê ber karekî(fiîlekê) û halê fermanî yê erênî(poziîtîv) durust dike:

bike, bibêje, bixwe, binivîse, bilîze, biîne, bibe...

bê-: bêbext, bêkêr, bêber, bêxîret, bêbav, bêînsaf, bêjahr, bêrûn, bêşekir

di-: diçe, diçû, dinivîse, dinivîsî, dikeve

da-: daket, daçikand, dawerivî, dageriya, dagerand, dahat

hil-: hilkişyan, hilavistin, hildan, hilgirtin, hilperikîn, hilperikandin, hilbijartin

ra-: rahêje, raxe, rapelike, rapelikîne, razan, raperîn, radan, rawestin

ve-: veke, vedan, vexwar, veniştin, vegeriyan, vegirtin, vekotin, veketin, verotin

Di lehceya Behdînê de ev pirtik dibe paşpirtik(sufîks)û li paşiyê bikar tê:

hateve, daneve, gotineve, girtineve, ketineve...

wer-: wergirtin, wergerandin, wergeriyan, weranîn, [tê]werdan

der-: deranîn, derkirin, derxistin, derbûn, derketin...

lê-: lêkirin, lêhatin, lêdan, lêkolan, lêbûn, lêanîn, lêkeftin

jê-: jêkir, jêbû, jêxistin, jêketin, jêbir, jêhatî...

pê-: pêbûn, pêkirin, pêxistin, pêketin, pêxwarin

vê-: vêxistin, vêketin

bê:

a) ji hevalnavekî(adjektivekî-sifetekî) bi negatîfiya xwe hevalnavekî din çêdike.

neyar, nexweş, nerast, nebaş...

b) Tê ber fiîleka kêşayî ya dema buhurî û maneyeka bi eksê wê dide fiîlê.

neçû, nexwar, negot, nenivîsî...

na-: Bi vê edatê hin fiîlên dema niha tên kêşan ku mahna nebûnê(negatîfiyê) didide wan:

naçe, nabêje, naxwe, nagirî, nanivîse...

ni-: Tê ber hin fiîlên demên niha ku mahneyeka negatîf dide wan:

nikare, nizane...

me-: Halê fermanî yê fiîlê ye ku fermaneka bi mehna negatîfîyê durust dike:

meke, mebêje, mexwe, menivîse, melîze, meîne, mebe...

B) Pêkanîna peyvan bi saya paşpirtikan(sufîksan): Gava meriv paşpirtikekê bîne dawîya peyvekê û bi vî awayî peyveka nuh durust bike, ew dibe peyveka pêkhatî bi saya paşpirtikê: Paşpirtikên ku peyvên nuh durust dikin ev in:

-ik, -ek, -ok, -k, -î/-yî, -dar, -van, -baz, -bend, -ewar, -ewer, -saz, -mend, -istan, -dan, -dan+k, -geh, -in/-yin, -an/-yan, -în, -iyan, -kî, -wî, -hî, -ayî/-ahî, -anî, -ane, -tî, -[y]ê, -[y]in, -[y]em, -[y]emîn, -tir, -tirîn, -gîn, -otankî, -olekî, -çolkî, -okî, -çe

-ik:

a) Ev paşpirtik tê paşîya navekî û mehneya piçûkkirinê dide wê:

berxik, keçik, kurik, malik, gulik, girik, jînik, mêrik, bûkik, karik...

b) An tê paşîya hevalnavekî(adjektîvekê) û cardin mahneyeka piçûkkirinê an sempatîkkirinê dide wê gotinê:

hûrik, girik, şînik, reşik, xweşik, rindik, pîsik, kevnîk, germîk, nermîk...

-ek:

a) Ev paşpirtik tê dawîya peyvekê ku nav e û peyveka nuh durust dike ku hevalnav(adjektîv) e:

vîrek, serek, dizek, çîlek, kulek, bizdonek, gezek...

b) Yan tê dawîya koka 1-ê (piştî emê behsa kokên fiîlan bikin); koka dema çûyî ya hin fiîlên transîtîf û peyveka nuh durust dike ku nav e:

birrek, qelişte, xurek...

c) Yan jî tê dawiya nawan û wan dixê halê nediyariyê:

malek, merivek, jiyaneke, bizdoneke, gezeke/pariyek, gezeke...

-ok: gerrok, feqîrok, xapînok, revok/bezok, gezok, bihnok, qelînok, sarincok, lîstok, xelasok, keribok...

-k: reşreşk, xaşxaşk, çirçirk, serşok...

-î/-yî:

a) Tê paşiya navekî, jê hevalnavekî durust dike:

avî, bejî, şênayî, havînî, zivistanî, payîzî...

b) Tê paşiya hevalnavekî jê navekî durust dike:

reşî, xweşî, germî, sarî, erzanî, dirêjî, çêyî, qencî...

Yan jî;

xulamî, tiralî, hemalî, şagirdî, hostayî, zîrekî, gêjî, xêvî...

c) Tê paşiya navê miletekî û jê navê zimanê wî miletî durust dike. Bi vî awayê xwe ev paşpirtikek e ku ji zimanê Erebî ketiye nav zimanê Kurdî. Çêkirina navê zimanan ji navê miletan bi paşpirtikeke Kurdî piştê em ê bibînin:

Tirkî, Kurdî, Erebî, Îngilîzî, Farisî, Almanî...

ç) Tê paşiya navê welat, herêm, bajar, gund, eşîr an siyaset, dîn, mezheb an terîqetekê û mensûbiyeta ji wan dide nîşandan:

Tirkiyeyî, Kurdistanî, Almaniyayî, Erebistanî, Misirî;

Anadoluyî, Serhedî, binxetî, çiyayî, deştî, gundî, bajarî;

Diyarbakirî, Wanî, Dêrsimî, Silêmaniyeyî, Mehabadî;

Liceyî, Qereqoçanî, Amûdî, Amediyeyî, Helebçeyî;

Gundikî, Başnîqî, Zoravayî, Pereperayî;

Ertûşî, Goyî, Zêbarî, Etmanî, Kîkî, Berazî, Xormekî, Qurêşanî;
PDK-yî, PKK-yî, PSK-yî, YNK-yî;
Îslamî, Êzîdî, Zerdeştî, Hanefî, Alewî, Şîî, Ortodoksî, Katolikî, Neqşîbendî, Qadîrî,
Îsmailî...

Tê paşîya hin navan ji wan hin navên din durust dike:

çavî, destî...

-dar: Paşpirtîkek e ku mahneyeke xwedîtîyê dide:

birîndar, evîndar, guhdar, sermiyandar, dengdar, ilimdardar, serdar...

-van: dergevan, şivan, gavan, berxvan, nêçîrvan, bêrîvan...

-baz: rimbaz, canbaz, fêlbaz, sihêrbaz, kufurbaz, hîlebaz...

-bend: sazband, nalband, solband, bazûband...

-war: xwendewar, bextewar...

-ewer: bîrewer, kurdewer...

-saz: didansaz, çeksaz, dermansaz...

-mend: karmend, hunermend, siyasetmend, aqilmend, dewlemend...

-istan: Kurdistan, Turkistan, Afganistan, daristan, gulistan, goristan, şaristan, berristan...

-dan: kevçîdan, guldand, derdand...

-dan+k: Ev ji du paşpirtikan pêk hatiye. Paşpirtika -dan'ê û -ik'ê a piçûkkirinê. xwelîdank, xwêdank, derzîdank, guldank...

-geh: wargeh, şargeh, nişangeh, kargeh, havîngeh...

-[y]in: Ev paşpirtikê tê paşîya koka yekê ya hin fiilan û wan dixê halê mesderiyê (înfînîtîvîyê):

hatin, gotin, şûştin, çûyin, bûyin, zayin...

-[y]an:

a) Tê paşîya koka yekê ya hin fiilan û wan dixê halê mesderiyê:

razan, kolan, jîyan...

b) Tê paşîya reqemên pirhejmar û wan dike hejmarnavên rêzê:

duduyan, çaran, dehan, sedan, heştêyan...

c) Tê dawiya navên yekhejmar û pirhejmariyê dide wan:

karan, berxan, pirtûkan, rıyan...

-în:

a) Tê dawiya koka yekê ya hin fîlan û halê mesderiyê dide wan:

çirrîn, dirrîn, birrîn zivirrîn, seridîn...

b) Tê dawiya hin navên cins û wan dike hevalnavên(adjektîvên) aîdîyetê:

kevirîn, hesinîn, darîn, goştîn, zêrîn, kaxetîn...

-andin: nivîsandin, razandin, çirrandin, xemilandin, gurandin...

-kî:

a) Tê paşiya navên millet yan eşîran, pê navê zimanê wan durust dike:

Kurdkî, Tirkkî, Erebkî, Zazakî, Dimilkî...

b) Tê dawiya hin nav an hevalnavan û hevalkarekî(zerfekê-adverbekê) durust dike ku mahneya uslûba wan didê:

kevirkî, devkî, nivîskî, dînkî, serserkî, xulamkî, axakî, kurmanckî, bajarkî, berrîvan-kî...

-wî: bawî, rêwî, kîmyewî...

-hî: şahî, valahî...

-ayî/-ahî: ronayî/ronahî, reşayî/reşahî, sorayî/sorahî, berayî/berahî...

-anî: mêranî, jinanî, piranî...

-ane: jinane, mêrane...

-tî: dokortî, hostatî, mêtî, jintî, zaroktî, hevaltî, biratî, cînantî/cîrantî...

-[y]ê: dawiyê, paşiyê, pêşiyê, dudiyê, çarê

-[y]in: merivin, karin, cîyin, bayin

-[y]em: yekem, duyem, dehem, sedem

-[y]emîn: pêncemîn, heftemîn, dehemîn

-tir: qenctir, mezintir, zûtir, rindtir, berztir...

-tirîn: qenctirîn, mezintirîn, zûtirîn, rindtirîn, berztirîn...

-gîn: xwazgîn, lezgîn...

-otankî: reşotankî...

-olekî: reşolekî, şînolekî, keskolekî...

-çolkî: sipîçolkî...

-okî: qirêjokî, peritokî, zeliqokî, şemetokî, zerikokî, reşikokî, kevnikokî, pembekokî...

AVAKIRINA PEYVÊN EWRÛPÎ BI PIRTIKAN (AFÎKSAN)

Gava me gotinên zimanên Ewrûpî deyn kirine, helbet me sufîks û prefîksên wan jî girtine nava zimanê xwe. Pirranî ev afîks bi gotinên biyanî re tîne û gotinên nû yên ku durust dikin jî biyanî ne. Lê gellek kême be jî ev carna ji gotinên zimanê me bi xwe jî gotinên nû durust dikin. Durustkirina gotinan bi afîksên Ewrûpî:

a) Bi pêşpirtikan(prefîksan):

anti-: antiemperyalîst, antifaşîst, antibîyotîk, antîfrîz, antîtank...

oto-: otomatîk, otomobîl, otobus, otobîyografi...

ko-: kooperatîf, koordine, koordînasyon...

kontr-: kontrgerilla, kontrakt, kontratak, kontrpart, kontrîstîxbarat...

de-: demode, desentralîze, deşîfre, demoralîze, demîlîtarîze...

dez-: (ji dis- 'a Îngilîzî) dezavantaj, dezînfarmasyon...

hiper-: hîperaktîf, hîpertansiyon...

înter-/enter-: înternet, enternasyonal/înternasyonal...

makro-: makropolîtîk, makroekonomî...

mîkro-: mîkropolîtîk, mîkroekonomî, mîkroskop, mîkrofilm...

mega-: megaproje, megabayt, megaton...

mîni-: mînîbus...

mono-: monopol, monolîtîk...

multî-: multîmedya, multîmîlyoner, multîpartîtî, multînasyonal...

neo-: neonazî, neofaşîst, neokolonyalîzm...

para-: paramîlîter, paraşut, parametr...

pre-: prefabîk, prefîks...

pro-: proamerîkan, prokomunîst...

re-: reform, reaksiyon, reaktor, reorganîze...

selv-: selvservîs, selvdetermînasyon...

semî-: semîfînal...

super-: supermen, supermarket...
tele-: telefon, telekomunikasyon, televîzyon...
trans-: transfer, transatlantîk, transkafkas...
ultra-: ultravîole, ultranasyonalîst...

b) Bi paşpirtikan(sufîksan):

-aj: (ji -age Fransîzî) bagaj, garaj, tonaj...
-el/-al: aktuel, nasyonal, fînal, rasyonel, krîmînel...
-ans: (ji -ance) balans, stîmulans, tolerans..
-ant: tolerant, reprezentant...
-siyon: (ji -tion' a Fransîzî) fraksiyon, kolonîzasyon, kreasiyon, sîvîlizasiyon...
-îk: olkolîk, krîtik, ekonomîk, gramatik, fonetik...
-lojî: sosyolojî, bîyolojî, kurdolojî, fîzyolojî...
-log: sosyolog, antropolog, kurdolog...
-îzm: nasyonalîzm, romantîzm, realîzm, sofîzm...
-îst: nasyonalîst, faşîst, sosyalîst, kapîtalîst...
-îte: aktualîte, mentalîte, formalîte...
-îze: terorîze, mîlîtarîze, sosyalîze...

ÇÊKIRINA HEVALNAVAN

Çêkirina hevalnavan bi alîkariya koka dema çûyî (pişt re emê werin ser vê meselê) û paşpirtika -î/-yî'yê.

vekirî, girtî, sohtî, gotî, şewitî, xwarî, çêkirî, çêbûyî, şikestî, xwendî, mirî, kuştî...

Çêkirina hevalnavan bi alîkariya edata nebûnê(ne), koka dema çûyî(pişt re emê werin ser vê meselê) û paşpirtika -î/-yî'yê.

venekirî, negirtî, nesohtî, nepahtî, negotî, neşewitî, nexwarî, xelasnekirî, xelasnebûyî, çênekirî, çênebûyî, neşikestî, nexwendî, nemirî, nekuştî...

PEYVÊN HEVEDUDANÎ

Peyvên hevedudanî ew peyv in ku ji du an zêdetir gotinan pêk tên û peyveka nuh durust dikin.

1- Peyvên hevedudanî yên ku ji navan pêk tên.

a) Yên ku navan çêdikin:

darsimaq, darhinar, jinbira, pismam, kurap, kurmam, dotmam, keçap, kundir-mast, şorbeşîr, avdew, gulşîlan...

b) Yên ku hevalnavan(adjektîfan, sifetan) çêdikin:

gerdenbilûr, bejnrihan, devşikeft, devgirêz, devşorbe, pozberan, serker, ziktorbe, diranbefş, çavxezal, cîgerxwîn...

2- Peyvên hevedudanî yên ku ji nav û hevalnavan durust dibin.

a) Peyvên ku ji nav+hevalnavan pêk tên:

mêrxas, pozbilind, enîbeş, dilreş, serhişk, kezîzer, xwîngerm, bextreş, zimandirêj, sergir, bejnbilind, qamqutik, kêfxweş...

b) Peyvên ku ji hevalnav+navan pêk tên:

sorgul, bedbext, germav, bilindwar, kêmxşeref, kêmxwê, têrxwê, têrav, kêmaqil, xweşmêr, dudil, heftreng, çarpê...

c) Hevalnavên ku ji hevalnav û hevalnavan pêk tên:

reşbelek, sorbelek, giregir...

3- Peyvên hevedudanî yên ku ji nav an hevalnav û kokên fiîlan pêk tên.

Ji bo ku ev mesele bê fêmkirin divê pêşiyê em li ser koka fiîlan rawestin. He-ta niha zimannasên Kurd bi vî awayî li ser vê meselê ranewestiyane.

Di Kurdî du kokên fiîlan hene ku dihêlin meriv bi alîkariya wan fiîlan li gor zemanan bitewîne(deklîne bike). Kokek jê navê wê koka dema niha ye ku di demên niha, yên mayî û yên fermanî de tên bikaranîn. Ya dinê navê wê koka dema çûyî ye û di tewandina fiîlan de jibo demên çûyî tê bikaranîn.

Koka dema çûyî

Ez di-bû-m

Min di-kir

Min di-şûşt

Min di-xwar

Koka dema mayî

di-b-im

di-k-im

di-şo-m

di-xw-im

Halê mesderî

bûn / bûyin

kirin

şûştin

xwarin

Ez di-revî-yam
Min di-revand

di-rev-im
di-revîn-im

revîn / reviyân
revandin

Çend mîsalên din:

Halê mesderî

Koka dema çûyî

Koka dema mayî

jiyan

jî

jî

xistin

xist

x

kuştin

kuşt

kuj

firotin

firo

firoş

gotin

got

bêj

Piştî vê şîrovekirinê em dikarin vegerin ser pîrsa xwe ya esasîn; mesela çêkirina peyvan.

a) Bi riya nav, hevalnav(adjektîv) yan jî zamîra "hev" an "xwe" û koka dema mayî ya fiîla transîtîf meriv dikare hevalnavên(adjektîvên-sîfetên) nuh durust bike:

kerxesîn, xwexesîn...

dilrevîn, xemrevîn, xewrevîn, kulrevîn, kesrevîn, tirsrevîn...

xwefirrîn, tirs[tê]firrîn...

xêrxwaz, dilxwaz, jinxwaz, azadîxwaz, mafxwaz...

karker, zêrker, zivker...

mêrkuj, jinkuj, birakuj, xwekuj, agirakuj...

rêbîr, darbîr, agirbîr, porrbîr...

dengbêj, çîrokbêj, nûçebêj...

kedxur, mîratxur, bertîlxur, hevaxur...

dûravêj, kurtavêj, bombavêj...

dûrbîn, tengbîn, hûrbîn, kurtbîn, bedbîn, xweşbîn...

piştgir, qedirgir, alîgir, avgir...

nanpêj, aşpêj...

kebabbîrêj, goştbirêj...

cigarekêş, şûrkêş, zehmetkêş...

xewhên, karhên, zerarhên...

karder, zerarder, bîhnder, êşder...

eljimêr, rojjimêr, demjimêr...

bapîv, tînpîv...

tînşkên, dijminşikên, camşikên...

b) Peyvên ku bi alîkariya nav/hevalnav û koka dema çûyî ya hin fiîlên transî-tîf(ev gellek îstîsna ne)çêdibin:

rohat, nûhat, zûhat...

c) Peyvên ku bi alîkariya nav/hevalnav û koka dema çûyî ya hin fiîlên întan-sîf(ev gellek îstîsna ne)çêdibin:

rastgo, xweşgo, karkir, xwînxwar, reşkir...

ç) Peyvên ku bi alîkariya nav, koka dema çûyî ya hin fiîlan û paşpirtika -î yê çêdibin:

perşikestî, milşikestî, guhjêkirî, devvekirî, kincdirayî, serjêbûyî, tînşikestî...

Esas ev, prensîbê çêkirina peyveke hevedudanî ye ku ji nav û hevalnavekî du-rust dibe:

per(nav)+şikestî(hevalnav)=perşikestî

d) Peyvên ku ji nav, edatên bi, li û ji û cardin nav yan jî cînavê(zamîr) "hev" çêdibin.

devbixwîn, rûbimast, kincbiqul, devbiken....
devliken, çavlikar, çavligoşt, bejnlihev, tevlihev...
devjihev, destjihev, çavjihev...

e) Peyvên ku bi tekrarkirina navan û paşpirtika -î yê çêdibin.

gulgulî, qulqulî, xelekxelekî, gincirgincirî, kerkerî, xalxalî, deqdeqî...

ê) Peyvên ku bi tekrarkirina hevalnavan çêdibin û tekrara duduyan dengê xwe yê serî bi dengê "m" yê diguhere.

soromoro, reşomeşo, şînomîno, kevnomevno, pîsomîso...

4- Peyvên ku ji halê mesder ê fiîlên hevedudanî pêk tîn:

Di Kurdî de halê mesder ên fiîlan her wiha dibin nav. Gava fiîlên hevedudanî

wekî nav bên bikaranîn dibin gotinek:
serşûştin, serjêkirin, belavkirin, berbakin...

BALKÊŞÎ

Her wekî tê zanîn peyvên hevedudanî dikarin bi alîkariya ji yekê zêdetir paşpirtik û pêşpirtikan, an ji kombînezona herduyan bên çêkirin.

venegirtin, xêrnexwazî, pismamtî, hilperikandin, rastnego, xebatnekir...

Çêkirina fiilan ji navan

Nav	fiila întansîtîf	fiila transîtîf
bez	beziyan	bezandin
çêj	çêjiyan	çêjandin
weş	weşiyar	weşandin

Nav	fiila întansîtîf	fiila transîtîf
deq	deqiyan	deqandin
ger	geriyan	gerandin
xur	xuriyan	xurandin

Yên yekhêce ku bi bêdengekî(konsonantekê) xelas dibin.

Nav	fiila întansîtîf	fiila transîtîf
bexş	bexişîn	bexişandin
birq	biriqîn	biriqandin
derz	derizîn	derizandin

Yên pirhêce

Nav	fiila întansîtîf	fiila transîtîf
azar	azirîn	azirandin
felat	felitîn	felitandin
heram	herimîn	herimandin

yan jî

Nav	fiila întansîtîf	fiila transîtîf
buhur	buhurîn	buhurandin
çirûsk	çirûsîn	çirûsandin
niqut	niqutîn	niqutandin

Çêkirina fîlan ji olana buyeran:

Nav	fîla întansîtîf	fîla transîtîf
gurm	gurmiyan	gurmandin
xuş	xuşîyan	xuşandin
zir	zirîyan	zirandin

Çêkirina fîlên hevokîn

Fîlên hevokîn bi alîkariya edatan û cînavê şexsê sisiyan yê yekejimar an cînavê "hev"ê çêdibin. Her wekî tê zanîn di axaftinê de edat û cînavên sisiyan yê yekejimarên tewandî bihev keliyane û gotinek pêk anîna:

Ji dêlva	forma pevkelandî	Fîla hevokîn
li wî/wê	lê	lêdan, lêbûn, lêkirin, lêxistin..
li hev	lihev	lihev dan, lihev kirin, lihev bûn..
bi wî/wê	pê	pêdan, pêbûn, pêkirin, pêxistin..
bi hev	pev	pevçûn, pevkirin, pevxistin..
ji wî/wê	jê	jêbûn, jêkirin, jêxistin, jêketin..
ji hev	jihev	jihevbûn, jihevkin, jihevixin..
di wî/wê	tê	têdan, têdakin, têwerdan..
di hev	tev	tevdan, tevbûn, tevêkin...
bi wî/wê da	pêda	pêdakin...

Çêkirina fîlan bi alîkariya nav, hevalnav an fîlan

a) nav û fîl

deng dan, deng vedan, ser jêkirin, serî hildan, pirs kirin, bersîv dan, bejn vedan...

b) hevalnav û fîl

sor bûn, dirêj kirin, bêhêvî bûn, bêserûşop bûn, bêpar hiştin, yek kirin...

BALKÊŞÎ:

Gotinek heye ku ji bil TV-ya MEDê û kesên der û dora wê gellek caran bikar tê, lê bi tevayî şaş e: "jîn bûn". Tê gotin "jîn dibe" yan "jîn bûye". Ev gotin bi çi awayî ketiye nava ferhenga wan ez nizanim. Lê gava meriv bala

xwe bide marşa Ey Reqîb a Kurmancî, tê dîtî ku di wir de jî ew gotin bi wî awayî bikar tê:

Kî dibê Kurd miriye, Kurd jîn dibe.

Em dizanin ku orîjînalê vê marşê bi Soranî ye û eslê rêza jorîn bi vî awayî ye:

Kî delê Kurd mirdûwa, Kurd zîndûwa.

Kurmanciya vê dikare wiha be:

Kî dibê Kurd mirîye, Kurd zindî ye.

Lê xwiya ye, yê ku ev marş kiriye Kurmancî, Soraniya wê baş fahm nekiriye û gotiye "Kurd jîn dibe". Piştî ev ketiye ser zimanê xebatkarên TV-ya MEDê. Li şûna wê gotina şaşbikarhatî divê meriv bibêje: "dijî". Çimkî "jîn" li vê derê her çiqas nav be jî, navek e ku ji halê mesder yê fiîlekê pêk hatiye: "jiyîn". Ew navên ku ji halên mesder ên fiîlan pêk tên bi wî awayê ku me li jorê nivîsî peyvan durust nakin. Esas "jîn" ji gotina "jî"(umr) durust bûye. Esas pirtirîn "bûn" pirtir tê dawîya hevalnavan(sifetan) ne ku navan:

sor bûn, mezin bûn, piçûk bûn...

Lê ev gotin bi rehetî dikare were pêşîya navan:

bû jîn, bû mirin, bû kevir, bû dar, bû bûk...

c) mî û mîl

a) dan kirin, dan şandin, dan serjêkirin, dan revandin....

b) hatin kirin, hatin şandin, hatin revandin, hatin hilavêtin
hatin pahtin, hatin birrîn...

* Ev xebat cara pêşî di "Semînera li Ser Zimanê Kurdî" de hatiye pêşkêşkirin ku di navbera rojên 23-25ê Sibata 1996'an de li Almanyayê, li bajarê Osnabruckê ji alî Komeleya Mamosteyên Kurdistanê li Zaxsena Jêrîn hatibû amadekirin. Piştî bi lênihêrtîneka din hatiye sererastkirin û firehkirin û li vêderê tê weşandin.

Kongreya Duyem a Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê çêbû

Kongreya duyem a Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê (KNKS) di roja 24'ê Sibata 1996'an de li Stockholmê li Medborgarhusetê bi beşdariya piraniya endaman civiya. Kongre ji aliyê serokê komeleyê Malmîsanij hat vekirin û di pey rêzgirtina ji bo şehîdên Kurdistanê dîwanek ji bo îdarekirina kongreyê hate hilibjartin.

Malmîsanij û berpirsiyarê malî yê komeleyê Ahmet Cantekin di raporên xwe yên li ser rewşa xebata giştî û rewşa aborî ya komeleyê de agahdarî dan, behsa kil û kêmasiyan kirin û li ser pêwistiyên xebata pêşerojê hin pêşniyar pêşkêş kirin.

Hin xebatên bingehîn ên ku di sala çûyî de hatibûn kirin ev bûn:

— Di salekê de derxistina çar hejmarên kovara Çirayê.

— Bi munasebeta 300 saliya nivîsandina destana Mem û Zînê, bi beşdariya Dr. Martin van Bruinessen, Prof. Joyce Blau û nivîskar Mûrad Ciwanî di 27'ê Gulana 1995'an de li Stockholmê bi Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê (FKKS) amadekirina konferanseke navneteweyî.

— Bi beşdariya Prof. Îzeddîn Mistefa Resûlî di 8'ê Çiriya Pêşîn a 1995'an de li Stockholmê amadekirina semînera "Ehmedê Xanî û Ronesansa Kurdî".

— Li ser navê Çirayê beşdarbûna panela "Rewşa Kurmanciya Nivîskî ya Îro" ku di 7'ê Çiriya Pêşîn a 1995'an de li Stockholmê ji aliyê Komeleya Kurd li Spångayê hatibû amadekirin.

— Pêkanîna du civînên giştî ji bo endamên komeleyê.

Di pey xwendina raporên, gotûbêj li ser wan çêbûn. Xebatên ku di nav salekê de hatibûn kirin ji aliyê gelek axaftvanan hatin pesindayin û li ser hin kêmasiyan jî dîtin û rexne hatin zimên. Ji derveyî hin daxwaz û pêşniyaran, li ser van pirsan munaqêşe çêbûn:

— Hin endaman pirsê endambûna KNKS'ê ya FKKS'ê ji ber sebebê awayê birêxistinbûna FKKS'ê, yanê bi gotineke din li ser bingeha komunan avabûna FKKS'ê anîn holê. Di pey munaqêşeyan berdewamiya endametiya KNKS'ê ya FKKS'ê weke berê hate qebûlkirin.

— Li ser çerçeweya warê kar û barê komelê jî munaqeşe çêbûn. Çend endam di wê baweriyê de bûn ku diviyabû Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê bibe komeleyeke seranserê Kurdistanê. Ji ber destnedana îmkân û astengên ku di rewşa îroyîn de li ber temsîlkariyeke weha fireh hene, ev pêşniyar nehat qebûl kirin.

— Li ser awayê bihêzkirina Çirayê jî gotûbêj hate kirin.

— Li ser hin pirs û pirsgerêkên meslekî yê nivîskariyê û herweha li ser îmkânên KNKS'ê jî gotûbêj hatin kirin.

Piştî tesdîqkirina raporê ji bo Komîteya Karger hilbijartin çêbû. Ji bo Komîteya Karger, Malmîsanîj, Rohat Alakom, Zinar Soran, Firat Cewerî û Osman Aytar weke esîl; Elîşêr û Salim Çelîker jî weke cîgir hatin hilbijartin. Ji bo delegetiya FKKS'ê jî du endam hatin hilbijartin.

Kongre, di pey hin daxwaz û pêşniyarên ji bo xebatên pêşerojê, bi marşa Ey Reqîb hate qedandin.

Komîteya Karger di civîna xwe ya yekem de wezîfeyên heyî di nav xwe de parvekirin. Ji bo serokatîyê Malmîsanîj, ji bo sekreteriyê Rohat Alakom, ji bo berpirsiyariya aboriyê Zinar Soran hatin hilbijartin. Osman Aytar û Firat Cewerî jî berpirsiyariya karûbarên kovara Çirayê wergirtin.

CÎHANA PIRTÛKAN

Amadekar: ROHAT ALAKOM

Ordîxanê Celîl & Celîlê Celîl

Zargotîna Kurda I

Weşanxana Jîna Nû, 498 rûpel, Stockholm, 1995

Di nav vê berevoka folklorîk de çend destan û serpêhatîyên Kurdî û çend şaxên wan cîh girtine; bi qasî çil perçe berhemên folklorîk têda hene. Herdu birayan di sala 1978'an de weke tê zanîn bi navê *Zargotîna Kurda* xebateke ji du cildan pêk hatî, li Moskovayê weşandibûn. Di vê xebata nû de, him perçeyên kevn, him jî perçeyên ku nû hatine berev kirin, cîh girtina. Di dawîya pirtûkê de beşeke bi navê *Nivîsarnasî* heye. Li vir ev perçeyan çî wextî, ji devê kê û li kîderê hatine girtin û berev kirin, yek bi yek hatine nivîsîn.

Sîdîqî Hîrorî

Kurê Zinarê Serbilind

Weşanxana Nûdem, 156 rûpel, Stockholm, 1996

Nivîskarê vê romanê Sîdîqî Hîrorî bi xwe ji Kurdên Iraqê ye. Li Polonyayê rojnamevanî xwendîye. Niha li Swêdê dijî, çend berhemên wî yên helbest û kurteçîrokan berê hatine weşandin. Di vê romana xwe de nivîskar demeke nû hîlbijartîye, cîhê ku bûyerên romanê lê derbes dibin, dorberê sînorên Kurdistanê Iraq û Tirkîyê ne. Zordestîyên li ser gelê Kurd û li dijî van zordestîyan tekoşîna gel di romanê de cîhekî fireh digre. Mêrxasê romanê Şêro û du hevalên wî yên xort hewl didin ku tevî vê tekoşînê bibin, lê belê her tişt angorî dilê wan nameşe.

Xelîl Duhokî

Antolojîya Çîroka Nû ya Kurmancên Başûr

Weşanxana Nûdem, 104 rûpel, Stockholm, 1995

Xelîl Duhokî ji Kurdistanê Başûr e û niha li Stockholmê dimîne. Ji der karê xwe yê helbestvanîyê, ev çend sal in ku wusan jî derheqa babeta edebîyata Kurdistanê Başûr ya ku bi zaravê Kurmancî hatîye nivîsîn, kar dike. Ev anto-

lojîya wî ya nû beşek ji vê xebata wî ye. Di vê antolojîyê de bi qasî 25 nivîskar bi kurtî tînen nasandin û berhemekê wan wek nimûne di antolojîyê de hatîye nivîsandin. Wusan jî wêneyê her nivîskarekî di pirtûkê de cîh girtîye.

Reşîdê Kurd,

Ez

Weşanxana Avesta, 59 rûpel, Îstebol, 1996

Reşîdê Kurd yek ji ronakbîr û nivîskarên Kurdên Surîyê ye ku di navbera salên 1910-1968'an de jîyaye. Ev pirtûk cara pêşî di sala 1991'ê de li Stockholmê hatibû weşandin. Çapa duwemîn a vê pirtûkê li Tirkîyê nû derdikeve. Di pirtûkê de, li derdora deh helbestên nivîskar cîh girtine. Di dawîya pirtûkê de ferhengokeke ji peyvên zêde nenas pêkhatî jî heye. Weşanxana Avesta ku nû li Îstebolê hatîye saz kirin, di vê rêza helbestan de wusan jî helbestên Şêrko Bêkes (Ji Nav Şîrên Min) û Cegerxwîn (Şîrên Windabûyî) du pirtûkên din jî weşandine.

Rose Lagercrantz

Rêwîtiya Dûr û Dirêj

Weşanxana Apec, 48 rûpel, Stockholm, 1996

Ev pirtûka zarokan ji alîyê Alî Çiftçî û Xebat Arif de ji Swêdî hatîye wergerandin. Pirtûk bi herdû zaravayên Kurdî Kurmancî û Soranî hatîye weşandin. Alî Çiftçî pirtûk wergerandîye Kurmancî, Xebat Arif jî wergerandîye Soranî. Ev pirtûka bi du zaravî, bi wêneyên rengîn ve hatîye xemilandin. Naveroke pirtûkê ji serpêhatîya keçikekê û kuçikê wê pêk tê.

Osman Aytar

Kurdistan Bi Fiftî - Fiftî

Weşanxana Nûjen, 318 rûpel, Îstebol, 1995

Osman Aytar, yek ji nivîskarên Kurdên Tirkîyê ye û niha li Swêdê dijî. Nivîskar di sala 1994'an de diçe Kurdistanê Başur, li wir gelek şexsîyetên Kurd dibîne û bi wan re hevpeyvînan çêdike. Ev pirtûka wî, ji van hevpeyvînan pêkhatîye. Di dawîya pirtûkê de gelek wêneyên van şexsîyetan cih girtine. Navê pirtûkê yê nîv Îngîlîzî, nîv Kurdî, wek nîşana tempoya kar û xebatên vî beşê Kurdistanê, hatîye bi kar anîn.

Yaşar Kemal

Zulmun Artsın (Zilma Te Zêde Be)

Weşanxana Can, 266 rûpel, Îstenbol, 1995

Ev pirtûka Yaşar Kemal ji nivîs, gotar û hevpeyvînan pêk hatîye. Hemû berhem berê di kovar û rojnameyan de hatine weşandin. Alpay Kabacalı pirtûk ji bo çapê amade kirîye. Di nav rûpelên pirtûkê de, çend nivîs û hevpeyvînen Yaşar Kemal di derheqa problema Kurdan jî, di nav rûpelên vê pirtûkê de cîh girtine. Weşanxana Can di sala 1995'an de, dîsa di vê rêzê de sê pirtûkên Yaşar Kemal yên ku nivîs û gotaran pêkhatî, weşandine: *Ağacın Çürüğü, Baldaki Tuz, Ustadır Arı*.

Osman Şahin

Fırat'ın Sırtındaki Kan - Bucaklar (Xûna Li Piştî Fıratê-Bucak)

Weşanxana Kaynak, 275 rûpel, Îstenbol, 1996

Osman Şahîn yek ji nivîskarên kurteçîrokan yên Tirkîyê yê navdar e. Gelek berhemên wî xelat wergirtine û bûne babeta fîliman. Tema Kurdan di berhemên wî de temake bingeîn e. Di vê romana nû de serpêhatîya eşîra Bucakan ku li Sîverekê dijîn, cîh girtîye. Roman, berhemeke nîvdokumenter e. Ji salên 1960'î vir da, kuştin, tolhildan, dek û dolavên hatine serê vê eşîrê, bi zîmanekî edebî tîrîn pêşkêş kirin.

Baskın Oran

Kalkık Horoz

Çekiş Güç ve Kürt Devleti (Dîkikê Hildayî-Hêza Çekûç û Dewleta Kurd)

Weşanxana Bilgi, 277 rûpel, Enqere, 1996

Baskın Oran, lêkolînavan û doçentekî Tirk e û niha di Fakolta Zaniyarîyên Sîyasal a li Enqerê dixebite. Ew bi xwe pisporê pêwendîyên navnetewî ye. Baskın Oran, ev çend sal in ku li ser nasîyonalîzma Kurd kar dike. Di vê pirtûka xwe ya dawîn de li ser Hêza Çekûç disekine. Çawa tê zanîn piştî Şerê Kuweytê, li dijî êrîşên Saddam û ji bo parastina Kurdan hêzeke taybetî ji balafiran pêkhatî li wê deverê ji aliyê Emerîkayê de hate cîwar kirin û navê wê danîn Hêza Çekûç. Cîwarkirina vê hêza leşkerî li Tirkîyê ev çend sal in ku bûye babeta raberzînen mezin. Lêkolînavan di vê xebata xwe de hebûna vê hêzê analîz dike.

Musa Anter

Ülke ve Gündem Yazıları (Nivîsên Ülke û Gündemê)

Weşanxana Avesta, 246 rûpel, Îstenbol, 1996

Ew nivîsên ku Musa Anter berî mirina xwe di rojnameyên Ülke û Gündem de weşandibûn, di vê pirtûkê de hatine berev kirin. Ji bo vê pirtûkê Ragip Duranî bi navê *Güldü Kalem Güldü Silah* (Qelem Kenîya Çek Kenîya) pêşgotinek nivîsiye. Hemû nivîs di navbera salên 1991-1992'an de hatine weşandin.


Gürdal Aksoy

Tarihi Yazılmayan Halk: Kürtler (Gelê ku Dîroka Wi Nehatîye Nivîsin:Kurd)

Weşanxana Avesta, 111 rûpel, Îstenbol, 1996

Lêkolînvan Gürdal Aksoy niha li Enqerê dijî, li ser dîroka Kurd ya antîk çend xebatên wî hene. Di vê pirtûka xwe de bi kurtî li ser nivîsîna dîroka Kurd û problemên pêşberî wê disekine. Di vê babetê de çend rexneyên xwe derheqa berhemên Cimşîd Bender, Selhattin Mihotûlî, Torî, Faik Bulut pêşkêş dike. Derketina pirtûkê li Tirkîyê li ser dîroka Kurd bûye sedemê raberzî-nên (muneqaşe) nû.

Ji Weşanên APEC çar pirtûkên nû



Edîb Polat
Berbangên Newrozê

R. Lagercrantz
Rêwîtiya Dûr û Dirêj

Dr. A. Qasimlo
Kurdistan û Kurd (bi Farisî)

Hecîyê Cindî
Hîkayetên Civata Kurdan

Navnîşana xwestinê: Box: 8133, S-163 03 Spånga / Sweden

Tel: 08-761 81 18 Fax: 08-761 24 90

SAL 1
HEJMAR 1
ADAR 1995

ÇİRA

KOVARA
KULTURİ

Kovara Kuvayirya gıllukarın kurd 1. hejmar



1

ÇİRA

Kovara Kuvayirya gıllukarın kurd 1. hejmar

sol 1
hejmar 2
heziran 1995



ÇİRA

Kovara Kuvayirya gıllukarın kurd 1. hejmar

sol 1
hejmar 3
tan 1995



3

ÇİRA



4